

K.T.
ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ



HOKER DI ALÎYÊ WATEYÊ VE
LÊKOLÎNEK YA BERAWIRDÎ YE DI NAVBERA ZARAVAYÊ
KURMANCÎYA NAVÎN Ê JORÎN



TEZA LÎSANS A BİLİND

AMADEKAR

Abdullah Asaad ISMAEL

VAN- 2021

**K.T.
ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**



**HOKER DI ALÎYÊ WATEYÊ VE
LÊKOLÎNEK YA BERAWIRDÎ YE DI NAVBERA ZARAVAYÊ
KURMANCÎYA NAVÎN Ê JORÎN**



TEZA LÎSANS A BİLİND

AMADEKAR

Abdullah Asaad ISMAEL

ŞÊWIRMEND

Doç. Dr. NESİM SÖNMEZ

ŞÊWIRMENDÊ DUYEM

Doç. Dr. NERÎMAN EBDULLA XOŞNAW

VAN- 2021

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLER ENİSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



**ANLAM BAKIMINDAN ZARF
KÜRÇENİN ORTA VE YUKARI LEHÇELERİ ARASINDA
KARŞILAŞTIRMALI ARAŞTIRMA**



YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN

Abdullah Asaad ISMAEL

DANIŞMAN

Doç. Dr. NESİM SÖNMEZ

İKİNCİ DANIŞMAN

Doç. Dr. NERİMAN EBDULLA XOŞNAW

VAN- 2021

BİLDİRİM

Hazırladığım tezin/raporun tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin/raporumun kâğıt ve elektronik kopyalarının Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü ABD arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım:

- Tezimin/Raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Raporum sadece Yüzüncü Yıl Üniversitesi yerleşkesinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Raporumun yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

[Jüri Tarihi]

[İmza]

Abdullah Asaad ISMAEL

KABUL VE ONAY SAYFASI

<p>Abdullah Asaad Ismael ALCHAWSHLI tarafından hazırlanan "Berawirdkirina Hokeran Di Aliyê Wateyê Da-Minak Kurmanciya Navin û Kurmanciya Jorin" adlı tez çalışması aşağıdaki jüri tarafından OY BİRLİĞİ / OY ÇOKLUĞU ile Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak kabul edilmiştir.</p>	
<p>Danışman: Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum</p>	
<p>Üye: Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR Van YYÜ İlahiyat Fakültesi Din Eğitimi ABD Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum.</p>	
<p>Üye: Dr. Öğrt. Üy. Mehmet Emin PURÇAK Muş Alparslan Üniversitesi Fen-Edeb. Fak. Kürt Dili ve Edeb. Böl. Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum.</p>	
<p>Tez Savunma Tarihi:</p>	<p>09 /02/ 2021</p>
<p>Jüri tarafından kabul edilen bu tezin Yüksek Lisans Tezi olması için gerekli şartları yerine getirdiğini ve imzaların sahiplerine ait olduğunu onaylıyorum / / 2021 Doç. Dr. Abdulhadi Timurtaş Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürü</p>	

ETİK BEYAN SAYFASI

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü **Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;**

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmada yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,
 - Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
 - Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu

bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarımı kabullendiğimi beyan ederim. (...02.2021)

.....
Abdullah Asaad ISMAEL

DIYARÎ

Bo:

- Dayik û bav, bira, kes û kar û hevalên min.

- Her kesekê xem ji zimanê Kurdî xwarî.

- Hemî hevalên harîkarîya min kirî.

- Mamosta Dr. Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw

- Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ



Teza Lîsansa Bilind
Abdullah Asaad ISMAEL
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ
Rêbendan - 2021

**HOKER DI ALÎYÊ WATEYÊ VE
LÊKOLÎNEK YA BERAWIRDÎ YE DI NAVBERA ZARAVAYÊ
KURMANCÎYA NAVÎN Û JORÎN**

KURTE

Hoker yek ji beşên herî giring ên rêzimanê Kurdî ye. Vêca me jî di vê xebatê de alîyên “*Berawirdkirina Hokerê Di Herdu Zaraveyên Kurmanciya Navîn Û Kurmanciya Jor Di Zimanê Kurdî Da*” hilda dest ku ev jî di nav wan de giringtir e. Ji ber hindê me vekolîna xwe li ser hokerê ji alîyê wateyê ve di navbera Kurmanciya navîn û Kurmanciya jor da çêkir. Ev bi awayekî mînak û tekst ji zimanê nivîsîna herdu zaraveyan me yên wergirtî ye. Giringiya vekolîna me ji derxistina alîyên wekhev û cudahîyên hokerê di herdu zaraveyan da ye ku li gorî rêbazên hokerê xwe dibîne. Ewe jî giringiya xwe di hindê de dibîne ku berawirdkirina mijarekê ye di navbera du zaraveyan gelek giring û hewce ye. Di heman demî da astê dûrî û nizîkatiyê ji me re derdixe holê ka ev du zaraveye çiqasî ji hev nizîkin an jî dûr in.

Vekolîna me ji destpêkek û sê beşan pêk hatîye: Di beşa yekem, ku bi navnîşana (*hoker di Kurmanciya navîn da*) ye, beşa duyem, ku bi navnîşana (*hoker di Kurmanciya jor da*) ye, beşa sêyem, ku bi navnîşana (*alîyên wekhev û cudahîyên hokerê di herdu zaraveyan da*) ye. Di dawiyê da jî encam û listeyên çavkaniyan me nîşandaye.

Peyvên Sereke : Hoker, Berawirdkirin, Rêziman, Diyalekt, Kurmancî.

Hejmara Rûpelan : XVI+110

Şewirmendê Tezê : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

Şewermendê Duyem : Doç. Dr. Nerîman Ebdullah Xoşnaw

Yüksek Lisans Tezi

Abdullah Asaad ISMAEL

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI

Ocak - 2021

ANLAM BAKIMINDAN ZARF

**“KÜRTÇE ZARF’IN YUKARI KURMANCI LEHÇESİ İLE ORTA KURMANCI LEHÇESİ ARASINDA
KARŞILAŞTIRMASI”**

ÖZET

Zarflar dilbilgisinin en önemli konularından biridir. Bu bağlamda, “*Kürtçe zarf’ın Yukarı Kurmanci Lehçesi ile Orta Kurmanci Lehçesi arasında karşılaştırması*” adlı çalışmamış önemli bir konudur. Bu sebepten, bu çalışmamda zarflara Yukarı Kurmanci Lehçesi ve Orta Kurmanci Lehçesinde anlam bakımında değinmeye gayret ettim. Her iki lehçenin yazı dilinde kullanımını bu çalışmamda örneklerle destekledim. Zarfların her iki lehçedeki benzerlik ve farklılıkları çalışmamın önemini arz etmekte olup zarf kurallarını gözler önüne sermektedir. İki önemli ve başlıca lehçe arasındaki bu karşılaştırmalı çalışma benzerlik ve farklılıkları ortaya çıkardığı gibi, iki lehçenin birbirine olan yakınlık ve uzaklığını da açığa çıkarmaktadır. Buradan hareketle, bu iki lehçenin birbirine ne kadar yakın veya ne kadar uzak olduğunu görebiliriz.

Bu çalışma Giriş ve üç bölümden oluşmaktadır. Birinci Bölümde *Orta Kurmanci Lehçesi’nde Zarflar konusunu*, İkinci Bölümde *Yukarı Kurmanci Lehçesi’nde Zarflar konusunu* ve Üçüncü Bölümde *ise Her İki Lehçe Arasında Zarf Benzerlikleri ve Farklılıkları konusunu işlemiş bulunuyorum*. Çalışmamın son bölümünde ise Sonuç ve Referanslar bölümleri yer almaktadır.

Anahtar Kelimeler : Zarf, Karşılaştırma, Dilbilgisi, Diyalekt.

Sayfa Adedi : XVI+110

Danışman : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

İkinci Danışman : Doç. Dr. Nerîman Ebdullah Xoşnaw

Master Thesis

Abdullah Asaad ISMAEL

VAN YUZUNCU YIL UNIVERSITÛY

INSTITUTE OF THE LITERATURE OF LIVING LANGUAGES

KURDISH LANGUAGE AND CULTURE DEPARTMENT

Jan - 2021

**ENVIRONMENTAL MAINTENANCE COMPARATIVE RESEARCH
BETWEEN THE MIDDLE AND UPPER DIALECTS OF THE KURDISH**

ABSTRACT

Adverbs are one of the most important topics in grammar. In this context, *the comparison of the adverbs between North Kurmanji Dialect and Central Kurmanji Dialect is also very important in Kurdish Language*. For this reason, in this study, I refer to adverbs in terms of meaning in North Kurmanji Dialect and Central Kurmanji Dialect. I supported my work with examples from the written language of both dialects. The similarities and differences of adverbs in both dialects are important to my study and reveal the adverbial rules. This comparative study between two important and major dialects reveals the similarities and differences, as well as the closeness and distance of the two dialects to each other. From this, we can see how close or how far these two dialects are from each other.

This work consists of Introduction and three parts. In the first chapter, *I have covered the issue of Adverbs in Central Kurmanji Dialect*, in the Second Chapter *the subject of Adverbs in North Kurmanji Dialect*, and in the Third Chapter, *the Adverbs Similarities and Differences Between Both dialects*. In the last part of my study, there are Results and References sections.

Key Words : Envelopes, Comparison, Grammar, Kurmanji.

Quantity of Page : XVI+110

Thesis Supervisor : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

Co-supervisor : Doç. Dr. Nerîman Ebdullah Xoşnaw

NAVEROK

KURTE	VI
ÖZET.....	VII
ABSTRACT.....	VIII
NAVEROK	IX
TERMÊN RÊZIMAN Û RASTNIVÎSÊ.....	1
KURTEBÊJE	XI
PEŞGOTIN	4
DESTPÊK	7
1. Navnîşana Lêkolînê.....	7
2. Sinorên Lêkolînê	7
3. Rêbazên Lêkolînê.....	7
4. Sedema Mebesta Hilbijartina Lêkolînê	7
5. Giringiya Lêkolînê	8
6. Kêşe û Arîşeyên Lêkolînê	8
7. Naverok û Pilana Lêkolînê.....	8
BEŞA YEKEMÎN	10
1. HOKER DI KIRMANCÎYA NAVERAST A ZIMANÊ KURDÎ DE.....	10
1.1. Têgeha Hokerê (Awelkar)	10
1.2. Pênaseya Hokerê (Awelkar)	13
1.3. Ji Alîyê Wateyê Ve Cureyên Hokerê	16
1.3.1. Hokerên Demkî.....	16
1.3.2. Hokerên Cihî.....	22
1.3.3. Hokerên Çawatiyê (Awelkarî Çonyetî)	31
1.3.4. Hokerên Hejmarî.....	37
1.3.5. Hokerên Rêkxistinê.....	40
1.3.6. Hokerên Sedem û Mebestê	42
1.3.7. Hokerên Nerênî (Nêgetîv)	43
1.3. 8. Hokerên Dûbaravekirinê.....	44
1.3.9. Hokerên Teqezvekirinê.....	45
1.4. Ji Alîyê Erkê Ve Hoker	46

1.5. Taybetmendiyên Hokerê	47
1.6. Komguhertina Hokerê (Polgorînî Awelkar).....	48
Di zimanê Kurdî da komguhertin hene, bi wê wateyê beşên axivînê dibin bi hoker, bi berevajî jî hoker dibin bi beşên din ên axivînê, li vir da em ê basa wan bikîn:	48
1.6.1. Komguhertina Beşên Axivînê Ji Bo Hokerê.....	48
1.6.2. Komguhertina Hokerê Ji Bo Beşên Din Ên Axivînê	51
BEŞA DUYEMÎN.....	53
2. HOKER DI KURMANCÎYA SERÎ YA ZIMANÊ KURDÎ DA.....	53
2.1. Têgeh û Pênaseyên Hoker	53
2.2. Ji Alîye Wateyê Ve Cureyên Hoker	57
2.2.1. Hokerên Demê (Katî).....	57
2.2.2. Hokerên Cih û Berekê (Şiwênî).....	62
2.2.3. Hokerên Çawanîyê (Çawayî).....	67
2.2.4. Hokerên Çendanîyê.....	72
2.2.5. Hokerên Rêkxistinê.....	75
2.2.6. Hokerên Ho û Mebest (Sebeb û Mebest).....	78
2.2.7. Hokerên Nerênî.....	79
2.2.8. Hokerên Dûbarekirinê.....	80
2.2.9. Hokerên Cextkirinê (Te'kîdkirinê)	81
2.3. Taybetmendiyên Hokeran	82
2.4. Ji Alîyê Erkê Ve Hoker	85
BEŞA SÊYEM	87
3. DI HERDÛ DIYALEKTÊN KURDÎ DA HOKER	87
3.1. Ji Alîyê Lêkçûnê (Wekhewî) Ve Hoker	87
3.2. Ji Alîyê Ciyawazî (Cudahîyê) Ve Hoker	97
ENCAM	101
ÇAVKANÎ	103
1. Pirtûkên Bi Zimanê Kurdî.....	103
2. Nameyên Master û Doktorayê	108
ÖZGEÇMİŞ	
TEZ ORIJİNALLİK RAPORU	

KURTEBÊJE

amd.	: amadekar
bnb.	: berhema navborî
bnç.	: berhema neçapbûyî
bnr.	: binêrin
br.	: berhevkin
b.z.	: Pêşiya zayendê
c.	: cild
ç.	: çap
g.	: gotar
g.n.	: gotara navborî
h.	: hejmar
h.b.	: heman berhem
h.d.	: heta dawî
hwd.	: her wekî din
tîp.	: tîpgehezî
vgz.	: veguhezêr
wer.	: wergêr
z.	:zayînî

TERMÊN RÊZIMAN Û RASTNIVÎSÊ

Rêz	Kurmancîya Naverast	Kurmancîya Jorîn
1	Awelkar, Hawelkar, Awelfirman, Zerf, Awelguzare, Awelkirdar, Qeyd.	Hoker, Zerf, Hevalferman, Hevalkirdar, Qeyd.
2	Awelkarî Katî, Demî.	Hokerên Demê
3	Awelkarî Şiwênî.	Hokerên Cihî
4	Awelkarî Çonyetî,	Hokerên Rewşê
5	Awelkarî Çendêtî	Hokerên Çendî
6	Awelkarî Rêxistin	Hokerên Rêxistin
7	Awelkarî Ho û Mebest,	Hokerên Ho û Sedem
8	Awelkarî Nerênî,	Hokerên Nerênî
9	Awelkarî Dûbarekirdine We	Hokerên Dubarakirin, Tekrarkirin
10	Awelkarî Cextkirdin	Hokerên Tekezkin
11	Biker- Kara	Kirde, Kare, Lêker
12	Berkar, Berkarî Rastewxo	Bireser, Bireserê, Rasterast
13	Naw	Nav
14	Nawî Nasraw	Navên Diyar
15	Nawî Nenasraw	Navên Nediya
16	Nawî Giştî	Navên Giştî
17	Nawî Taybetî	Navên Taybetî
18	Nawî Sade	Navên Xwerû
19	Nawî Nasade	Navên Tawangî
20	Cênaw, Ranaw	Cînav - Cînavk- Pronav
21	Cênawî Serbexo	Cînavên Cûda
22	Cênawî Xoyî	Cînava Vegerok
23	Firman	Ferman - Emir
24	Kar	Lêker
25	Karî Tewaw	Lêkerên Temam
26	Karî Natewaw	Lêkerên Netemam

27	Wûşe	Bêje, Peyv, Wûşe
28	Wûşey Pris	Bêjeyên Pirs
29	Cêgorrkê	Cihgohertin
30	Frêz, girê.	Firêz
31	Frêzî Karî	Firêzê Karî
32	Frêzî Awellkarî	Firêzê Havelkarî
33	Amrazî Lêkder	Gihanekên Hevedudanî
34	Amrazî Nîşane	Daçeka Nîşaneyê
35	Amrazî Pris	Pirsîşanê Amûra Pirsê
36	Paşgir	Paşgir
37	Pêşgir	Pêşgir
38	Tewawker	Temamkar
39	Rane Birdû Bo Katî Êsta û Dahatû	Demên Ji Bo Niha û Dema Bê
40	Tewawkerî Karî Rabridû	Temamkere Karê Borî
41	Tewawkerî Karî Ranebridû	Temamkere Karê Neborî
42	Tewawkerî Karî Femandan	Temamkere Karê Fermande
43	Tewawkerî Karî Natewaw	Temamkere Karê Natemam
44	Radey Awellkar	Astê Hoker
45	Radey Awellnaw	Astê Rengdêr
46	Tewawkerî Kar	Temamkere Karê Karî
47	Gokirdin	Bilêvkin
48	Çemk	Têgeh
49	Berkarî Rastewxo, Berkar, Tewawkerî Rastewxo	Biresera Rastewxe, Bireser
50	Berkarî Narrastewxo, Tewawkerî Beyarîde	Biresera Nerastewxo, Alîkar
51	Form	Form
52	Prîpozîşin, Amrazî Peywendî,	Gihanek, Gihînek Têklî, Pêşgir
53	Wabeste	Girêdayî
54	Yarîdederî Amrazî Geyener	Harîkarîya Amurên Gihandinê

55	Cêkewte	Cêkewte
56	Gerdan, Dabeşkirdin	Bişkkin, Dabeşkirin
57	Espêkt	Espêkit
58	Serçawe, Jêder	Çavkanî, Jêder
59	Encam	Encam
60	Dîyarîkirdinî Poll	Diyarkirina Fêrgeh
61	Araste	Berîdanî - Hêl
62	Asoyî	Terîbî
63	Naşwênî	Nacî



PEŞGOTIN

Di vekolîna me ya bi navê “*Hoker Di Alîyê Wateyê ve Lêkolînek Ya Berawirdî ye Di Navbera Zaravayê Kurmancîya Navîn û Jorîn*” de qala ciyawaziya hokerê di navbera diyalekta jêrîn û jorîn de ye. Sedem vê jî di vê xebatê de nimûneyên Kurdîya Jorîn ji çavkaniyên xwe yên eslî hafîne wergirtin. Wekî din yên yên Kurdîya naverast ji çavkanî û wek axaftina devokên xwe hatîne wergirtin. Ev vekolîn li çarçova rêbaza berawirdî ku berawirdkirina hokeran di navbera zimanê Kurdî (Kurmanciya jor û Kurmanciya naverast) da hatiye ava kirin.

Ji ber ku heta niha ew namên akademîk yên master û doktorayê bi giştî li ser rêzimana Kurdî bi şeweyekê berfireh di zimanê Kurdî da bi diyalekta Kurmanciya jêr û Kurmanciya jorê nehatîne peşkeş kirin. Lêbelê eger em Kurmanciya jor û Kurmanciya jêr pêkva berawird bikin wek karê akademîkî li ser herdû diyalêktan bi layê wateyê ve tê kirin. Bi taybetî berawirdkirina van herdû diyalêktên zimanê Kurdî digel zimanên cuda yên derdorê bi taybetî nav xwe da jî di ser de ye. Rêbaz û metoda berawirdkirina zimanan di karên akademîkî da ne wekî karên din tê zanîn. Bi giştî dema mirov di kitêban da dibine ku dû ziman yan dû zaravê berawirdî hevdû kirîne ji bo wê çendêye ku mirov pitir hînî zimanê dîtir yan zaravê dîtir jî dibe. Lê belê di karên akademîkî da berawirdkirina du zimanan yan zaravan bo wê çendê ye ku ew cudahî û wekhevîyên di her du zimanan da hene bihêne eşkerekirin û di encamê da amaje bi wan xalên cuda û wekhev têne holê.

Hêjayê gotinêye ku bibêjîn ev her du diyalekt jî ne ser bi yek ve ne. Lê belê dewlemendiya zimanê Kurdî ye. Me hewl daye di vê vekolînê da berawirdkirina hokeran di navbera diyalektên zimanê Kurdî (Kurmanciya jor û Kurmanciya naverast) taybet di navbera van herdû devokan da layenên wekhev û yên cuda diyar û eşkera bikin. Helbet her xebata ku mirov destpê bike. Xasma kareke akademîk be, hindê astengî dikevne pêşiya lêkolîner. Bi destxistina çavkaniyên rêzimanî, kitêbên rêzimanî yên zimanê Kurdî (Kurmanciya jor) bi taybetî çî bi tîpên aramî yan jî latînî weke pêdivî kêm bi dest me çêbûye. Ji ber ku gelek kar heta vê dawîyê li ser rêzimana Kurmanciya jor bi taybetî pîtên aramî nehatîne kirin. Ev jî wek asteng derketiye pêşiya me.

Ev vekolîne ji bilî destpêk û encamê bi sê beşan ve hatiye amade kirin.

Beşa Yekem: Ev beş li ser taybeta bi diyalekta zimanê kurdi (Kurmanciya naverast) xwediyê naverokê ye, ango naverok li ser Kurmanciya naverast e. Di vê beşê da jî herwiha behsa van binbeşan hatiye kirin: Têgeh û pênasaya hoker, ji layê watayê ve cureyên hoker, ji layê binyadê ve, pileyên hoker, biçûkkirina hoker, xortkirina hoker, hokerên navdarîyê, bikarînana hoker li cihê nav, erkên hoker di ristê da û her wisan hokerên karî jî yek ji wan binbeşên vê ne.

Beşa Duyem: Ev beşe di derbareyê taybetmendiya diyalekta zimanê Kurdî de (Kurmanciya jorîn) ye. Di vê beşê da behsa van binbeşan hatiye kirin: Têgeh û pênasaya hoker, ji layê watayê ve cureyên hoker, ji layê binyadê ve cureyên hoker, pileyên hoker, biçûkkirina hoker, xortkirina hoker, bikarînana hoker wekî nav û her wisan erkên hoker di ristê da.

Beşa Sêyem: Di vê beşê da em li ser gotin û angaşên xwe yên di beşên ewilî de sekinîne û me hoker bi layê berawirdkirinê hildaye dest. Sedem vê jî, ew xalên yekser û xalên hev cuda di her du diyalektan da jî hatîne amaje kirin. Di vê vekolînê da me hewl daye ku berawirdkirina hoker di navbera herdû diyalektên zimanê Kurdî da bikin û çend encamên û zanîstên giring dest nîşan bikin.

Bi kurtasî di asta yekemîn de li ser hoker di diyalekta Kurmanciya naverast û berawirkirina wan hatîye bidawî kirin. Di asta duyemîn da li ser pênasaya hoker di diyalekta Kurmanciya jor û berawirkirina wan hat sekinandin. Di beşa sêyemîn da jî hoker di herdû diyalektên Kurdî, Kurmanciya naverast û jorîn da berawirkirina wan da pêwendiyên di navbera diyalekta jorîn û diyalekta naverast di zimanê Kurdî da yên serdema nû zêdetir ronî dikin hat seknandin.

Teza me xebateka rêzimanî ye ku em zêdetir li ser berawirdkirin û cudahiyan diyalektî rawestîya ye. Ango me mînakên hokeran li gorî diyalekta jorîn û naverast yên ku zimanê Kurdî hilgirtine dabeş û şîrove kirine. Lêkolîn bi vî awayî berawirdkirina diyalektan ji aliyê reziman û ziman ve hate şîrovekirin.

Ez berîya her tişitî spasîya mamosteyên hêja û rêzdar yên beşa zimanê Kurdî li Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê dikim ku bi ked û dilsozîyeke herî zêde bi me re eleqeder bûn. Her wiha ez pir spasîya Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ dikim ku erkê serpereşitîkirina vê lêkolînê bi stûyê xwe ve wergirt. Her wisa pir ji dil spasîya mamoste qedirgiran Dr. Nerîman ‘Ebdulla XOŞNAW û Dr. Ebdullah Hussein

RESUL dikim ku bi pêşnîyarî û rê nîşankirina wan ve gelek arîşe li ber min ron bûn. Hem di warê Kurdîzanebûnê de hem jî di warê akademîk de alîkarîyên wan gelek çê bûn. Ji ber parvekirina fikir û ramanên xwe yê nirixbilind. Her wisa rewşenbîr û lêkolîner Ehmed Mihemmed MISTEFA û Mamoste Koçer Enwer NAIF jî re gelek spasdarim û mala wan ava be.

Her wiha di pêvajoya vê xebatê de ji bo sebr û tehemûl û alîkarîya wan ya manewî û heman dem vê xebatê pêşkêşî dayîk û birayên xwe dikim ku hertim alîkarên min ên maddî û manevî bûn zêdebarî xweşik û bira û hemû malbata xwe û dayîka zarokên xwe dikim. Û li dawîyê spasî ji bo her kesê ku alîkar bûye digel me ji bo bi dawî anîna vê lêkolînê û kitêpxana Zeytunê.

Abdullah Asaad ISMAEL

Van- 2021

DESTPÊK

Navnîşana Lêkolînê

Hilbijartin û destnîşankirina navnîşanê, yek ji babetên herî girîng ên lêkolînên zanistî ne. Ango ev tê wê wateyê ku li ser xebatkar pêwîst e babetekê helbijêre ku xwe hewce lê hebe û ligel beş û binbeşan xwe biguncîne.

Navnîşana lêkolîna ku me hilbijartîye jî “hoker ji aliyê wateyê ve, lêkolîneka berawirdkirîye di navbera Kurmancîya naverast û Kurmancîya jor” da ye, ev wateya wira da ango hoker di herdû zareveyan da berawird kirin e.

Sinorên Lêkolînê

Diyarkirina sînorê lêkolînê gelek pêwîst û girîng e. Ji ber ku lêkoler bahsekê têkel û pêkel (tevlîhev) nebe, sînorê lêkolîna me di zimanê Kurdî da û di nav herdû zaraveyên naverast û serî da ye. Nimûne û hevokên me di zimanê nivisînê yê ku herdû diyelektên Kurdî hatine wergirtinê.

Rêbazên Lêkolînê

Hemû lêkolînên zanistî pêwîstî bi rêbaz û metoda heye ku lêkoler bi xwe girêdirayî vê rêbaz û metodê bike. Di vê lêkolîna da me rêbaza “wesfa şîkarî” hilbijarti ye. Ev wateya behskirina babeteke di herdû zareveyan da ye. Dîsa di vê lêkolînê de em li ser vekhevî û cudahiya hokerê sekinîne ku di vê mijarê de jî me li gor herdu aliyan mînak dane.

Mebesta Hilbijartina Lêkolînê

Mebesta sereke ya me ya ji bo hilbijartina vê babetê, bo evê ye ku zêdetir zanyarî û şarezeyên me li ser hoker di herdû zareveyan da peyda bikin, di heman demê da gelek babetan di herdû zarevan da berçavan, ji bo vê me babeteka berawirdkirî hilbijarti ye ku babeteka nû ye û sûdek ji bo xwandekarên herdû zareveyan heye. Bi curekî din herdû zarevan da lêkolîn li ser babetî hoker hatiye kirine. Belam ji aliyê berawirdkirinê xebat nehatiye kirine, ji bo evê me nîyeta xwe birîye ber aliyê berawird kirinê.

Giringiya Lêkolînê

Giringîya lêkolîna me li şîrovekirina aliyê lêkçûn û ciyawazîya hoker di herdû zareveyan daye. Li gor yasayên rêzimanî hoker xwe dibîne, ku em jî girîngîyeke li vir da xwe dibinin. Herwiha berawirdkirina babetêke di nav dû zaravayan gelekî girîng û pêwîste, di heman demê da radeya dûr û nêzîk jî bo derdixe, ku xwe ev dû zareva çend layenên di va nêzîkin yaxud dûrin. Girîngîya lêkolîna me li şîrovekirina aliyê lêkçûn û ciyawazîya hoker di herdû zareveyan daye.

Kêşe û Arîşeyên Lêkolînê

Bêguman hemû lêkolînên ku hatine encam dayîn rûberûyê kêşe û girîft û zoriyan hatine. Xasma di xebateke weke zaraveyî Kurmancîya jorîn hêj zêdetir e. Ji ber ku udi navbera herdu aliyên bi aliyê dîyalektîkî va pirsgirêk hene. Herwiha bikaranîna dû elfubên wek “erebî û latînî” ji bo çavkanîyên zimanê Kurdî ku ev jî giriftêkî gewre ye. Çimkî hemû kar û zehmet dikeve ser milê amadeker û lêkolînavan.

Naverok û Plana Lêkolînê

Di lêkolîneka zanîstî da naverok û pîlan gelek pêwîste ku bê diyarkirin. Ev xebata me ji destpêkek û sê beşan pêk hatiye.

Beşa yekem, ku bi navûnîşana “*hoker di Kurmancîya jorîn da*” ye. Ev jî wan binbeşan di xwe de dehevîne: Têgeh û pênaseya hoker, cureyên hoker ji aliyê wateyê ve “hokerên demê, hokerên cih û berekê, hokerên çawaniyê, hokerên çendanîye, hokerên nerênî, hokerên cextkirinê, hokerên dûbarekirinê, hokerên xwe mebest” û taybetmendiyên hoker.

Beşa Duyemîn, ku bi navûnîşana “*hoker di Kurmancîya naverast da*” ye. Ev jî wan binbeşan di hunidre xwe de dihevîne: Têgeh û pênaseya hoker, cureyên hoker ji aliyê wateyê ve; hokerên demê, hokerên cih û berekê, hokerên çawaniyê, hokerên çendaniye, hokerên nerênî, hokerên cextkirinê, hokerên dûbarekirinê, hokerên xwe mebest, taybetmendiyên hokeran, polînkirina hokeran.

Beşa sêyem, ku bi navûnîşanê “*aliyê lêkçûn û ciyawazî ve hoker di herdû dîyalektan da*” ye. Di vê beşe de jî em wan binbeşan şîrove dikin. Ev beş bi aliyê

lêkçûnê ve hoker di herdû zareveyan da, alîyê ciyawazî ve hoker di herdû zareveyan da hatiye sentêzkin.



Me Sûd Wergit Ji Çavkaniyên Xebatê

Me di vê xebatê xwe de bi piranî ji pirtûkên Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmancî*, Ewrehman Hacî Marif, *Rêzimanî Kurdî*, Lijneyek ji Wezareta Perwerde, *Ziman û Edibe Kurdî*, Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw, *Rêzimanî Kurdî (Kurmancîya serî)*, jê sûd wergirt.

BEŞA YEKEMÎN

1. HOKER DI KURMANCÎYA NAVERAST A ZIMANÊ KURDÎ DE

1.1. Têgeha Hokerê (Awelkar)

Di zimanê Kurdî de ji bilî zaraveya hoker, gelek zaraveyên din jî hatîne bikaranîn.

Weke Mînak

Awelkar, awelfirman, awelkirdar, hoker, zerf, qeyd, edvêrbil... hwd.

Hinek ji van zaraveyan rihên wan di nava devokên cuda cuda ên zimanê Kurdî de ne. Hinekên din jî di nava zimanên din ên biyanî yên hatîne nava zimanê Kurdî de bicî bûne. Gava em li wan hemî zaraveyan dinêhirên dibînin ku ev hemî xwedî mebestin ku di vê mijarê de tûşî hev tên.

Derheqê dîroka bikaranîna têgeh û zaraveya hoker, weke pîrrianiya têgeh û zaraveyên din, vedigere ji bo serdemê Yonanîyan. Ango dîroka bikaranîna vê kûr e. Lewre pêşketina Yonaniyan di pîrrianiya mijarên zanistî de bû û rojhilat û rojava jî

avêtibûn jêr destê xwe. Têgeh û zaraweya hoker jî ji afirandina Yonanîyan e û êk ji kevintirîn beşa axavtinê ye di dabeşkirina peyvê de.

Destpêkê navê “*vê zaraweye di edvêrbil bûye, ku ji edvêrb ê hatiye wergirtin. Ev jî yê ji edvêrbiyemê ve yê hatî, ku rêzmannivîsên Romanan ji Girîkîyan yê wergirtî û bikar anîye*”¹, yên ku heta niha ji vê mijara hevoksaziyê vekolîye dû zarawe ji bo bikar anîne.

*Awêlkirdar: Ji bo wan girêyên ku awelkaran pêk dihînin.*²

*Awelguzare: Ji bo wan beşên din ên axavtinê dadrêjin.*³

Lêbelê, Azad Ehmed Husên, ji bo herduyan jî peyva *edvêrbil* bikar anîye. Lewre teva *Edvêrbil* di heman demê de dibin *edvêrbil* jî. Ji ber ku valahîyeka hevokê pirr vedike û bi lêkerî ve hatîne girêdan, a rastî teva *edvêrbil*an *edvêrbil* nîn e. Lewre *edvêrbil* zaraweyeka ferhengî ya peyvsazî (morfolojî) ye, peyv e. Lêbelê *edvêrbil* yekeyeka hevoksaziyê ye, wate girê ye.⁴

Awelkar (Hoker) weke zarawe bi temamî digel mebest û naveroka xwe li hev hatîye û zaraweyeke hevdudanî ye, ku pêk tê ji: Peyva “heval” an jî “hawal” + kar = yê ku digel lêkerê tên.

Weke me da nîşan kirin ku di zimanê Kurdî de li hemberî têgeha hoker, komek ji zarawe û têgeh tên bikar anîn. Emê li vir wana bidîn xuya kirin.

Se'îd Sidqî Kaban derheqê Awelkarê di pirûka xwe de “*serif û nehwi Kurdî*” zaraweya *îsmî zeman û îsmî mekan*⁵ dibêje û di vî warî de yê bikaranîye û bi vî şiklî pênase kiriye.

Tofîq Wehbî zaraweya zerf a ‘*erebî ji bo Awelkaryê*’⁶ bikar anî ye.

¹ Asher, R, E And Simp Son, J.M.Y. (1994), *The Encyclopedia Of Language And Linguistics*. Vol. Oxford: New York Pergman Press, 39.

² ‘Ewrehman Hacî Marif (1998), *Rêzimanî Kurdî, Bergî Yekem (Wuşesazî), Beşa Çarem (Jimare û Awelkirdar)*, Dezgay Rewşenbîrî û Belawkirdinewey Kurdî, Bexda, 133.

³ Şilêr Resul Berzincî (1989), *Awelguzare Le Zimanî Kurd Da*, Nameya Mastirê, Kolêja Edebê, Zankoya Selaheddîn, Hewlêr, 81.

⁴ Azad Ehmed Husên (2001), *Erkî Edvêrbil Le Frawankirdinî Frêzî Karî Da Lêkolîneweyekî Berawirdkariye Be Kerestey Diyalêktî Xwarû û Hewramî*, Nameya Mastirê, Koleja Ziman, Zankoya Silêmanî, Silêmanî, 196.

⁵ Se'îd Sidqî Kaban, (1928), *Muhtasar Sarf û Nehu el- Kurdî, Beşa Yekem, Çapa Yekem, el- Necah*, Bexda, 24.

⁶ Tofîq Wehbî ,(1929), *Desturî Zimanî Kurdî, Çapa Yekemîn, Çapxaneya Necah, Bexda, 24.*

Merdoxî di ferhenga xwe de di dû ciyan de derheqê wan peyvan yê hatîye ziman, ku dibin zerf, carekê “*îsimu zeman û îsimu mekan*” ê ji bo didanê û careka din jî bi “*zerfu zeman û zerfu mekan*”⁷ bikar anî ye.

Nurî Elî Emîn di pirtûka xwe de hokerê wek *awilkar* wesif dike.⁸

Cigerxwîn jî di pirtûka xwe de “awaw destûra zimanê Kurdî”, ji bo “Awelkarê demkî, Awelkarê cihkî” dû zarawe “*demnav - cihnav*”⁹ yê bikar anî ye.

Reşîdê Kurd jî di pirtûka xwe de “*nîr*”im yê ji cihê “*Awelkar*” ê yê bikaranî, çimkî *Kirmanc dibêjin “îro nîrekî teng e”, wate zerfeka teng e, ji ber vê jî “nîr” bi tamamî wateya “zerf”*¹⁰ ê dide nîşan û wek pêname derbas dibe.

Di zimanê Îngilîzî de zaraweya “*adverb*”¹¹ ji bo hokerê tê bikar anîn.

Destûra Pars “*r.ziwele-nîr*” ji bo hokerê zaraweya “*qîd*”¹² yê bikar anî.

Kurdoyêv di pirtûka zimanê Kurdî de li jêr navê “*fêlnîş*” an jî “*zerf*” an jî “*Hawelkar*” yê bikar anî.¹³

Ewrehmanî Hacî Marif, zaraweya “*awelkirdar*” yê ji bo bikar anîye.¹⁴

Nerîman Ebdulla Xoşnaw jî zaraweya “*awelkar*” ê ji bo bikar anîye.¹⁵

Di pirtûkên dibistanan jî bi “*hawelkar*” navê wê yê hatî.¹⁶

Weke xuyaye her yek ji van şarezayan têgeheke cuda bikar anîye. Lêbelê digel vê çendê jî pirranîya wan awelkar an jî hawelkar yê bikaranî. Bi nerîna me jî awelkar zêdetir cî digire, çimkî bi wateya hawel “*heval*” an jî awel ê lêkerî tê, bi wê wateyê peyveke ku hertim digel lêkerî tê.

⁷ Mehemed Merdoxî, (2018), *Rêzimanî Axawtinî Kurdî*, Bergî Yekem, Belawkirdinewey Kurdistan, Îran, Sine, 240.

⁸ Nurî 'Elî Emîn, (1960), *Rêzimanî Kurdî*, Çapa Yekemîn, Çapxaneya Kameran, Silêmanî, 226- 238.

⁹ Cegerxwîn (1960), *Awaw Distura Zimanî Kurdî*, Çapxaneya Selaheddîn, Bexdad, 21-22.

¹⁰ Reşîdê Kurd, (2008), *Rêzimana Zimanê Kurmancî*, Dezgay Spîrêz, Çapxaneya Xanî, Duhok, 106.

¹¹ Lîjneyek ji Ziman û Zanistekan, Korî Zanyarî Kurd, (2018), *Rêzimanî Axawtinî Kurdî*, 243.

¹² Lîjneyek Zanyarî Kurd, (2018), *b.n.b*, 243.

¹³ K.K. Kurdoyêv (2018), *Rêzimanî Axawtinî Kurdî*, Bergî yekem, Belawkirnewey Kurdistana, Îran, Sine, 113.

¹⁴ 'Ewrehmanî Hacî Marif (2014), *Rêzimanî Kurdî, Bergî Yekem, Beşa Duyemîn, (Wuşesazî), (Cînav)*, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 119.

¹⁵ Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî*, Çapa Heftemîn, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 115.

¹⁶ Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde, (2016), *Ziman û Edebî Kurdî, Pola Yazdehemî Amadeyî*, Berêweberayeti Gîştî Program û Çapemenîyekan, Hewlêr, 74.

1.2. Pênaseya Hokerê (Awelkar)

Di zimanê Kurdî de komek ji pênaseyên curbicur ji bo hokerê hafîne kirin. Li vir de çendek ji wan pênaseyan emê nîşan bidîn. Paşê jî em ê pêkolê bikîn wan pênaseyan puxt vekeyn, bi awayekî şert û mercên hokerbûna wan em ê nîşan bidîn.

Se'îd Sidqî Kaban di vî warî de, "*Nav, dû beş e: îsimu mekan îsimu zeman: navek be wateya demî tê de be, wate teqezê li ser demî bike. Îsimu mekan: navek be teqezê li ser cihî bike.*"¹⁷ Ji aliyê zimanê Erebi ve ev pênaseye ku ev e jî digel zimanê Kurdî li hev nayê. Ango pênaseya wî ya ji bo Kurdî li gor têgiha Erebi hatiye kirin.

Tofiq Wehbî, "*Zerf peyvek e, ku ji bo tamam kirina wateya fi'lekî an jî sîfetekî an jî zerfeka din bikêr tê. Sîfetek çawa wateya navekî tamam dike, eve jî weha ya sîfet û fi'l û zerfê tamam dike.*"¹⁸ Di vê pênaseyê de bi awayekî zêde guncav û li hev hatîye. Lewre hokerê bi lêkerî ve girê dide.

Mekaros di vê beşê de qala mijare din kiriye û bi vî şiklî pênase kiriye. "*Ew partîkilin, ku di firêza lêkerî de derdikevin, hinek caran jî di firêza navî de, an jî di destpêka axivînê de derdikevin.*"¹⁹ Li gorî vê pênaseyê, hoker di herdû firêzên lêker û navî de tên. Lêbelê berçavronîyên din nedane, ev pênase jî bi awayekî zêde guncayî û li hev hatîye, çimkî hokerê bi lêkerî ve girê dide.

Mekenzi, "*Edvêrb di hemû navekî de, bi sedema paşgirê (ê) çê dibin.*"²⁰ Mixabin ev pênaseye jî digel xwezaya hokerê li hev nayê. Em dikarin bibêjin munasibê pênasekirina hevokên Kurdî nîn e.

Kurdoyêv, di derbareyê zerfê de wiha îfade dike: "*Dibêje van peyvan fêlnîş, zerf, awelkar, ku hal û hewal û qeyd û tehrî kirin û hebûnê dide nîşandan.*"²¹ Ev e pênase nîn e û wek pênase nayê qebûl kirin. Li ciyê wê belkî dibe bête gotin cureyên

¹⁷ Se'îd Sidqî Kaban, (1928), *Muhtasar Sarf û Nehu el- Kurdî*, Beşa Yekem, Çapa Yekem, el- Necah, Bexda, 24.

¹⁸ Tofiq Wehbî, (1929), *Destûrî Zimanî Kurdî*, Çapa Yekemîn, Çapxaneya Necah, Bexda, 17-18.

¹⁹ Miccarus. E. (1958). *A Kurdish Grammar*, Washington: Washington Polarography Company. 78.

²⁰ D. N. Mekenzi, (1966), *The Dialect Of Awroman (Haweaman- I Luhon)*, 56 - 57.

²¹ K.K. Kurdoyêv (2018), *Rêzimanî Axawtinî Kurdî*, Bergî yekem, Belawkirnewey Kurdistana, Îran, Sine, 113.

hokerê, bi wê wateyê vî zimanvanî nikarîye pênaseyekê ji bo hokerê bike. Dibe ku rasterast hatîye ser cureyên wê.

Gîwî Mukiryani, “*Hoker peyveke dem an jî cihê kiryarê tê de diyar dike.*”²² Ev pênase jî tenê li ser dû cureyan bi cî dibe, ew jî hokerê demî û hokerê cihî ye, bi wê wateyê eve jî pênaseyeka giştî nîn e.

Li gor Mihemed Emîn Hewramani, “*Hoker ew peyvin, ku wesfa lêkerî an jî rengdêrî dikin.*”²³ Ev pênase ji dû beşan pêk tê. Di beşa yekem temame, çimkî hoker wesfa lêkerî dike, lêbelê beşa dûyem temam nîn e. Çimkî hoker wesfa rengdêrî nake.

Nesrîn Fexrî û Kurdistan Mukiryani di derbareyê mijarê de wiha bilêv dikin. “*Ew zerfe, ku bûyer tê de di qewime, wate dibe bi zerf ji bo wê an jî ew çarçovê dora wê dide, îcar cih be an jî dem an jî hal û haleteka taybetî be.*”²⁴ Ev pênase piraniya aliyên hokerê yên bixwe ve girtî tine ziman.

Li gor Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde, “*Awelfirman (hoker) ewe ku di nav hevokê de sînorekî ji bo bûyer û ramana lêkerî didane û bi awayekî zelal rûyekê lêkerî aşkera dike û dibe temamkerê wî lêkerî.*”²⁵ Ev pênase heta astekî goncav tê hesibandin. Lewre hoker girêdayî lêkerî ye û dibe temamkerê wê.

Huddleston, “*Peyveke wesfa lêkerî an jî rengdêr an jî edvêrbeka din dike.*”²⁶ Ev pênase jî heta astekî giştî ye. Hoker girêdaye bi lêkerî an jî hokerekê din.

Sadiq Behaeddîn Amêdî, “*Ew beşa axivînê ye ku eleqeyeka rasterast bi lêkerî ve hebe ji aliyê çawanîyê an jî dem an jî cihî cureyê qewimînê û neqewimînê an jî rewşeka din ve hebe.*”²⁷ Ev pênase hokerê girêdayî lêkerî dike.

²² Gîwî Mukiryani (1972), *Elfûbêyê Kurdî û Wênedar Be Pîtî Latînî*, Çapxaneya Kurdistan, Hewlêr, 145.

²³ Mihemed Emîn Hewramani (1973), *Seretayêk Le Filolojîyê Zimanî Kurdî*, Çapxaneya Me’arîf, Bexda, 165.

²⁴ Nesrîn Fexrî û Kurdistan Mukiryani (1982), *Rêzimanî Kurdî Polî Yekemî, Beşa Zimanî Kurdî*, Zankoya Selaheddîn, Kolêja Edebê, Çapxaneya Selaheddîn, Hewlêr, 167.

²⁵ Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde (1982), *Rêzimanî Xwêndinga Nawendî û Amadeyekan, Qonaxekani*, (2, 3, 4, 5, 6), Çapxaneya Jimare II. Perwerdeyê, Hewlêr, 48.

²⁶ Huddleston, R. (1984), *Introduction To The Grammar Of English*. Cambridge University Press, 330.

²⁷ Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancî Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Çapa Yekemîn, Bexda, 419.

Rubniz, “Beşeka axivîne ye, nahête dabeş kirin û eleqe bi lêkerî ve heye.”²⁸
Pênaseka temam û giştîye, çimkî hoker girêdayî lêkerî ye û dabeş nabe.

Ewrehmanî Hacî Marif, “Hoker weke beşeka serbixwe ya axivîne li ser koka taybetmendiyên peyvسازی û hevoksazî û watesazîyê tê cuda kirin, hoker taybetmendîya bûyerê ku kiryarê derdixe, taybetmendîya taybet ku rengdêr e, taybetmendîya rewşê, ku hokerê dide nîşandan diyarî dike, hokerê çawanîyê an jî astê bûyerê an jî astê çawatiya tiştê an jî rewşa cuda ya qewimîna karekî: dem, cih, sedem, mebestî digîne.”²⁹ Ev pênase bi baştirîn û guncayîtirîn pênase derbarê hokerê tête danîn. Çimkî hemû aliyên hokerê xistîne pêşçav. Bi ramaneka din pênaseka temam û giştî ye.

Refîq Şiwani di vî warî de dibêje ku, “Beşeka axvîne ye, temamkerê lêkerî ye ji aliyê dem, cih, çawati û çendîtî û astê tertîb û hejmar, wate ji vî alî wesfa lêkerî dike.”³⁰ Ev pênase heta astekê zêde guncayî û giştîye, çimkî ji aliyekî pênaseya hokerê kirîye, ji aliyekê din ve cureyên wê jî xistîne hole.

Nurî 'Elî Emîn jî mijarê wiha bilêv dike: “Ew peyve an jî biwêje an jî parçeka şopînerê, ku wesfa beşekî ji beşên axivîne dike.”³¹ Ev pênase giştî nîn e. Çimkî wê aşkera nake ku hoker wesfa çî beşeka axivîne dike ku eve jî bi kêmasîyek dihête danîn, bi awayekî hoker tenê wesfa lêkerê dike.

Li gor Lijneyek Le Wezaretî Perwerdehiyê, “Peyveke rûyekê qewimîna karê hevokê derbareyê çawatiya van bûyeran, an jî dem an jî cih an jî çendatiyê derdixe û li vî alî sînorekî ji bo temamkirina ramana wê didane”³² Ev pênase heta astekê zêde guncayî û giştî ye. Lewre ev yek aşkera kirîye ku hoker wesfa lêkerî dike û rûyek an jî aliyekî ji aliyên lêkerî dixê holê.

²⁸ R. H. Rubniz (1997), *Mucez Tarîx îmil Luxe fil- Garb*, Silsîle'tul Kutub Seqafiye Şehriye, Yêzdur el-Meclis el-Vatani lil- Seqafe vel-funun vel-edeb, el-Kuwet, 95- 96.

²⁹ Ewrehmanî Hacî Marif (1998), *Rêzimanî Kurdî, Bergî Yek (Wuşesazî), Beşa Çarem (Jimare û Awelkirdar)*, Dezgay Rewşenbîrî û Belawkirdinewey Kurdî, Bexda, 119.

³⁰ Refîq Şiwani (2011), *Wuşesazî Zimanî Kurdî Lêkolîneweyekî Praktîkiye*, Çapa Yekemîn, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 81.

³¹ Nurî 'Elî Emîn (2012), *Rêzimanî Kurdî*, Çapa Duyemîn, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 190.

³² Lijneyek ji Wezaretê Perwerde (2012), *Ziman û Edebî Kurdî Polî Heştemî Bineretî*, Çapxaneya Dar Lubnan, Hewlêr, 90.

Selam Nawxoş jî di derbareyê vê wiha bilêv dike. “*Hoker beşeka axivînê ye ji cureyên diyar yên wê pêk tê ji hokerê cihî, hokerê demî, hokerê çawanîyê... hwd, hoker wesfa karekî dike, di destpêk û naverast û dawîya hevokê tê.*”³³ Ev pênase jî hinek alîyên hokerê xistîye hole. Bi awayekî girêdayî lêkerî kirî ye.

Li gor Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw, “*Hoker beşeke ji beşên axivînê ku wesfa karekî dike di hevokê de, çimkî dem û cih û çawatî û çendatî... hwd, lêkerî di hevokê de destnîşan dike, hoker dost û hevalê lêkerî ye, çimkî hertim digel lêkerî tê, wate girêdayî lêkerî ye.*”³⁴ Ev pênase alîyê têgeh û pênase û cureyê hokerê destnîşan dike û dide pênase kirin. Herweha hoker tenê girêdayî lêkerî kirîye û bi alavekê veneqetyayî ji lêkerî dana ye.

Wate weke di van pênaseyan da derdikeve ku hoker peyveke wesfa karî dike û girêdayî karî ye.

1.3. Ji Alîyê Wateyê ve Cureyên Hokerê

Di zimanê Kurdî da hoker ji alîyê wateyê ve bi ser çend cureyan dabeş dibe. Lêbelê bi awayekî giştî zimanzanan neh cureyên wan nîşan dane. Li gor vê jî ku hinek ji wan gelek tên bikaranîn. Weke (hokerê demkî, cihî, çawanî... hwd.). Lêbelê hinekên din bikaranîna wan gelek kêmtir e, ji wan: (hokerê teqezkirinê, nerênî... htd) ji ber hindê li vir da basa her neh cureyan em ê bikîn.

1.3.1. Hokerên Demkî

Di zimanê Kurdî de komek pênase ji bo hokerê demkî hatîne kirin, li vir de emê hinek ji wan bidîn ber çavan.

Nurî 'Elî Emîn, “*Hoker ew e ku banga wî demî dike, ku bûyerek tê de diqewime.*”³⁵ Bi vî şiklî pênase dike. Li gor vê pênaseyê li ser banga vê demê hatiye ava kirin.

Kerîmî Eyyubî û Semîr Nova, “*Edvêrb navê demî bi alîkarîya prîpozîşin û post pozîşin an jî bê alîkarî saz dike.*”³⁶ Di vê şîroveyê de jî li ser çed xalên rêzîmankî ava dibe bi vî şiklî bi alîkarîya hin bîngehan çê dibe.

³³ Selam Nawxoş (2014), *Ferhengî Zimanewanî Nawxoş*, Çapa Yekemîn, Çapxaneya Hêvî, Hewlêr, 18.

³⁴ Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzîmanî Kurdî*, Çapa Heftemîn, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 144.

³⁵ Nurî 'Elî Emîn (1960), *Rêzîmanî Kurdî*, Çapxaneya Kameran, Silêmanî, 187.

Nesrîn Fexrî û Kurdistan Mukiryani, “*Bi navê wan xuyaye, ku banga wê demî diken, ku bûyerek tê de diqewimî ye.*”³⁷ Dibêje û li gor pênaseya wî, mijar dive banga vê demê bike.

Li gor Sadiq Behaeddîn “*Demê an jî zemanê rwîdana karî destnîşan dike.*”³⁸ Di vê şîrovevê de destnîşankirina kar derdikeve hole.

Mehmud Fethulla Ehmed, “*Demê rwîdana karê hevokê dide nîşandan û di hevokê da weke peyveke an jî ji şêweyê firêzekê dihê dîtin.*”³⁹ Di pênasekirina vî nivîskarî de wekî peyvekî an jî şêweyekê hatiye dest nîşan kirin.

Wirya 'Umer Emîn “*Ew formên di ferhengan nîşaneya hokerê têde ye, bi sedema sîntaksê (hevoksazî) ve bi lêvîkirina hokerê pê têt dan.*”⁴⁰ Di vê pênaseyê de meseleya sîntaksî derdikeve pêşberê me. Wê çaxê jî dive li gor hevoksaziyê bê amaje kirin.

'Ebdulwahîd Muşîr Dizeyî “*Demê rwîdana karî nîşan dike.*”⁴¹

Ewrehmanî Hacî Marif “*Hokerê demkî tilyê ji bo demê bi cî anîna karekî radikêşe.*”⁴²

Nerîman 'Ebullâ Xoşnaw “*Bi wan hokeran dihête gotin, ku demê rwîdana karî destnîşan dikin.*”⁴³

Lîjneyek Le Wezaretî Perwerde, “*Ew hoker e, ku demê rwîdana karê hevokê diyarî dike.*”⁴⁴

³⁶ Kerîmî Eyyubî û Semîr Nova, (1968), *Diyalêktî Kurdî Mukrî*, Lêningrad, 135- 137.

³⁷ Nesrîn Fexrî û Kurdistan Mukiryani (1982), *Rêzimanî Kurdî Polî Yekemîn Beşa Zimanî Kurdî*, Zankoya Selaheddîn, Kolêja Edebê, Çapxaneya Selaheddîn, Hewlêr, 167.

³⁸ Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancî Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Çapa Yekemîn, Bexda, 419.

³⁹ Mehmud Fethulla Ehmed (1988), *Kar Awawkirdin Le Kurdî Da*, Nameya Mastirê, Kolêja Edebê Zankoya Selaheddîn, Hewlêr, 146.

⁴⁰ Wirya 'Umer Emîn (2004), *Asoyekî Tirî Zimanewanî*, Çapxaneya Dezgay Aras, Hewlêr, 132.

⁴¹ 'Ebdulwahîd Muşîr Dizeyî (2014), *Rêzimanî Kurdî Wuşesazî û Ristesazî*, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 82.

⁴² 'Ewrehmanî Hacî Marif (2014), *Rêzimanî Kurdî, Bergî Yekem, (Wuşesazî), Beşa Duyemîn (Cînav)*, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 132.

⁴³ Nerîman 'Ebullâ Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî*, Çapa Heftemîn, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 144.

⁴⁴ Lîjneyek ji Wezaretî Perwerde (2016), *Ziman û Edebî Kurdî, Pola Yazdehemî Amadeyî, Bi Rêweberayeti Giştî Program û Çapemenîyekan*, Hewlêr, 75- 76.

Lîjneyek Le Wezaretî Perwerde di şîroveyeke din de wiha bilêv dike: “*An jî hinek peyvin, demê rwîdana karê hevokê diyarî dikin û dibe tamamkerê lêkerî.*”⁴⁵ di wan pêasekirinê jorîn de ev mijar bi layê çend meseleyan hatiye bilêv kirin ku di wan hemî pênaseyan de xalên wekî hev û xalên cûda hatine dîyar kirin. Dîsa li gorî van pênaseyan, ji bo me derdikeve, ku hokerê demkî, demê rwîdana karekî di hevokê de diyarî dike tişteka jib o gotinê hatiye gotin.

Di kirmancîya naverast a zimanê Kurdî da hokerên demkî pêk tên ji: Êsta, sibey, diwênê, pêrê, beyanî, êware, êwarê, emsal, lemewla, ta beyanî, bem ziwane, çend rojêkî dî, lawsawe, nîwero, henûke, destbecê, par, mangî dahatû, wa, mangêkî tir, hefteyekî tir, diwayî, diwatir, le paşan, şewê, lem rojane, caran, pêrar, le mêje, par na pêrar, demêke, zistanê, beharê, payîzê, hawînê, çêstengaw, le zuwewe, le seretawe, lemewpêş, lemewpaş, dûsbey, şemme, bestirpêrê, payîzî par, şewanî hawîn, şewanî zistan, salî dahatû, beyanî beharan, sibeynê zû... hwd.

Weke amaje pê hate kirin, hebûna hokerê di ferhengî da bi wateya habûna lihevbûna ango bi aliyê sîntaksî û nîşaneyê ferhengê an jî formekê ferhengê digehîne hev. Ji vê ve jî dibe ew formên di ferhengan de nîşaneyê hokerê têdene, bi sedema hevoksazî û bilêvkirinê hoker pê bihête dan, navê demi hawîn, zivistan, şemmî, dûşemm, êvarî, nîvro, niha... hwd, mîna navên din ên zimanê Kurdî di lihevhatina argomêntekanî herwekî di van çend hevokên jêrî zelal dibe.

Mînak

A- *Newzad nemamekey **naşt**.*

B- *Azad kitêb **dexwênêtewe**.*⁴⁶

Di van mînakan de morfîmên /- t/ û / de -/ îfadeya tafeka diyarnekirî a dema bihûrî û dema bê ye. Di (B) da bi rêya demî ve tafên diyarnekirî destnîşan dibin. Ji bo vê jî demên bihûrî girêdayî tafên demê bihûrî û yên demê bê jî girêdayî tafên demê bihûrî û yên demê bê jî girêdayî tafên demê bê dibin.

Mînak

⁴⁵ Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde (2017), *Ziman û Edebî Kurdî Polî Heştêmî Binerretî*, Çapa Dehemîn, Berrêweberayê Giştî Program û Çapemenîyekan, Hewlêr, 91.

⁴⁶ ‘Ebdulcebar Mistefa Me’rûf û Karwan ‘Umer Qadir (2011), *Karîgerîyê Ferhengê Le Binyatî Duruste Sîntaksîyekan Da*, Kovara Ustaz, Jimare 186, Silêmanî, 4.

A- Newzad diwênê /pêrê / beserpêrê nemamekey naşt.

B- Azad êsta /sibeynê /dûsbey kitêb dexwênêtewe.

C- Newzad êsta nemamekey naşt.

Di hokerê (niha) jî de ji reftarên espêktan dike û demê tafên giramatîkî nêzik kirîye. Nêz vekirnên din ên tafên lêkerî jî bi rêya forma (her) ve dihêt gehandin, weke di van hevokên jêr de.

Mînak

A- Newzad êsta gerayewe.

B- Newzad her êsta gerayewe.

C- Azad êsta kitêb dexwênêtewe.

D- Azad her êsta kitêb dexwênêtewe.

Xuyaye di hevoksazîyê de bi sedema derketina wan navên demî ve li cêkewtey hokerê de, hoker asa (Advêrbial). Cihê gotinê ye ev cureyên navên demkî şerta li hevhatina wan digel tafa girmatîka lêkerî de nîn e. Çimkî dibe digel tafa demê bihûrî û demê bê de bîn. Eve jî di demekî de ye her yek ji navên demkî diwênê, sibeynê, pêrê, bestirpêrê, par, pêrar... hwd. Berevajîyê wan ên ku di hevokên li jor derdiketin, dem (time) hertim û bi zorê bi taf (tense) ve girêdayî bûye.

Mînak

A- Hawîn werzêkî sale.

B- Min hawînim le werzekanî tir la xoştire.

C- Ême hawîn sefer dekeyn.

D- Ewan dûsemme geranewe.

Li gorî tiyora rewşa rêzmanana navên “di nav dirustiya firêzê de, navên taybetî û cînavên serbixwe” (+ pêdana rewşa rêzmanê) ne. Wate hukim dikin. Herweha “di nav dirûstiya firêzê de, navên giştî” (+ rewş wergirtin) e. Wate dihên hukim kirin jî. Lêbelê hoker berevajîyê wan in. Wate ne hukim dikin û ne têne hukim kirin jî. Ji vê ve dibe bête gotin ku nav nikarin bibin hoker. Îla bi sedema wê cêkewtewe ji navêtiyê derkevin hingê em dikarin bibêjin ku nav jî piştî demekê dibin hoker.

Navên demî di ferhengan de xwedîyê nîşaneyên hokeran nîn e. Bi wê sedemê dikarin di cêkewtey hokerê de derbikevin. Hingê wate nîşanê sedemên rêdanê ye. Ew navên demkî yên bixwe bêy guhertina formên wan nêşaneyên demî hene, guhertina

formê, guhertina wata erkê saz dibe. Navên demkî yên ne girêdayî bi rêya guhertina formên wan, wata 'edet û nerît pê têtê dan.

Mînak

A- Ême hawînan sefer dekeyn.

B- Ewan dûsemman degeranewe.

Hokerê demkî 'edet û nerît digel espêkt û tafa lêkerî de bi zorê li hev dikan, ji ber wê /de -/a espêkt û taf ji bilî nîşaneyên herdemî nîşaneyên 'edet û nerît jî hene.

ji bo demekê diyar kirî û roja piştî îro bkar têtê, heman kok digel navê hejmarî de forma wê ji bo demê bê diguhere, “**dûsbey, sêsbey, çwarsibey**” hevoka jêrî me daye nîşan dayîn.

Ême sibeynê/ dûsbey/ sêsbey/ çwarsibey sefer dekeyn.

Ji bilî van formên li jor nîşaneyê demê bê ji dirûstiya firêz de bi hinek navan têtê dayîn, ku her çend jî bixwe nîşaneyên demî têtê ne. Lêbelê nikarin di cêkewtey hokerê de derbikewin hînge ferqek çêdibe ku ji bo vê jî hevoka jêrî wek mînak di destê me de ye.

Newzad sal/ mang/ hefte/ roj deçêtewe bo zanko.

Herweha ev nav bi naskirî digel morfîmî /-tir/ da dikarin demê bê vebêjin, binêr van dû hevokên jêrî me nîşan daye.

A- Newzad salêkî tir/ mangêkî tir/ hefteyekî tir/ rojêkî tir deçêtewe bo zanko.

B- Nesrîn em sal zankoy tewaw dekat.

Di hevoka (A) an jî weke di (B) de derdikeve, bi rêya diyarkerê (**em**) ve, di dirûstiya firêza diyarkerê (**em sal, em hefteye, emroj, emro**) de demê niha digehîn in, û van navan wate (**sal, mang, hefte, roj**) dibin temamker û bi rêya rengdêr û diyarkeran ve dibin pirojeyên firêz û rê pê têtê dan.

Demên “**diwênê, pêrê, bestirpêrê, par, pêrar...**” li wan demên girêdayî bûn, ku digel tafa demê bihûrî li hevtat, ev nabin kok ji bo afirandina demê bihûrî, belkî di dirûstiya firêzan de ew nîşane pê têtê dan, ku bi rêya wan peyvên jor nayê gehandin.

Weke hatîye gotin navên demî “**sal, mang, hefte, roj**” bi tenê nabin hoker, ev di dirûstiya firêza bendik de bi sedema diyarkerê (pêşî) ve ye, nîşaneyê demê bihûrîyê pê tê dayîn û di cêkewteya hokerê de derdikevin. Wek mînak gava em çend mînakên bidin:

Mînak

1- Ewan sal/mang, heftey pêşû xanuwekeyan tewaw bûwe.

2- A- Azad dû hefte /roj/mang/sal lemewpêş gerayewe bo Kurdistan.

B- Newzad salî par/ parna pêrar jinni hêna.

Di hevoka (1) ji bilî wan jî bi rêya firêz û vegotinên “**salî par, dû roj / sal / hefte / mang, le mewpêş, heftey rabirdû, parnapêrar...**” nîşaneyê demê bihûrî bi derxerê wan dihê dayîn, bi wê sedemê jî dikarin di cêkewteya hokerê de derbikevin, di hevoka (2) de dihête ezmûn kirin.

Hurdbûn wê çendê derdixin, ku hebûna nîşaneyê hokerê demî di katîgorîya ferhengî û hevoksazîyan de, weha diket di cêkewteya hokerê de rê pê bête dayîn, wate nîşane û cêkewteya hovoksazî afirênerên wan hokeran in, ku di ferhengên zimanî de nîne, hevoksazî û rewşa rêzmanê astengî di derketina katîgora navan, weke hate gotin jî derketina navî di wê cêkewteyê de bi wateya hindê tê, ku ji navêtiyê ketîne û yek jî nîne ji argomêntên lêkerî.

Dibe bi sedema pêdana nîşaneyê demî bi koma nivjên navî, derfeta bikaranîne weke hokerê jê re çê be, navên “**pêrê, mindalî, ciwanî, gencî, lawî...**”. Ji ber ku nîşaneyê hokerê demkî têde nîne, nikarin cêkewteyên hokerê tijû veken, binêre van hevokên li jêrî hatiye rawe kirin.

Mînak

1-A- Ême be mindalî ew karaneman dekird.

B- Ew pîrî mulkekanî le destda.

2-A- Katî pîrî/mindalî/lawî/gencî.

B- Ême katî mindalî ew karaneman dekird.

C- Ew katî pîrî mulkekanî le destda.

Binêre (1) weke di (2) de xuyaye, dişêtin wan navan ji alfyê peyva demî ve bi dirûstîya bendika hevoksazîyê nîşaneya hokerê pê bihête dan, hebûna nîşaneya hokerê di firêza bendika (2 A) de, derfet ji bo derketina wan di cêkewta hokerê vedike, binêre hevoka (2- B C) û digel (1) hevberî bike.

Mînakên jor ew yek derxist, ku hokerê demkî, demê rwîdana karekî derdixe, wate zelal kirin û amaje pê kirina tafa lêkerî ye, firêza lêkerî di zimanê Kurdî da projeya koka lêkeran in, ji ber ku koka wan taf têde nîne.

Weke berê me amaje pê kir, hokerê demkî ew hoker e ku demê rwîdana karê hevokê derdixe.⁴⁷

Hokerê demkî weha nîşan dide, ku dibe temamkerê hevokê, çî demê berê be an jî demê bê an jî xwastek.

Wate hokerê demkî demê rwîdana lêkerî diyarî dike, rola espêktê dibînin.

*Beyanî dêynewe. (Xala destpêkirina demê bûyerê).

*Dû roje projeye tewaw bûwe. (Dawiya demê amaje dike).⁴⁸

Wate bi wan hokeran tête gotin, ku demê rwîdana karekî desnîşan diken û tilyê ji bo demê bi cî anîna karekî dikişîne.⁴⁹

1.3.2. Hokerên Cihî

Di zimanê Kurdî de komek pênase ji bo hokerê cihî hatîne kirin, li vir de emê hinek ji wan pênaseyan bînin pêşçav û em ê nîşan bidîn û şiroveya wan jî em ê bikînin:

Tofiq Wehbî, “*Ew cih in, ku navnîşanê cihê rwîdana lêkerî bixwe re heldigirin*”⁵⁰

A.K. Rudnif “*Wateya cihê rwîdanê û rêya rwîdanê dide.*”⁵¹

⁴⁷ Lijneyek ji Wezaretê Perwerde (2016), *Ziman û Edebî Kurdî, Pola Yazdehemî Amadeyî, Bi Rêweberayeti Giştî Program û Çapemenîyekan*, Hewlêr, 75-76.

⁴⁸ ‘Ebdulwahîd Muşîr Dizeyî (2014), *Rêzimanî Kurdî Wuşesazî û Ristesazî*, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 82.

⁴⁹ ‘Ewrehman Hacî Marif (2014), *Rêzimanî Kurdî, Bergî Yekem (Wuşesazî), Beşa Duyemîn (Cînav)*, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 132.

⁵⁰ Tofiq Wehbî (1929), *Destûrî Zimanî Kurdî*, Çapa Yekemîn, Çapxaneya Necah, Bexda, 24.

⁵¹ A.K. Rudnif (1958), *Sîntakîs Ristey Sade*, Mosko, 158.

⁵² Kerîmî Eyyubî û Semîr Nova, (1968), *Diyalêktî Kurdî Mukrî*, Lênîngrad, 135-136.

Kerîmî Eyyubî û Semîr Nova, “*Têgehek, ku taybetmendiya edvêrbê tê de be, nev di haletekê rasterast û ne rasterast digel prîpozîşin û post pozîşin, an jî bêy heval pêk tîne.*”⁵²

Nesrîn Fexrî û Kurdistan Mukiryani, “*Cihê rwîdana wê rwîdanê dide nîşandan.*”⁵³ Di wan pênaseyan de rwîdan di nava têgihên hevoksaziyê de hatiye destnîşan kirin û bi wî şiklî jî hatiye pênase kirin.

Sadiq Behaeddîn Amêdî, “*Cihê rwîdana lêkerî an jî tevgera lêkerî destnîşan dike.*”⁵⁴

Mehmud Fethulla Ehmed “*roleka diyar ya hey û cihê rwîdana karî nîşan dide.*”⁵⁵

Ewrehmanî Hacî Marif, “*Cihê rwîdana karî diyarî dike.*”⁵⁶

Aso Germiyani, “*Ew hoker e, ku behsa cihekî dike, bûyer têde qewimî be.*”⁵⁷

Nurî 'Elî Emîn, “*Ew hoker e, ku cihê rwîdana lêkerî heldigire.*”⁵⁸

Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw, “*Bi wan hokeran tê gotin, ku cihê rwîdana lêkerî destnîşan dike.*”⁵⁹ Di wan hemî pênaseyan de hoker bi awayeke zanistî û li gor zimannasîya kurdî hatiye pênase kirin. Ferqa di navbera wan de jî li gor her nivîskarî derketiye hole.

Li gor Lîjneyek le wezaretî perwerde, “*Ew hoker e, ku cihê rwîdana lêkerê hevokê amaje dike û derdixe.*”⁶⁰

⁵³ Nesrîn Fexrî û Kurdistan Mukiryani (1982), *Rêzimanî Kurdî Polî Yekemîn Beşa Zimanî Kurdî*, Zankoya Selaheddîn, Kolêja Edebê, Çapxaneya Selaheddîn, Hewlêr, 169.

⁵⁴ Sadiq Behaeddîn Amêdî, (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancî Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Çapa Yekemîn, Bexda, 418.

⁵⁵ Mehmud Fethulla Ehmed (1988), *Kar Awawkirdin Le Kurdî Da*, Nameya Mastirê, Kolêja Edebê Zankoya Selaheddîn, Hewlêr, 144.

⁵⁶ Ewrehmanî Hacî Marif (1998), *Rêzimanî Kurdî, Bergî Yekem (Wuşesazî), Beşa Çarem (Jimare û Awelkirdar), Dezgay Rewşenbîrî û Belawkirdinewey Kurdî*, Bexda, 147.

⁵⁷ Aso Germiyani (2001), *Rêzimanî Kurdî Bo Qonaxekani Seretayî û Nawendî Le Derewey Welat*, Swed, 123.

⁵⁸ Nurî 'Elî Emîn (2012), *Rêzimanî Kurdî*, Çapa Duyemîn, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 192.

⁵⁹ Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw, (2015), *Rêzimanî Kurdî*, Çapa Heftemîn, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 117.

⁶⁰ Lîjneyek ji Wezaretî Perwerde (2016), *Ziman û Edebî Kurdî, Pola Yazdehemî Amadeyî, Bi Rêweberayeti Giştî Program û Çapemenîyekan*, Hewlêr, 80.

Di cihekê din de Lêjneyek ji Wezareta Perwerde, “*Peyveke an jî hinek peyvin cihê rwîdana karê hevokê derdixê û dibe temamkerê wî karî.*”⁶¹ Wate weke derdikeve hokerê cihî, peyveke cihê rwîdana wî karî nîşan dide.

Di kirmancîya naverast a zimanê Kurdî de hokerên cihî ji wan çend xalan pêk tên: Le ser, jêr, xwar, bin, kin, paş, pêş, le bin, le jêr, le serewe, naw, nêw, çep, tenîşt, lêre, lewê, le binewe, benaw, lekin, le mal, le serban, berdem, nizîk, dûr, la, le xwarewe, der, ber, ser, le xwar, le pesewa, le nawewe, le rastewe, le çepewe, bo lay serewe, bo lay rast, bo lay çep, lewêwe, ta êre, ta ewê, le hemûla, le hîş kwê, le jêr, pal, piştawpişt, paşewpaş, berew diwa, serewxwar, nawpaş,.... hwd.

Amarên hay wê yekê didin dest ku hokerê cihî di zimanê Kurdî de nîn e. Berê amaje bi wê hatiye dan, ku şerta nîşane û cêkewteyê ji bo hebûn û berfireh kirina hokerê dibe bingeheke rêzimanî.

Morfîmên “**hel, da, ro, ra**” di formên morfolojîyên “**helçûn, daçûn, roçûn, rakirdin**” de beşeka wan karên bi lêksêmbûyîne, bi sedema wan morfîmên nîşaneyên hokerê (+ hêl) hene, bi pêşbendika hokerê navê wan tê. Ji bilî nîşaneyê hêlê, weke van mînakên li jêrî têtê bikar anîn.

A- Şîreke **helçû**. Xêz ji bo serî ye.

B- Zewyeke **daçû**. Xêz ji bo jêrî ye.

C- Aweke be zewîda **roçû**. Xêz ji bo jêrî ye.

D- Azad be pele **raykird**. Xêz terîbî (asoyî) ye.”⁶²

Di van mînakên jor de derdikeve hole ku wan paşbendika nîşaneyên:-

(+ jor), (+ jêr), (+ terîbî) hene.

Eger jî pêşbendikên hokerî, morfîmên ferhengî ne, lêbelê beşeka ne serbixwe û pê ve girêdayî wan formanin ku li mînakên jorî hatin ezmûn kirin. Ev e jî ramana wê yekê dide ku yên xwediyê nîşaneyên hokeran nin û di cêkewteyeka neguhertî de diqewimin û weke hokerên din cihên xwe naguherînin.

⁶¹ Lijneyek ji Wezaret Perwerde (2017), *Ziman û Edebî Kurdî Polî Heştêmî Binerretî*, Çapa Dehemîn, Berrêweberayet Giştî Program û Çapemenîyekan, Hewlêr, 91.

⁶² ‘Ebdulcebar Mistefa Me’rûf û Karwan ‘Umer Qadir (2011), “Karîgerîyê Ferheng Le Binyatî Duruste Sîntaksîyekan Da”, *Kovara Ustaz*, Jimare 186, Silêmanî, 20.

Peyvên ji cureya “**ser, jêr, la, beranber, pêş, paş...**”, ku navên cihan in, herçend xwediyê nîşaneyên ferhengî yên cihî ne.

Wate yên xwediyê nîşaneyan in, lêbelê cêkewte û “Spec” a hokeran tije venakin heta dibin bi hoker. Binêre van mînakên jêrî.

1-A- Newzad **jêr** danîştuwe.

B- Newzad **beranber** xanuwekey dirustkirduwe.

2-A- Min **mêzeke** xwardinekem dana.

B- Newzad **dûkaneke** mîwekey kirî.

3-A- Min **ser mêzeke** xwardinekem dana.

B- Newzad **ser dîwareke** danîştuwe.

Di van mînakên jorî de xuya dibin ku hebûna nîşaneyên cihî di wan peyvan de weha kirîye: Ger bikaribin nîşaneyên hokerê bidin bi wan firêzên navî û diyarkerên ku xwe di ferhengan de weke cih nadin naskirin. Eger binêrine peyv û firêzên (**dîwareke, dareke, dukaneke,**) di (2) da, ev yeke tête zanîn, ku (A) evan bi bê rewş dibine (-firêz). (B) Bi sedema tunebûna nîşaneyên hokera cihî, bi lêvkirina hokerê nîn e. Navên cihî yên “**ser, jêr, la, beranber, pêş, paş...**” nîşaneyên (+cihî) bi wan firêzên diyarkirinê yên jor didin. Wate ji na cihî ve diken bi yên cihî, bi vê çendê jî ji şerta bûn bi piştta dukanê. Lêbelê weke di (3) da dihête ezmûn kirin, şerta tunebûna rewşê weha dike. Ku nîşane nebûte sedema derketinê di cêkewteya hokerê cihî da.

Veneşkaneveya (**ser mêzeke**) di (3-A) da ji bo wê vedigere, ku koka lêkera bihurî tenê yek firêz bi rewşa rêzmanîya bireserê ve hukim dike, çimkî tenê desthilat bi ser yek tamamkerê de heye, ku li gorî yasaya komên nivij diyarîkirinê di ferhengan de diyarî dike.

Ji aliyekê din ve rê nedana “**ser dîwareke**” di (B) da ewe, ku koka lêkera bihurî hukmê tu tamamkerê nake û li gorî yasaya komên nivij diyarî kirinê ve jî di ferhengan tu polên nivij diyarî kirinê dawa neke.

Navên giştî yên cihî weke “**şar, ladê...**”, navên giştî yên taybet ên cihî jî weke “**Silêmanî, Hewlêr, Koye...**” ev ji wan navan in, ku dikarin bibin yek ji

argomêntên dawa kirî yên lêkerî, eve jî wê digehîne, ku xwedîyê rewşa rêzmanê yê bikerî û bireserîyê bîn.

Mînak

1-A- **Hewlêr** şarêkî xoşe.

B- Min **Hewlêrim** dîwe.

C- **Ladê** serçawey kiştukale.

D- Min **ladêm** dîwe.

Binêre van hevokên jêrî dide nîşan.

2-A Newzad **Hewlêr** xanûyekî kirîwe.

B- Azad **ladê** le dayk buwe.

Di hevoka (2) jî da ev tê gotin ku eger jî navên giştî û taybetî yên cihan jî xwedîyê nîşaneyên cihî ne, di demekî de bi hman awayîya navên cihî, nikarin bibin hoker.

Dihête texmîn kirin peyvên “**êre, ewê**”, ku vebêjên cihî ne; cîgir û amajepêkirê navên giştî û taybetî yên cihî bin, ew peyv ser bi komên nivjê navane û amajeya nêz û dûrîyê ji bo cihî têde heye “**êre**: Ji bo nêz, **ewê**: Ji bo dûr e”, bi vê yekê jî dikarin, heman wan cêkewteya pirve bikin, ku navên giştî û taybetî yên cihî pirve dikirin.

Bi vê çendê jî (A) rêdana hevoksazîyê ji bo wan firêzên rê pê nedayî zamin dike û di nav firêza lêkerî da weke firêzeke serbar vedişkîne ve ye. Ji bo vê çendê çend mînakên jêrî hene.

Mînak

1-A- Newzad le **êre/ewê** le dayk buwe.

B- Azad le **êre/ewê** le dayk buwe.

C- Newzad le **Hewlêr** xanûyekî kirîwe.

D- Azad le **ladê** le dayk buwe.

2-A- Min **leser mêzeke** xwardinekem dana.

B- Newzad leser dîwareke danîştuwe.

3-A- Min xanuwekem le Silêmanî dirustkirduwe.

B- Min le Silêmanî xanuwekem dirustkirduwe.

C- Le Silêmanî min xanuwekem dirustkirduwe.

D- Newzad le Silêmanî le Cwarbax le dayk buwe.

Eger binêrîne hevokên (1) û (2), ku firêza navê (**havîn**) bi bê rewş rê pê nedayîye, çimkî wî lêkerî tenê desthelat bi ser yek tamamkerê de heye, livîn û cî pê guhertina firêzên berhemhatî/edvêrbilê jî serbest dik. Çimkî wê demê dibîte pirojeyeka tamam hukimdar û dikare weke dirustîyeka serbar pê bihête girêdan. Wekî din (3-D) jî derdikeve, di demê hebûna dû firêzên pêşnav ên cihî jî da, bi taybetî ji bo hûrvekrinê û destnîşankirina cihê yekem, bi heman awayê firêza pêşnav a yekem bi giranî xistine serve dihê girêdan, nek “Spec” a firêza lêkerî da.

Pêşnav / le-/ û / be-/ argument – dawakarek e ji alîyê watayê ve hinek ji wan (NP/DP)an heldiwêrîne, ew jî navên giştî û taybetîyên cihî ne, wate nîşaneyên cihî bi tamamkerên xwe nadin, binêre van hevokên jêrî:

Mînak

1-A- Şîr le mast dirustdekirêt.

B- Masî be aw dejî. (na cihî).

C- Ême malman le Silêmanîye.

D- Ême malman le Silêmanî daye.

E- Ême le Silêmanîyewe hatûyn.

2-A- Otombêleke be Hewlêr têperî.

B- Ême le Silêmanî hatûyn.

C- Otombêleke be Hewlêrda têperî.

D- Ême le Silêmanîyewe hatûyn.

3-A- Malman le tenîst xwêndingekeye.

B- Malman (le) tenîst xwêndingekeye.

C- Zanko le beramber girdî cogeye.

D- Zanko (le) beramber girdî cogeye.

Li vir de eger binêrîne van mînakên jorî, wate ev pêşnav dişên digel tişt binêre (1- A, B) an jî cih û rê jî hev bigirin.

Eve jî wê digehîne, ku pêşnava /le/ û /be/ ji alîyê formê ve xweru nîne û digel hinek paşgirên hevoksazîyê, weke /-ewe/, /-da/ formên ne xweru yên pêşnavan nîşan diden, ew paşgirên hokerê yên hevoksazîyê ji alîyê wî pêşnavî ve dihêtin û bi hev re wan nîşaneyên hokerê bi firêzên navî diden, ku ew pêşnav bi zorê ye, hebûna wan paşgiran jî ji bo wateyê bi zorê ne, çimkî li cî birina wan dibe sedemê guhertina wateyê, pîrr caran jî li cî birin û nebûna wan gumana dirusteyî û wateyê tine ber çav û tê zanîn.

Pêşnava /bo/ yek ji wan pêşnavên forim xweru yên navê cihî dike mebesta nêrînê, wate ew pêşnav, bêyî mebest û cihî sekinînê bi navê cihî nîne, belkî tenê nîşaneyê mebestê dide û ew jî radigehîne.

Mînak

Newzad bo şeqlawe diçit. Ê Azad bo mîwe kirîn deçêt. Ê Newzad bo bazar deçêt.

Da derketîye, di hevoka yekem û sêyem da, navê cihî “**Şeqlawe û bazar**” bixwe nîşaneyê cihî heye û bi sedema wî pêşnavî rê dana hevoksazîyê ji bo çê bûye û yên bûye hokerên cihî, li ber hindê “**mîwe kirîn**” di hevoka sêyê da amaje nîne ji bo cihî, belkî ramana tiştî digehîne, ji ber hindê jî derketineka hevoksazî ya bi cureyê “**bo mîwe kirîn**” nebûye hokerê cihî. Ev şirovekirina jorî jî teqezê li ser nebûna nîşaneyê cihî di pêşnava /bo/ da vediket.

Wateya hokerê cihî ew hoker e, ku cihê rwîdana lêkerê hevokê dide nîşandan û derdixe.⁶³ Bersiva peyva pirsê “**le kwê, le kênderê, bo kwê...hwd**”.

Binêrîn van mînakên jêrî hatiye rawe kirin.

“Le jêr asmanî şîna
Le pal lûtkey befrîna

⁶³ Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde (2016), *Ziman û Edebî Kurdî, Pola Yazdehemî Amadeyî, Bi Rêweberayeti Giştî Program û Çapemenîyekan*, Hewlêr, 79- 80.

*Kurdistan geram
Dolaw dol pêwam*”⁶⁴
“Coşîş û tabe **lenêw** dîdeyî giryanimda
Çi tenûrêke le tendûreyî tofanimda”⁶⁵

“**Le jêr** zerdey xoretawa
Benaw çîmenî gwê awa”⁶⁶

“Mîrî padşahî mûyek **linik** melayê
Nadem be mulkî 'alem yek zereyek 'înayet”⁶⁷

Di mînaka (1) peyvên (**le jêr**), (**le pal**) cihê karî derdixin, ji ber hindê dibine hokerê cihî û dibine temamkerê lêkeran.

Di mînaka (2) da peyva (**lenêw**) cihê karê hevokê derdixe, ji ber hindê hokerê cihî ye û temamkerê karê hevokê ye.

Di mînaka (3) da peyva (**le jêr**), (**le pal**) cihê rwîdana karî derdixen, ji ber hindê hokerê cihî ne û dibine temamkerê karê hevokê.

Di mînaka (4) da peyva (**li nik**) cihê rwîdana karê hevokê derdixe û dibîte hokerê cihî.

“Qesdî yarîte **lekin** bezmî reqîb
Yarî mine xot meke bedxo be ebes”⁶⁸

Di mînaka (5) da peyva (**lekin**) hokerê cihî ye û dibîte temamkerê karê hevokê.

Hinek caran pêşbendik digel navê pişt xwe, ku erkê bireserê rasterastê ye, bi hev re dibin hokerê cihî, çimkî ramana arasteya cihî digehînin.

Mînak

*Firoke **be asmanda** desûrêtewe.

(*Be asmanda*) hokerê cihî ye

*Azad **bo zanko** royîşt.

⁶⁴ Goran, (1980), *Dîwana Goran*, Çapxaneya Korî Zanyarî Îraq, Bexda, 28.

⁶⁵ Nalî, (1963), *Dîwanî Nalî*, Çapa Duyemîn, Çapxaneya Sîhir, Tehran, 89.

⁶⁶ Goran, (1980), *Dîwana Goran*, 11.

⁶⁷ Melayê Cizîrî, (1982), *Dîwanî Melayê Cizîrî*, Çapa Yekemîn, Çapxaneya Suruş, Tehran, 39.

⁶⁸ Nalî, (1963), *Dîwanî Nalî*, Çapa Duyemîn, Çapxaneya Sîhir, Tehran, 156.

(Bo zanko) hokerê cihî ye.⁶⁹

Di zimanê Kurdî da pirr caran cih bi demî dihête destnîşan kirin.

Mînak

*Paş se'atêkî tir degeyne latan.

*Malyan dû deqîqe lêre dûre.⁷⁰

Hokerê cihî tiştêkî derbareyê cihî an jî reftarê lêkerî (**karî**) zelal dike.

Mînak

*Lêre - lepêşewe – berew lûtke.⁷¹

Şiwaneke (lejêr) dar erxewaneke nûstuwe.

Şaxewan (leser) lûtkey şaxeke danîştuwe.

Di van hevokan de (**jêr**) û (**ser**) şiroveya van cihan dikin ku (**Şiwan**) û (**Şaxewan**) lê nivistîne û rûniştîne.

Dibêjîn (lekwê) nûstuwe?

Şaxewan (lekwê) danîştuwe?

Wate (lekwê) bi hokera cihî bersivê vedide.⁷²

Mînak

*Diwênê sard bû.

Di hevoka jor da, ji bo ku sînorekî ji bo tafa rwîdana karê hevokê bidanîn, peyva (**diwênê**) me bikaranî. Heta rwîdana wî karî û wateya wî jî bi temamî aşkera

⁶⁹ Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî*, Çapa Heftemîn, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 113.

⁷⁰ 'Ebdulwahîd Muşîr Dizeyî, (2013), *Ristesazî Ronankarî Û Gwêzanewe*, Çapa Yekemîn, Çapxaneya Hêvî, Hewlêr, 77.

⁷¹ Kemal Mirawdelî (2007), *Ferhengî Rêzimanî Kurdî*, Çapa Yekemîn, Le Belawkiryekani Melbendî Kordolocî, Silêmanî, 118.

⁷² Nesrîn Fexrî û Kurdistan Mukiryani (1982), *Rêzimanî Kurdî Polî Yekemîn Beşa Zimanî Kurdî*, Çapxaneya Selaheddîn, Hewlêr, 169-170.

bikîn. Ango peyva (**diwênê**) ew peyve ye, ku dibêjinê hoker, çimkî wî demî şirove dike ku lêkera (**bû**) yê (**sardebû**) yî têde rwîdaye.

An jî di vê hevokê da dema dibêjin.

Beharekeman **zû beserçû.*

Di vir da, me divêt astê wê temambûnê derbixîn hole ku bizanibîn kengî ye. Sedem vê hindê jî peyva (**zû**) me ji bo mînakê bikaranî ye. Li anîna mebesta me da di sînordanîna wateya wê lêkerê da.

Herweha wiha tê gotin.

*Kewekan **leser** çiyakan dexwênin.*

Li vir de jî herwekî wan hevokên din, bi wî şeweyî cihê rwîdana wî karî me derxistîye û sînorek me ji bo wateya wê danaye. Herwekî wan hevokên din, peyva (**leser**), ew peyv e, ku dibêjinê (hoker), çimkî wî cihî diyarî dike ku karê (**dexwênin**) ê tê da rwîdaye... hwd.⁷³

1.3.3. Hokerên Çawanîyê (Awelkarî Çonyetî)

Di zimanê Kurdî da komek ji pênaseyan ji bo hokerê çawanîyê yên hatîne kirin, li vir da hinek ji wan pênaseyan em ê bînin ber çavan.

Kerîmî Eyyubî û Sermîr Nova, “*ji edvêrb û peyva hevdu danî ya edvêrbê saz dibe.*”⁷⁴

Lîjney Ziman û Zanistekani Korî Zanyarî Kurd “*Hinek peyvên firêzin, çawatîya karî digehînin.*”⁷⁵

Nesrîn Fexrî û Kurdistan Mukiryani “*Ev hokerên wesfî şiroveya hal û ehwalê xwedîyê wî karî zela vedike, rewşa wî kesî derdixet.*”⁷⁶

Sadiq Behaeddîn Amêdî “*Çawatîya rwîdana karî derdixet.*”⁷⁷

⁷³ Aso Germiyani (2001), *Rêzimanî Kurdî Bo Qonaxekani Seretayî û Nawendî Le Dereweyî Welat*, Swed, 124- 125.

⁷⁴ Kerîmî Eyyubî û Semîr Nova (1968), *Diyalêktî Kurdî Mukrî*, Leningrad, 135- 136.

⁷⁵ Lîjneyek Ziman û Zanistekani, (1976), *Rêzimanî Axawtinî Kurdî*, Çapxaneya Korî Zanyarî Kurd, Bexda, 284.

⁷⁶ Nesrîn Fexrî û Kurdistan Mukiryani (1982), *Rêzimanî Kurdî Polî Yekemîn Beşa Zimanî Kurdî*, Zankoya Selaheddîn, Kolêja Edebê, Çapxaneya Selaheddîn, Hewlêr, 171.

⁷⁷ Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancî Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Çapa Yekemîn, Bexda, 418.

Aso Germiyanî “*Ew hoker e, ku çawatiya rwîdana lêkerê hevokê derdixê û dibîte temamkerê wateya wî lêkerî.*”⁷⁸

Nî'met 'Elî Saye “*Ew hoker e, ku wesfa çawatiya rwîdana karekî dike.*”⁷⁹

Lîjneyek Le Wezaretî Perwerde “*Peyvek an jî girêyeka awelkarê ye, çawatiya rwîdana lêkerê hevokê derdixê.*”⁸⁰

Ehmed Kake Mem “*Ev cureyên hokera haletê biker an jî bireser, an jî herdukan li demê encamdana lêkerî nîşan dide*”⁸¹

Ewrehmanî Hacî Marif “*Hokerê çawanîyê wateya çawatiya rwîdanê an jî delalet nîşan didet.*”⁸²

Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw “*Bi wan hokeran tê gotin, ku çawatiya rwîdana wî karî destnîşan dike.*”⁸³

Li cihekî din da Lîjneyek Le Wezaretî Perwerde “*Ew hoker e, ku çawatiya rwîdana karê hevokê nîşan dide û wesfa wî hevokê dike.*”⁸⁴

Lîjneyek Le Wezaretî Perwerde “*Peyveke an jî hinek peyvin çawanîya rwîdana karê hevokê derdixê û dibîte temamkerê wî karî.*”⁸⁵

Di wan hemî pênaseyan de wekî tê dîtî hokera çawanîyê li gor gelek zimanzanan hatiye rawe kirin. Di wan raweyan de wekî tê dîtî bingeh yek e. lê di hin hurgiliyan de cudahî hebe jî wekheviya pênasekirina mijarê li ser yek xalê radiwest e.

Weke derdikeve, hokerê çawanîyê, peyveke çawanîya rwîdana wî karî destnîşan dike.

Di kirmancîya naverast a zimanê Kurdî da hokerên çawanîyê ji wan xêzan pêk tên: “Ciwan, baş, çak, xêra, bexêrayî, bebaşî, şêrane, azayane, merdane, jîrane, begiryan, berakirdin, şêtane, begermî, besardî, bebaşî, bexoşî, benaxoşî, betureyî, demawdem, piştawpişt, bedirustî, wird, xêra, hêdî, bepele, xirap, besiwarî, begurcî,

⁷⁸ Aso Germiyanî (2001), *Rêzimanî Kurdî*, 126.

⁷⁹ Nî'met 'Elî Saye (2004), *Rêzimanî Kurdî Zarî Kelhorî*, Çapxaneya Şivan, Silêmanî, 68.

⁸⁰ Lîjneyek ji Wezaretî Perwerde (2007), *Ziman û Edebî Kurdî*, Polî Duwemî Nawendî, Çapxaneya Aram, Bexda, 83-84.

⁸¹ Ehmed Kake Mem (2003), *Gulbihare - Kitêbî 3*, Bergê Duyemîn, Çapa Duyemîn, Çapxaneya Mukiryani, Hewlêr, 284.

⁸² 'Ewrehmanî Hacî Marif (2014), *Rêzimanî Kurdî, Bergî Yekem (Wuşesazî), Beşa Duyemîn (Cînav)*, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 126.

⁸³ Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî*, Çapa Heftemîn, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 113.

⁸⁴ Lîjneyek ji Wezaretî Perwerde (2016), *Ziman û Edebî Kurdî, Pola Yazdehemî Amadeyî, Bi Rêweberayeti Giştî Program û Çapemenîyekan*, Hewlêr, 83.

⁸⁵ Lîjneyek ji Wezaretî Perwerde (2017), *Ziman û Edebî Kurdî Polî Heştêmî Binerretî*, Çapa Dehemîn, Berêweberayeti Giştî Program û Çapemenîyekan, Hewlêr, 91.

begur, Leserxo Leserla, Leser sing, Leser pişt, Nawbenaw, Şaxewşax, aram, hêmin, tund, bejîrî, beçakî, benazdarî, behêminî, çak, bedilreqî, bemele, bepele pel, rast û rast, pêkewe, încâ, haje haj, xure xur, bole bol, sebir sebire, beherzan, bekurtî, berêzewe, bekomel, becûte, bepêkenîn, beroyştin, benermî, bereqî, bedanîştin, bepêwe...hwd.”

Mînak

*Azad xêra royîşt.

*Ehmed ciwan dexwênê.

Di ferhenga zimanê Kurdî de, formekê taybet bi hokerê çawanîyê nîn e. Eve jî wê yekê digehîne ku hokerê çawanîyê ji derveyê ferheng bi rêya forim û alavên din ve diyar dibe û têgeha çawanîyê bi qonaxên morfolojî dihê berceste kirin û di cêkewteyên hevoksazîyê de bilêvkirina hokerê pê tê dayîn, ji ber hindê di vê cureyê hokerê de jî cêkewte nîşane dikirêt bi belge ji bo berhemanîn û derxistina reftareka wateyî a lêkeran.

Çawanî yek ji wan têgehan e, ku di nav ferhenga zimanê Kurdî da ji bo koma nivjên rengdêran forim ji bo hatîye dariştin, nek hoker, ji ber hindê texmîn û pêşbînîya hindê dihê kirin, ku ev têgeh û naveroke, di rêzmanê de berceste bibe.

Nîşane û cêkewteya hevoksazîyê dû bingeh hebûn û rêpêderên hokeran in, çimkî dibe hebûna nîşaneyê di ferhengê da tenê pêwîstîya temsîl kirina wê nîşaneyê hebe di formekê hevoksazîyê de, bi vê yekê jî hevoksazîyê rûyê derveyê pêdana pêzanînên ferhengî ye, an jî rûyê guherî yê pêzanînên ferhengî ye û hebûna nîşaneyê çawanîyê di formê rengdêrê de, bûye sedemê bidestketina formekê nîşanedar, eger jî di çarçoveya sînorê rengdêrekî de bibe.

Herçend jî komên nivjên ferhengî pêzanînên wateyî û rêzmanî têde ye, lêbelê cêkewte jî diyarkerê bilêvkirina hevoksazî yên cuda ye. Dibe cêkewte kêmasîyên formî yên ferhengî pê bihêne pirve kirin. Ango naverok û erkên pirrtir bikevine ser wan komên nivja, ku bixwe xwedîyên nav û navnîşanên din ên ferhengî ne. Komek çarçoveyên wateyî yên ferhengî bi rêya komên nivjî yên rengdêran ve formên wan yên hatîne berceste kirin. Rengdêr li cureyên “**ciwan, çak, baş, rast...**” nîşaneyê çawanîyê yê têde û çêkerê pirojeyên firêza xistinepal a rengdêr û rengdêran têde weke serê rêzmanê bilêv diken. Hebûna nîşaneyê çawanîyê di rengdêrê de ew rewş anîye pêş, ku ji nîşanderê sîmayê navan ve, bibe nîşanderê sîmayê lêkeran. Firêzên

lêkeran pirojeyên koka lêkeran in, koka lêkeran jî bê tafîn, eve jî sedema hindê bû, ku hokerên demkî, di cêkewteyeka bê rewş e, bi sedema wê cêkewteyê ve an jî bi sedema morfimekê sifirê ve bûbe bi lêker, wate hoker nîşane û formên ferhengî yê rengdêran ên wergirtîne û di cêkewteya hevoksazîyê a xwe da (hoker) bikar anîne û dibin, binêre van mînakên jêrî hatiye dest nîşan kirin.

1-A- Kiçî ciwan hat.

B- Newzad ciwan yarî kird.

2-A- Newzadî piyaw karekey tewaw kird.

B- Newzad piyawane karekey tewawkird.⁸⁶

Ji alîyekê din ve, divêt amaje bi wê yekê bêt kirin, ku bi sedema hindê ku (VP) yekeyeka (Spec) ê heye, ji ber hindê rêya derketina dû rengdêrên çawanîyê di firêza karî de nahê dan. Ji bona vê jî hûn dikarin wan mînakan bnêrin.

Newzad çak xêra karekey tewaw kird.

Bi sedema taybetîyê û nîşaneyê wateyî ya rengdêrê ve, ku çawanîyê, pêşbînîya derketina rengdêrê di (Spec) a (VP) de hate kirin, li vê çendê ve jî divêt pêşbînîya wê hindê bihête kirin, ku nav nikarin bilêvkirina hokerê çawanîyê pê bihête dayîn, eve jî vedigere: Ji alîyê rêzmanê ve ew nav hukim dikin û dihêne hukim kirin û cêkewteyên rewşdar pîrr ve dikin êkin ji argomêntên dawakirî yê (V) û (V), wate cêkewteyên bi zorê pîrr ve diken. Herweha xwedîyê nîşaneyê hokerê çawanîyê nîne, ji ber hindê di cêkewteyên wan cureyên hokeran de dernakevin.

Mînak

**Newzad piyaw karekey kird.*

Morfolojî weke pêkhateyeka ziman, alavan ji hevokan werdigire. Ji bo sazkirina formên morfolojî yê nû, ku derbirê wateyên nû ye, ji bilî wateyên nû,

⁸⁶ ‘Ebdulcebar Mistefa Me’rûf û Karwan ‘Umer Qadir (2011), *Karîgerîy Ferheng Le Binyatî Duruste Sîntaksîyekan Da*, Kovara Ustaz, Jimare 186, Silêmanî, 30.

morfolojî nîşaneyên nû jî bi formên nû dide, li vir de divêt li wê yekê dest pê bihête kirin.

Mînak

*Newzad piyawane karekey tewawkird.

Weke di vê hevokê derdikeve, morfolojî bi rêya hinek pirs û yasayên weke > nav + ane = rengdêr > we, nîşaneyê çawanîyê bi hinek navên giştî dide, morfolojî çalakîyên hindik ji veguhaztina hokeran de heye, bi wê yekê, ku yaseya > nav + ane = rengdêr > sazkerê rengdêrê, ne hoker, digel hindê jî morfolojî bi rêya yasayekê ji cureyê > rengdêr + ane > ewe hokerê veguhaztî saz dike. Ev yasayê herçend berhemê wê hindik e. Lêbelê derfet ji bo wan rengdêran çê dike, ku bi nîşaneyên çawanîyê ve nabin hoker, binêre van hevokên jêrî daye nîşandayîn.

A- Newzad jîr welamîdayewe.

B- Azad zîrek le babetekey riwanî.

C- Newzad jîrane welamî dayewe.

D- Azad zîrekane le babetekey riwanî.

Ji bilî vê jî yasayeka ji cureyê > nav + asa < dirustîyeka ji şêweyê > şêrasa, piyawasa, jinasa...> saz dibe, ev form li gorî wan yasayên morfolojî ji bo hokerê çawanîyê saz bûyîne û dihête pêşbînî kirin jî, evan e formê morfolojî yê firêzeka pêşnavê ji cureyê > wek şêr, wek piyaw, wek jin < bin.

Ji bilî wan formên veguhaztî, dûbarekirina navekî bi bê yarîde weke “**dû dû, pol pol, kur kur,...**” bi yarîde weke “**polaw pol, kurawkur...**”, an jî “**dû be dû, pol be pol, dê be dê...**” ji bilî hindê ku weke nav jî namînin, nîşaneyê çawanîyê bi wê dirustîyê dide û formekê hevdudanî ji bo hokerê çawanîyê saz dike, weke di van hevokan de derdikeve hole.

A- Qutabîyekan dû dû çûne polewe.

B- Qutabîyekan pol pol hatine derewe.

C- Berêwebereke polaw pol gera.

D- Pareke kuraw kur beşyan dekat.

Di van hevokan de derdikeve ku bi sedema hebûna wan nîşaneyan ve formên hevdundanî dikarin di cêkewteya hokerê çawanîyê derbikevin. Binêre dijberên rê pênedayî di van hevokên jêrî hatiye destnîşan kirin.

A- *Qutabîyekan **dû** çûne polewe.*

B- *Qutabxaneke **pol** hatine derewe.*

C- *Pareke **kur** beşyan dekat.*

Hinekcaran bi rêya dubarevekirina rengdêran (**wird wird, ciwan ciwan**) nîşaneyên zêdetir bi rengdêrên çawanîyê dihête dan û bi wate û naverokeka nû ve cêkewteya hokerê çawanîyê pîrr ve diken.

Li wan hevokan binêre.

A- *Newzad **wird wird** deroyî be rêda.*

B- *Nesrîn **ciwan ciwan** kirasekey şuşt.*

Firêza pêşnavê a sazkerê hinek formên hevoksazîyê, bi astê temsîla (A) ê ve, ku rûberê wateya çawanîyê berhem dihînin, heceyê gotinê ye (-A) a di formê bi lêksêmbûyê jî rengdêra çawanîyê saz dike, binêre “behêz, bepele, berêz, bepêz,..” di mînakên “kurêkî behêz, hewalêkî bepele, kesêkî berêz, ardî bepêz”, dirustey hevoksaz (-A) nodêyeke / girêyeke bi (-V) de tê helwasîn û sîmayê wateya wê jî nîşan dide, binêre van hevokên jêrî binêre.

A- *Newzad **bepêle** nanî xward.*

B- *Newzad **pele** nanî xward.*

Weke di vê hevokê de diyar e, navên nav wê dirusteyê, ku cêkewteya temamkerê pîrrve diken, bêyî hebûn û wergirtina rewşê, weke teva navên din ên derveyî (V) yê, rê pê nayê dan. Ji ber hindê bi rêya wê pêşnavê serê rêzmanê ye, ew proje tê temam kirin û bi wê (-V) yê tê helwasîn, zelalkirinên jor, derbareyê cêkewteya hokerê çawanîyê (yên di ferhengê de rengdêr in) û firêza pêşnavê çawanîyê, divêt wê yekê bilêv bikin an jî pêşbînîya hindê bê kirin, ku di yek (VP) yê da her yek ji wan dû hokeran di heman demî de rê pê bihê dayîn, eve jî ji ber hindê ye ku her yek ji wan di dû cêkewteyên cuda derdikevin, van hevokên jêrî binêre.

A- *Azad **xêra be tasewe** namekey xwêndewe.*

B- *Nesrîn **ciwan berêzewe** pêşwazî lêkirdîn.*

Di van mînakên de ev yek xuya dibe, ku hokerên “**xêra, ciwan**”, di firêzên pêşnavî yên hokerên “**betasewe, berêzewe**”, bi noda (-V) de hatîne helwasîn. Derbareyê her yek ji hokerên demkî û cihî û çawanîyê, ev cêkewte hatîne ezmûn kirin, ku cihê destpêka her yek ji wan, wate cêkewteya hevoksazî ya wan hokeran in, lêbelê divêt ev yek bê gotin hoker digel hebûna cêkewteya serekî û bineretî ya xwe, dikarin li gorî dirusteya pêzanîn û niyaza ramana axivînerî, cîguhertin pê bihête kirin û bi rêya helwasînê ve, di nav dirusteya hevokeka weke “tenha Nesrîn diwênê le nîweroda herzan le bazar kitêbekey kirî” de cêkewteya hevoksazî û bi hev re hatina hokerên demkî, cihî, çawanîyê bihê nîmandin.

Wate weke derdikeve, hokerê çawanîyê ew hoker e, ku çawatîya rwîdana lêkerê hevokê nîşan dide û wesfa lêkerê hevokê dike.⁸⁷ Herwiha bersiva peyva pirsê wek çawa (çon) vedide.

Hokerên çawanîyê de ji bingehê de rengdêrên çawanîyê ne. Di haletekî de dibine hokerê çawanîyê, eger di hevokê de wesfa lêkerî biken, herwekî di van mînakên jêrî derdikevin pêşberê me.

Ciwan *kiçêkî qeşenge....* (Nav)

Rêzan **ciwane**... (Rengdêrê çawanîyê).

Sozan **ciwan** *derwat...* (Hokerê çawanîyê).⁸⁸

1.3.4. Hokerên Hejmarî

Di zimanê Kurdî de komek pênase ji bo hokerên hejmarî yên hatîne kirin. Li vir de hinek ji wan em ê bînin ber çavan.

Nurî 'Elî Emîn, “*Ew cih in, ku miqedarê rwîdana cihekî an jî tîpekê hel diden.*”⁸⁹

Herweha di cihekê din de Nurî 'Elî Emîn, “*Ew hoker e, ku wesfa lêkerî dike û hem jî mîqdara wê jî derdixe.*”⁹⁰

⁸⁷ Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde (2016), *Ziman û Edebî Kurdî, Pola Yazdehemî Amadeyî, Bi Rêweberayeti Giştî Program û Çapemenîyekan*, Hewlêr, 82- 83.

⁸⁸ Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî, Çapa Heftemîn, Çapxaneya Rojhilat*, Hewlêr, 113- 114.

⁸⁹ Nurî 'Elî Emîn (1956), *Qewa'dî Zimanî Kurdî Le (Êrf û Nihu) Da*, Bergî Yekem, Çapxaneya 'Arf, Bexda, 85.

Mehmud Fethulla Ehmed “*Ew hoker rwîdana karekî zelal dike.*”⁹¹

Nî'met 'Elî Saye “*Ew hoker e, ku astê rwîdana karekî nîşan dide.*”⁹²

Ewrehmanî Hacî Marif “*Hejmarîya rwîdanê, astê hêza rwîdanê, endazeya hejmarî ya rengdêr û hokerê diyarî dike.*”⁹³ Di wan hemî pênaseyan de qala rwîdanê bi avayê şîroveyek zelal kirinê tê ber çavan û bi vî şiklî jî ferq û cudahiya di navbera pênaseyan de derdikeve hole. Sedem vê jî kesên ku wan pênaseyan binêre ji bo bingeheke ziman dê jê sûd wergire.

Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw, “*Bi wan hokeran tê gotin, ku hejmarîya rwîdana karê nav hevokê destnîşan dike.*”⁹⁴

Li gor Lîjneyek Le Wezaretî Perwerde, “*Ew hoker e, ku di hevokê de hejmarîya rwîdana karekê tamam (gerguhêz û negerguhêz) nîşan dide û dibîte tamamkerê wî karî.*”⁹⁵ Weke di van pênaseyan da derdikeve hole, hokerê çendanîyê, peyveke çendanîya rwîdana wî karî destnîşan dike. Di wan pênaseyan de jî dîsa aliyeke din ya rwîdanê derdikeve pêşberê me.

Di kirmancîya naverast a zimanê Kurdî de hokerên hejmarî ji wan xalan pêk tên: Gelê, zor, tozê, hendê, nextê, kemê, birê, çorê, tozêk, toze toze, têr têr, carê, rayek, tawê, ewende, ewene, ewenge, hemû, fire, kolê, pitir, kemtir, bê jimare, çikêk, birêk, nîskêk, hebêk, gelêk, deryayek, dû ewende, sêcar, tosqalê...hwd.

Wate hokerê hejmarîyê ew hoker e. Ev jî di hevokê de hejmarîya rwîdana karekê tamam “gerguhêz û negerguhêz” nîşan dide û dibîte tamamkerê wî karî.⁹⁶

Mînak

“*Min dilberek wek durr heye.*

Mehub û şîrîn sur heye

⁹⁰ Nurfî 'Elî Emîn (1960), *Rêzimanî Kurdî*, Çapxaneya Kameran, Silêmanî, 189.

⁹¹ Mehmud Fethulla Ehmed (1988), *Kar Awawkirdin Le Kurdî Da*, Nameya Mastirê, Kolêja Edebê Zankoya Selaheddîn, Hewlêr, 151.

⁹² Nî'met 'Elî Saye (2004), *Rêzimanî Kurdî Zarî Kelhorî*, Çapxaneya Şivan, Silêmanî, 71.

⁹³ 'Ewrehmanî Hacî Marif (2014), *Rêzimanî Kurdî, Bergî Yekem (Wuşesazî), Beşa Duyemîn (Cînav)*, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 127.

⁹⁴ Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî*, Çapa Heftemîn, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 118.

⁹⁵ Lîjneyek ji Wezaretî Perwerde (2016), *Ziman û Edebî Kurdî, Pola Yazdehemî Amadeyî, Bi Rêweberayeti Giştî Program û Çapemenîyekan*, Hewlêr, 94.

⁹⁶ Lîjneyek ji Wezaretî Perwerde (2016), *Ziman û Edebî Kurdî, Pola Yazdehemî Amadeyî, Bi Rêweberayeti Giştî Program û Çapemenîyekan*, Hewlêr, 92- 94.

*Husin û cemalek **pur** heye
Belqîs sîfet mesken seba”⁹⁷
“Hetawî newroz mangî co direw
Zor hatûn û çûn be roj be şew”⁹⁸*

*“Le gerûy şimşal, le telî keman
Gelê helsawe awazey ciwan ciwan”⁹⁹*

*“Beserhatî xot bo min beyan ke
Derdî giranim **nextê** asan ke”¹⁰⁰
“**Ewendem** bîst le mosîqa xiroşî ruhî bêgane
Mîzacî Kurdewarîm têkçuwe, Derwêş 'Ebdulla”¹⁰¹*

Eger bala xwe bidîne van beytên helbestan ên ji jor wê bibîn.

Di mînaka (1) de peyva (**pur-pir**) hokerê hejmarîyê ye û temamkerê karê (**heye**) ye. Çimkî hejmarîya rwîdana karê (**heye**) derdixe, di mînaka (2) de peyva (**zor**) hokerê hejmarîyê ye û temamkerê karê (hat, çû) ye, çimkî hejmarîya rwîdana wî karî derxistîye, di mînaka (2) de di peyva (**gelê**) hokerê hejmarîyê ye û temamkerê (**helsawe**) ye, çimkî hejmarîya rwîdana wî karî derxistîye. Di mînaka (4) de peyva (**nextê**) hokerê hejmarîyê ye temamkerê karê (asan ke) ye, çimkî hejmarîya rwîdana wî karî derdixe, di mînaka (5) de peyva (**ewnde**) hokerê hejmarîyê ye û temamkerê (bîst) e, hejmarî ye çimkî hejmarîya rwîdana karê (bîst) derxistîye.

Pirr caran peyvên (**zor, kemêk...**) digel hokerên din tîn, di vê rewşê de jî ji bilî wê ew peyv dibîte hoker.

Mînak

*Benaz **zor ciwan** derwat.

(**zor**) astê hokerê, (**ciwan**) hokerê çawanîyê

Heman peyv demê digel rengdêrê tê, dibîte astê rengdêrê,

Mînak

*Benaz **zor ciwan** e.

(**Zor**) astê rengdêrê, (**ciwan e**) rengdêrê çawanîyê

⁹⁷ Melayê Cizîrî (1982), *Dîwanî Melayê Cizîrî*, Çapa Yekemîn, Çapxaneya Siruş, Tehran, 29.

⁹⁸ Goran (1980), *Dîwana Goran*, Çapxaneya Korri Zanyarî Îraq, Bexda, 9.

⁹⁹ Goran (1980), *Dîwana Goran*, 10.

¹⁰⁰ Faîq Bêkes (2011), *Dîwana Faîq Bêkes*, Çapa Duyemîn, Çapxaneya Şivan, Silêmanî, 152.

¹⁰¹ Goran (1980), *Dîwana Goran*, Çapxaneya Korri Zanyarî Îraq, Bexda, 120.

Mînak

*Perwîn **gelê** danîşt.

Di vê hevokê de: peyva (**gelê**) hoker e, çimkî wesfa karê (**danîşt**) dike, hejmarî ye, çimkî mîqdarê rûnîştina Perwînê ji bo me derdixe.¹⁰²

Mînak

*Emro baran **fire** barî.

*Diwênê bawkim **tozê** hat bo lam.

*Gullnaz **nextê** awî bo hêna.

Di van hevokên jor: Peyva (**fire**, **tozê**, **nextê**) hokerê hejmarîyê ye û yê ketîye naverasta hevokê, her yek ji wan hejmarî û navnîşanê karê nav hevokê yê diyarî kirî, herweha ev peyv di zimanê Kurdî de ji bo astê jî tîen bikar anîn.¹⁰³

1.3.5. Hokerên Rêxistinê

Di zimanê Kurdî de komek ji pênaseya ji bo hokerê rêxistinê hatîne kirin. Li vir de emê hinekan bînin pêş çavan.

Sadiq Behaeddîn Amêdî, “Ew hoker e, ku rewşa karî di hevokê de tertîbî destnîşan bike.”¹⁰⁴

Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw, “Bi wan hokeran tê gotin, ku şêwe û cureyê encamdana wî karî nîşan dide.”¹⁰⁵

Lîjneyek le wezaretî perwerde, “Ew hoker e, ku di hevokê de şêwe û rêxistina rûdana karekî derdixe û wateya wê jî temam dike, hertim dibîte temamkerê karê temam di hevokê de.”¹⁰⁶

Weke di van çend pênaseyan da derdikeve, hokerê rêxistinê, peyveke şêwe û cure û bicih kirina wî karî destnîşan dike.

Di Kirmancîya naverast a zimanê Kurdî de hokerên rêxistinê pêk tîen ev jî wekî wan tîen rêz kirin. Deste deste, pol pol, car car, taqim taqim, ciwan ciwan, komel komel, sê sê, şeş şeş, qum qum, birr birr, cut cut, kem kem, jinane, piyawane,

¹⁰² Nuri 'Elî Emîn (1960), *Rêzimanî Kurdî*, Çapxaneya Kameran, Silêmanî, 189.

¹⁰³ Nuri 'Elî Emîn (1956), *Qewa'dî Zimanî Kurdî Le (Êrf û Nihu) Da*, Bergî Yekem, Çapxaneya 'Arf, Bexda, 85.

¹⁰⁴ Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancî Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Çapa Yekemîn, Bexda, 420.

¹⁰⁵ Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw (2010), *Rêzimanî Kurdî*, Çapxaneya Minare, Hewlêr, 110.

¹⁰⁶ Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde (2016), *Ziman û Edebî Kurdî, Pola Yazdehemî Amadeyî*, Bi Rêweberayeti Giştî Program û Çapemenîyekan, Hewlêr, 90.

merdane, mindalane, gurigasa, dûqolî, tinok tinok, wird wird, hêdî hêdî, xêra xêra, nawe nawe, taw taw, dem dem... hwd.

Hokerê rêxistinê hertim dibîte tamamkerê karê tamam di hevokê de.

Mînak

Deste deste, pol pol, car car, taqim taqim, ciwan ciwan, komel komel, sê sê, şeş şeş...hwd.

Mezî van mînakên jêrî **daye nîşandayîn**.

- 1- Piyawekan **deste deste** dehatin.
- 2- Baran **tav tav** debarêt.
- 3- Lawekan **komel komel** rawestabûn.
- 4- Mindaleke awekey **qum qum** xwardewe.
- 5- Kew **bir bir** firrîn.
- 6- Kotrekan **cût cût** helnîştin.
- 7- Zaro **sê sê** royîştin.

Pêşçavrûnî

Eger bala xwe bidîne ser hevokên jor, wê bibînîn peyvên **deste deste, tav tav, komel komel, qum qum, birr birr, cût cût, sê sê...hwd**, ku rêxistin û rêzkerin têde ye, bi wan tê gotin hokerê rêxistinê, çimkî wateya karê (**dehat**) ê tamam kirîye û awayê rwîdana wî karî derxistîye. Eger peyva (**deste deste**) tunebûya, me nedizanî ew kar bi çi awayî qewimîye. Di hevoka (2) de payva (**tav tav**) hokerê rêxistinê ye, çimkî wateya karê (**debarêt**)ê tamam dike û şeweyê rwîdana wî karî derdixe. Eger peyva (**tav tav**) nebit di hevokê de, em nizanîn ew kar bi çi awayî diqewime, di hevoka (3) de peyva (**komel komel**) hokerê rêxistinê ye, çimkî şeweyê rwîdana karê (**rawestabû**) yê derxistibû, wateya wî karî jî tamam kirîye, eger peyva (**komel komel**) tunebûya, me nedizanî ew kar bi çi awayî qewimîye, di hevoka (4) de peyva (**qum qum**) hokerê rêxistinê ye, çimkî şeweyê rwîdana karê (**xwardewe**) yê derxistî û wateya wê jî tamam kirîye, eger peyva (**qum qum**) tunebûya me nedizanî ew kar bi çi awayî qewimîye, di hevoka (5) de peyva (**bir bir**) hokerê rêxistinê ye, çimkî şeweyê rwîdana karê (**firrîn**) derdixe û wateya wê jî tamam dike, eger peyva (**bir bir**) di hevokê de tune be, me nedizanî ew kar bi çi awayî diqewime, di hevoka (6) de peyva (**cût cût**) hokerê rêxistinê ye, çimkî şeweyê rwîdana karê (helnîştin)ê

nîşan daye û wateya wê jî temam kirîye, eger peyva (**cût cût**) tunebûya, me nedizanî ev kar bi çî awayî qewimîye, di hevoka (7) de peyva (**sê sê**) hokerê rêkxistinê ye, çimkî şeweyê rwîdana karê (**royîşt**) yê derxistî û wateya wê jî temam kirîye, eger peyva (**sê sê**) tunebûya me nedizanî ku ev kar bi çî awayî qewimîye.

1.3.6. Hokerên Sedem û Mebestê

Di zimanê Kurdî de komek ji pênaseya ji bo hokerê sedem û mebestê hatîne kirin, li vir de hinekan wê bînîn pêş çavan.

Kurdistan Mukiryani *“Sedema rwîdana xebera hevokê a serekî didet, ji bo hevoka serekî vedigere, nek ji bo beşekê ji beşên hevokê.”*¹⁰⁷

Mehmud Fethulla Ehmed *“Sedema rwîdana karê hevokê derdixe û hertim di şeweyê firêzê de an jî digel hokerên din da tê ditin.”*¹⁰⁸

Şilêr Resul Berzincî *“Wan sedeman destnîşan dike, ku yên bûye sedemê rwîdana karê nav wê guzareyê.”*¹⁰⁹

Ewrehmanî Hacî Marif *“Tilîyê ji bo sedema wê rwîdanê radikişîne û mebesa bi cî anîna karekî derdixe.”*¹¹⁰

Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw *“Bi wan hokeran tê gotin, ku sedema rwîdana karekî digel mebest ji bi cî anîna karekî nîşan dide.”*¹¹¹

Weke di vê pênaseyê da derdikeve, hokerê sedem û merem, peyveke sedema rwîdana wî karî û merem ji rwîdana wî karî desnîşan dike.

Di kirmanciya naverast a zimanê Kurdî de hokerên sedem û mebestê pêktên. Le tureyîda, le tîrsa, le bîrsa, le daxa, be enqest, leberewe, leber ewey, çûnke, bexorayî, le bê 'eqlî, leber jan, belku, beşku, bo ewey, heta, ta, ke, le xoşiya, le tawan, le serma, le hawar, leber êş û azar, leber peroş û pejarey xoy, leber, to, leber

¹⁰⁷ Kurdistan Mukiryani (1986), *Sîntakis Ristey Sade Di Zimanê Kurdî Da*, Çapxaneyê Dar el-Hurriye lil-Tîba'e, Bexda, 82 - 88.

¹⁰⁸ Mehmud Fethulla Ehmed (1988), *Kar Awawkirdin Le Kurdî Da*, Nameya Mastirê, Kolêja Edebê Zankoya Selaheddîn, Hewlêr, 44- 62.

¹⁰⁹ Şilêr Resul Berzincî (1989), *Awelguzare Le Zimanê Kurd Da*, Nameya Mastirê, Kolêja Edebê, Zankoya Selaheddîn, Hewlêr, 81.

¹¹⁰ 'Ewrehmanî Hacî Marif (2004), *Ferhengê Zarawey Zimannasî, Kurdî- 'Erebî-Îngilîzî, Ligel Dû Paşgo*, Silêmanî, 34.

¹¹¹ Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî*, Çapa Heftemîn, Çapxaneyê Rojhilat, Hewlêr, 120.

dûrî ew, le tenyayî, le mirdin, leber hendêş, bo rizgar bûn, bo êşkgirtin, bedem xewewe, le qîna...hwd.

Wate hokerê sedem û mebestê ew hoker e ku sedem û mebest ji rwîdana karekî di nav hevokê de nîşan dide. Ji ber çî diqewime an jî mebest ji rwîdanê çîye?

*Pîremêrdeke **ledaxa** mird.

*Mindaleke **lebirsax** mird.¹¹²

*Jineke çû bo bazar, **belku** kirasêk bo mindalekey bikirêt.

*Ew dermanane bixor, **belku-besku** pêyan çak bibîtewe.

Hinek caran bê yarmetîya daçeka gehandinê, saz dibe.

Mînak

*Çûm bo bazar, **belku** hawrêkanim bibînim.¹¹³

Ev cureye weke girêya bendê kar dike, helgirê wateya karîgerîyê ye, çimkî nerîneka şiroveyî a mirov û sedema rwîdana wî karî derdixe, weke le bê 'eqîlî, le tirsax, be enqest, bexorayî...

Mînak

*Mindaleke **letirsax** hellat.

1.3.7. Hokerên Nerênî (Nêgetîv)

Di zimanê Kurdî de hinek pênase ji bo hokerê nerênîyê hatîne kirin, li vir de hinek ji wan pênaseyan emê nîşan bidîn.

Nurî 'Elî Emîn “Ew hoker in, ku ji bo nerênî kirina karekî tîn bkaranîn.”¹¹⁴

Lîjney ziman û zanistekanî korî zanyarî Kurd dibêjin: “Ji bo nerênî kirina karî bikar tê.”¹¹⁵

Ewrehmanî Hacî Marif “Ev cureyên hokeran, nerênî bûna kiryarê radigehînin.”¹¹⁶

¹¹² Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî*, 116.

¹¹³ Mihemed Emîn Husên (2010), *Kovara Kurdolojî*, Çapxana Kanî Askan, Silêmanî, 249.

¹¹⁴ Nurî 'Elî Emîn (1960), *Rêzimanî Kurdî*, Çapxaneya Kameran, Silêmanî, 190.

¹¹⁵ Lîjneyek ji Ziman û Zanistekan, (1976), *Rêzimanî Axawtinî Kurdî*, Çapxaneya Korî Zanyarî Kurd, Bexda, 284.

Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw “*Ew hoker e, ku nerênîya wî karî destnîşan dike.*”¹¹⁷

Ev cureyê hokerê bi mixabinî ve zimanvanan pirr hindik li ser gotîye, ku eve jî pîrsgirêkeke, ku çawa zimanvanan kêmtir awir li vê mijarê vedaye.

Di kirmanciya naverast a zimanê Kurdî de hokerê nerênî pêktên Hergîz, hergîzaw hergîz, be hîç corê, be hîç çêşnê, be hîç şêweyek, be hîç rengê, be hîç kilocê...hwd.

***Hergîz naçime ahengeke.**

***Hergîzawhergîz** waneke naxwênim.

***Behîç şêweyek** kar nakeyn.¹¹⁸

Bi wateya ku ev hoker di nav xwe de wateya nerênîyê û retkirinê digehînin. Her ji ber hindê jî weha ji wî karî dike ku ew kar jî şêweyê nerênîyê werbigire.

1.3. 8. Hokerên Dûbarekirinê

Di zimanê Kurdî de komek ji pênaseyan ji bo hokerê dûbarekirinê hatîne kirin, li vir de wê hinekan nîşan bidîn.

Ewrehmanî Hacî Marif “*Hokerê dûbarevekirinê tilîyê ji bo teqezbûyîna rwîdanê radikêşe.*”¹¹⁹

Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw “*Bi wan hokeran tê gotin, ku dûbarevekirin û teqezkirina karekî didin nîşandan.*”¹²⁰

Azad Ehmed Husên “*Teqezvebûna rwîdanê radigehîne.*”¹²¹

Di Kirmanciya naverast a zimanê Kurdî de hokerên dûbarevekirinê pêktên. Dûbare, dîsan, ser le nwê, carêkî dî, carêkî tir, hercare, her carê, bezorî, carêk, hercarekî, emcareş, hemû katêk, be degmen, hergîz, hendêcar, hemdîsan, dîsanewe...hwd.

***Dîsan** waneke destî pê kird.

¹¹⁶ ‘Ewrehman Hacî Marif (1998), *Rêzimanî Kurdî, Bergî Yekem (Wuşesazî), Beşa Çarem (Jimare û Awelkirdar)*, Bergî Yekem, Dezgay Rewşenbîrî û Belawkirdinewey Kurdî, Bexda, 150.

¹¹⁷ Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî*, Çapa Heftemîn, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 115.

¹¹⁸ Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî*, 115.

¹¹⁹ ‘Ewrehman Hacî Marif (2014), *Rêzimanî Kurdî, Bergî Yekem (Wuşesazî), Beşa Duyemîn (Cînav)*, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 21.

¹²⁰ Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî*, 115.

¹²¹ Azad Ehmed Husên (2001), *Erkî Edvêrbil Le Frêzî Karî Da, Lêkolîneweyekî Berawirdkarîye Be Kerestey Diyalêktî Xwarû û Hewramî*, Nameya Mastirê, Koleja Ziman, Zankoya Silêmanî, Silêmanî, 48.

*Dûbare deçînewe geşteke.

*Ser lenwê behar hatewe.¹²²

Ev cureyê karî wateya dûbarevekirinê didet, bi awayekî ev kar careka din tê encamdan.

Ev cureyê hokerê kêmtir awir lê hatiyan, bi wê wateyê şarezayên zimanê Kurdî kêmtir li ser vê mijarê yên xebitî hene.

1.3.9. Hokerên Teqezvekirinê

Di zimanê Kurdî de komek ji pênaseyan ji bo hokerê teqezvekirinê hatîne kirin, li vir de emê hinekan bidîn nîşandayîn.

Nurî 'Elî Emîn “*Teqezvekirine li ser bi cî anîna karekî nîşan dide.*”¹²³

Lîjney ziman û zanistekani korî zanyarî Kurd “*Hokerê teqezvekirinê ji bo tekîda karî tê bikaranîn.*”¹²⁴

Sadiq Behaeddîn Amêdî “*Ji bo tekîda karî tê bikaranîn.*”¹²⁵

Ewrehmanî Hacî Marif “*Ev cureyê hokerê teqezê vedike ser bi cî anîna karekî.*”¹²⁶

Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw “*Bi wan hokeran tê gotin, ku teqezê li ser encamdan û cîbicîkirina karî vediken.*”¹²⁷

Di kirmanciya naverast a zimanê Kurdî de hokerên teqezvekirinê ji wan xalan pêk tê.

Her, helbet, bêguman, bêşik, bê sê û dû, bê çend û çon, ... hwd.

¹²² Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî*, 116.

¹²³ Nurî 'Elî Emîn (1960), *Rêzimanî Kurdî*, Bergî Sêyem, Çapxaneya Kameran, Silêmanî, 177.

¹²⁴ Lîjneyek Ziman û Zanistekani, (1976), *Rêzimanî Axawtinî Kurdî*, Çapxaneya Korî Zanyarî Kurd, Bexda, 284.

¹²⁵ Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancî Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Çapa Yekemîn, Bexda, 420.

¹²⁶ 'Ewrehman Hacî Marif (1998), *Rêzimanî Kurdî, Bergî Yekem (Wuşesazi), Beşa Çarem (Jimare û Awelkirdar)*, Bergî Yekem, Dezgay Rewşenbîrî û Belawkirdinewey Kurdî, Bexda, 133.

¹²⁷ Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî*, Çapa Heftemîn, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 119.

*Her deçim bo ew malle.

*Hellbet kareke nakeyn.

*Bêguman le şereke serdekewîn.¹²⁸

Ango ev cureye, teqezvekirin û tekîdvekirin li ser encamdan an jî encammedana karekî radigehîne me.

Bi berawird digel tevahîya cureyên hokerê; ev cure ji teva wan kêmtir awir lê hatiye dan, wate zimanvanan xwe li bas kirina vê mijarê dûr girtîye.

1.4. Ji Alîyê Erkê ve Hoker

Hoker dibine tamamkerê karî. Di hevokê de rolê xwe digerînin û nabin tamamkerên ne rasterast. Çimkî di hokerê de hertim bi awayekî rasterast dibe. Ji ber ku ew daçeka ji beşa pêşiya xwe werdigire, dibîte beşek ji hokerî û diket bi firêzeka hokerê.

Hoker hinek erkan dibînin di nav hevokan de, li vir de wê wan erkan şirove bikîn:

1- Hoker dibîte tamamkerê karî, îcar ew kar rabirdû be an ranebirdû an jî emir kirin.

Mînak

A- Azad xêra royîşt. (Hokerê çawatiyê, tamamkerê karê rabirdû).

B- Azad xêra derwat. (Hokerê çawatiyê, tamamkerê karê ranebirdû).

C- Xêra naneke bixo. (Hokerê çawatiyê, tamamkerê karê emir kirinê).

2- Hoker dibîte tamamkerê hokerekê din û bi hev re firêzeka hokerî saz dikin.

Mînak

*Azad zor xêra hat.

(**Zor**) hokerê hejmarî, (**xêra**) hokerê çawatiyê.

(**Zor û xêra**) bi hev re firêzeka hokerî ye.

3- Hoker dibîte nîhad, eger karê hevokê natemam bû.

¹²⁸ Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî*, 115.

Mînak

**Diwênê Heynî bû.* (Hokerê demkî, nîhad).

- 4- Hoker dibîte tamamkerê karê natemam, di demekî ku eger karê natemam di hevokê de hebe.

Mînak

Diwênê **direng bû.* (Temamkerê karê natemam).

Dara **gelêk direng e.* (Temamkerê karê natemam).¹²⁹

1.5. Taybetmendiyên Hokerê

Di zimanê Kurdî da hoker bi gelemperî hinek taybetmendî hene, li vir da hinek ji wan taybetmendiyan em ê qala wan bikin

1- Yek ji taybetmendiyan herî girîng ên hokerê ewe, ku dêmekê hevoksazîyê yê hey û valahîyekê ji valahîya wê astê pirrve dike, ku beşek ji hokeran gelek bi hêsanî dikarin cihê xwe biguherî nin.

2- Hoker ji alîyê hevoksazîyê ve xwedîyê vê taybetmendiye ne. Di hevokê de beşek ji wan dibine hokerê karî û beşa din jî dibine hokerê hevokê, hinek jî dibine diyarkerê nav.

3- Hoker di astê hevoksazîyê de erkên cuda cuda dibînin. Li gorî derketina xwe di hevokê de,

Mînak

Serbar, tamamker.

4- Hokeran hêza derketinê di firêzeka din a hevokê zêdetir e, bi hevberî digel biker û bireserî, çimkî pêzanîn derbareyê lêkerî, rwîdana rwîdanê bi guhgirî û xwînerî dide û di pirraniya demî de hêzeka serekî a hevokê ji bo alîyê xwe dikişînin.

5- Hinek caran cihê hokeran di hevokê de taybete bi xwe û dikevîte pêşberî lêkerî ve, lêbelê pirr caran jî li gorî pêwîstiyê ji firêza karî derdikevin pêşberê xwendekar.

¹²⁹ Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw (2004), *Ramanêkî Nûwê Bo Hevalkar*, Kovara Karwan, Jimare 184, Hewlêr, 105-107.

6- Beşek ji hokeran digel rengdêran de xwediyê eynî pîrensîpan in û wateya wan wek heye. Lêbelê cudahiya wan ji alîyê rolê wan ê rîzmanî ve heye.

7- Hoker regezê serekî yê ziman e, roleka girîng dibîne ji diyar kirina demê bûyeran de, di zimanê Kurdî de dema ranebirdû (niha û dahatî) vedigire.

8- Peyvên hokerê navên tiştan nagehînin û tu tiştêkê diyarkirî bi navê wan nabe, ji ber hindê wateya wan peyveka ferhengî nîne, belkî wateyeka kiryarî an jî erkî ye.

9- Watesazî ji bo hokeran nirxekê taybetê xwe heye. Çimkî dibîte nîşane ji bo cuda kirinê ji beşên din ên axivînê. Li gorî vê hoker ew girê û hevok in ku wesfa lêkerî dikin û dibine bersiv ji bo hemû pîrsan ku derbareyê wê bihête kirin. Wekî din alîyekê nexuya jî kirî eşkere dike.

1.6. Komguhertina Hokerê (Polgorînî Awelkar)

Di zimanê Kurdî da komguhertin hene, bi wê wateyê beşên axivînê dibin bi hoker, bi berevajî jî hoker dibin bi beşên din ên axivînê, li vir da em ê basa wan bikin.

1.6.1. Komguhertina Beşên Axivînê Ji Bo Hokerê

1- Komguhertina navî ji bo hokerê wiha tên mînakdayîn.

Pêşgir + nav = hoker

Be + roj = beroj

Mînak- Beşew, behawîn, bezistan....hwd.¹³⁰

**Nav + paşgir = hoker*

Şew + î = şewî

Mînak- Hawînî, zistanî, rojî... hwd.

**Pêşgir + nav + paşgir = hoker*

¹³⁰ Hîdayet 'Ebdulla Mihemed (2002), *Rêkewtinî Wateyî Naw û Hevalnav Di Zimanê Kurdî Da*, Nameya Doktorayê, Koleja Ziman, Zankoya Silêmanî, 510.

Be + ser + da = beserda

Mînak- Beşewê, lepaşewe...hwd.¹³¹

*Komguhertina navî ji bo hokerê

*Dûbarevebûna navî,

Mînak- Pol pol, deste deste, rê rê, komell komell...hwd.

*Dûbarevebûna navî, bi hemkarîya daçeka lêkdanê,

Mînak- Şaxewşax, banewban...hwd.

- Lêkdana dû nava,

Mînak- Laçaw, ladîwar, sertenûr, nawmall...hwd.

- Lêkdana dû nava bi hemkarîya pêşgirê,

Mînak- Beser berzî, Leser sing, Leser pişt, ... hwd.¹³²

2- Komguhertina rengdêran ji bo hokerê

Rengdêr + paşgir = hoker

Jîr + ane = jîrane

Mînak- Kwêrasayî, zîrekane...hwd.¹³³

- *Pêşgir + rengdêr = hoker*

Be + baş = bebaş

Mînak- Besext, bequrs, bexêra...hwd.

- *Pêşgir + rengdêr + paşgir = hoker*

¹³¹ K.K. Kurdoyêv (1984), *Rêzimanî Kurdî Bi Kerestey Diyalêktî Kurmancî û Soranî*; Kurdistan Mukiryani, *Emîndarêti Giştî Rewşenbîrî û Lawan*, Hewlêr, 101.

¹³² 'Ewrehman Hacî Marîf (1990), *Awelkirdar Ji Aliyê Wateye Va*, Kovara Rewşenbîrî Nûwê, Jimare 125, Dezgay Rewşenbîrî û Belawkirdinewey Kurdî, Bexda, 97.

¹³³ 'Ebdulwahîd Muşîr Dizeyî (2012), *Wuşesazî, Çapxaneyê Hêvî*, Hewlêr, 101.

*Le + gerim + ana = legermana*¹³⁴

Mînak- *Lexoşîda, lequlayî, bebaşî, beciwan... hwd.*

- *Komguhertina rengdêrê ji bo hokerê.*

Bi sedema dûbarevebûna rengdêrî,

Mînak- *Ciwan ciwan, baş baş, hêdî hêdî...hwd.*¹³⁵

- Polguhertina rengdêrê ji bo hokerê bi sedema dûbarevebûna rengdêrî, bi hemkarîya daçeka lêkderê.

Mînak- *Rast û rast, çep û çep...hwd.*

3- *Komguhertina wê ji bo hokerê.*

- *Guhertina pêkhatayên nav û rengdêr ji bo hokerê, bi hemkarîya daçeka lêkderê,*

Mînak- *Pirrbedil, serlenwê, pirrbegiyan...hwd.*¹³⁶

- *Guhertina pêkhateya nav û rengdêr ji bo hokerê,*

Mînak- *Şew direng, beyanî zû...hwd.*

4- *Guhertina pêkhateya nav û hejmar ji bo hokerê,*

Mînak- *Katjimêr heşt, yekcar, yekser...hwd.*

5- *Guhertina pêkhateya nav û daçeka nîşaneyê ji bo hokerê,*

Mînak *Emro, emşew, emkate, ewsaş, em şwêne...hwd.*¹³⁷

6- *Guhertina pêkhateya nav û daçeka nîşaneyê ji bo hokerê, bi hemkarîya paşgirê,*

Mînak- *Emcareş, ewsaş, ewkatîş...hwd.*

¹³⁴ Yusif Şerîf Se'îd (2013), *Wuşesazî Zimanî Kurdî*, Çapxaneya Hacî Haşim, Hewlêr, 56.

¹³⁵ Mihemed Mehwî (2010), *Wuşesazî û Beyekdaçûnî Pêkhatekan*, Koleja Ziman, Zankoya Silêmanî, 94.

¹³⁶ Xazî 'Elî Xurşîd (2013), *Rêzimana Fermî*, Çapa Yekemîn, Çapxaneya Serdem, Silêmanî, 69.

¹³⁷ K.K. Kurdoyêv (1984), *Rêzimanî Kurdî, Bi Kerestey Diyalêktî Kurmancî û Soranî*, Kurdistan Mukiryanî, *Emîndarêtî Giştî Rewşenbîrî û Lawan*, Hewlêr, 311-312.

- 7- Guhertina pêkhatêya nav û cînavka xweyî ji bo hokerê, bi hemkarîya paşgirê,
Mînak- Lenawxo, leserxo...hwd.
- 8- Guhertina pêkhatêya dû daçekên pirsê û paşgir ji bo hokerê,
Mînak- Bê çen û çon, bê çî û kê...hwd.
- 9- *Guhertina pêkhatêya nav an hejmar digel morfîma (her, dî) ji bo hokerê,*
Mînak- *Hercarêk, carêkî dî, herdû, herdem....hwd.*¹³⁸
- 10- *Guhertina pêkhatêya nav û morfîmê (hîç) ji bo hokerê,*
Mînak- *Behîç çeşnêk, behîç rengêk...hwd.*¹³⁹
- 11- Guhertina pêkhatêya hejmara nediyar û rengdêr ji bo hokerê,
Mînak- Zor ciwan, gelêk baş...hwd.

1.6.2. Komguhertina Hokerê Ji Bo Beşên Din Ên Axivînê

1- Komguhertina hokerê ji bo nav.

- *Hoker + paşgir = rengdêr*

Pêş + ewa = peşewa

Mînak- *Berok, serok...hwd.*¹⁴⁰

2- Komguhertina hokerê ji bo rengdêr.

- *Hoker + paşgir = rengdêr*

Pêş + û = pêşû

Mînak- *Berîn... hwd.*¹⁴¹

4- Komguhertina hokerê ji bo nav, bi hemkarîya nav,

Mînak- *Jêr piyalle, jêr zemîn, hemîşe behar...hwd.*

5- Komguhertina hokerê ji bo nav, bi hemkarîya nav û daçeka lêkderê,

Mînak- *Paşeroj, paşe berd...hwd.*

¹³⁸ 'Ewrehman Hacî Marif (1998), *Rêzimanî Kurdî, Bergî Yekem (Wuşesazî), Beşa Çarem (Jimare û Awelkirdar)*, Bergî Yekem, Dezgay Rewşenbîrî û Belawkirdinewey Kurdî, Bexda, 90.

¹³⁹ 'Ewrehman Hacî Marif (1998), *Rêzimanî Kurdî*, 99.

¹⁴⁰ 'Erehman Hacî Marif (1979), *Rêzimanî Kurdî, Bergî Yekem (Wuşesazî), Beşa Yekem, (Naw)*, Çapxaneya Korî Zanyarî Kurd, Bexda, 130.

¹⁴¹ Xazî 'Elî Xurşîd (2013), *Rêzimana Fermî, Çapa Yekemîn, Çapxaneya Serdem, Silêmanî*, 61.

- 6- Komguhertina hokerê ji bo beşek ji lêkerî, bi hemkarîya karî,
Mînak- *Pêşkewt, jêrkewt, diwakewt...hwd.*¹⁴²



¹⁴² Nuri 'Elî Emîn (1960), *Rêzimanî Kurdî*, Çapxaneyê Kameran, Silêmanî, 149.

BEŞA DUYEMÎN

2. HOKER DI KURMANCÎYA SERÎ YA ZIMANÊ KURDÎ DA

2.1. Têgeh û Pênaseyên Hoker

Têgeha hokerê di wateya xwe ye ferhengî de tê wateya pêçek ê. Ji xwe hemû heyberên kû di gerdûnê da hene yan pêçekin an jî bê pêçekin. Lewre hemû buyerên kû di gerdûnê da diqewimin hem li cihekî hem ji di demekê da pêk tên. Jiber vê yekê ew cihê demên ku bûyer tê de diqewimin ji wan bûyeran ra dibin hoker ango pêçek (zerf) e.¹⁴³

Hoker weke mijareka zimanasî ku di para pitir a zimanan da hest pê tê kirin. Zimanê Kurdî jî weku yek ji zimanên cîhanê, xwedan hokere, hoker jî weku beşêkî xwe ne serekîyê. Di ristê rolê xwe dibîne, ku peywendîyeka rasterast bi kar ve heye çî ji layê demê yan cihê yan çawaniyê ve ye. Evca ev kar karekê têper (gerguhêz) be yan têneper (negerguhêz) yan jî rabirdû (borî) be yan ranebirdû (ne borî) be.

Hoker hemû deman bi astê ristesazîyê ve girêdaye. Ango rola wî di ristê da diyar dibe, ne di wişesazîyê da. Çimkî peywendî bi karî ve heye. Ango nav û hevalnav û jimare û heta radeke jî rolê hokerî di ristê da dibîne. Vêca ew kerestên ristê çî peyvên sade bin yan jî hatibine durustkirin bi rêya pêşgir û paşgiran yan li hev girêdana dû beşên axiftinê û hwd.

Mînak

Eger peyva “ciwan” werbigirîn, ku peyveka sadeye em dibînin ku çend erkan di ristê da li ser xwe digirin.

***Ciwanê** nan xwar. (Ciwan □ Nav) e.

*Keça **ciwan** hat. (Ciwan □ Hevalnav) e.

*Nesrîn **ciwan** rûnişt. (Ciwan □ Hoker) e.

¹⁴³ Nezîr Ocek (2019), *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, Çapa Duyemîn, Çapxana Sîtav, Enqere, 176.

Di van nimûneyan da peyva “**ciwan**” carekê buye “**nav**” û di rista duyem da buye “**hevalnav**” û di rista sêyem û dumahiyê da buye “**hoker**.” Kewate bi tenê di ristê da têzanîn ka ev peyv hokere yan na.

Derbarê têgeha hoker jî gelek bîr û boçûn (nêrîn) hene, anku zimanvan li ser zaravekî rêknekeftîne, zaravên “*hoker, hevalkirdar, hewalkar, hevalfirman, filênîş, nêrî, hoker, ... hwd.*” hatîne bi dîyalektan bo ser çend deveran ku her deverêk navekî jî evan bo hoker bikardihîne û di Kurdîya serî da zaravê “Hevalkar” ê bernase û dihête bikarhînan, ku ew jî pêkhatiye ji “*heval + kar*” anku hevalê karî, çimkî girêdaye bi karî ve yan jî şolê wî digel karîye. Ji ber hindê me jî zaravê hevalkar di vê vekolînê da bikar îname.¹⁴⁴

Ango di zimanê Kurdî de bêjeyên hene ku ji kerestê re dibin nav. Bi navdêrê (nav) hatine nîmandin. Bêjeyên din jî hene ku ji rewîştên “xisletan” re dibin nîşan û ji wan re têtê gotin rengdêr (hevalnav) û beşeka din ji bêjeyan heye ku kirin û livînê destnîşan dikin û bi lêker (kar) têtê bi navkirin. Lê bêjeyên ji nîşaneyên kirinê re û nîşaneyên rewîşt û nîşanan re, amaje pê hatine kirin di rêzimanê de, jêra têtê gotin hoker anga (hevalkar).¹⁴⁵

Di zimanê Kurdî da hejmara pênasayên curbicur bo “hoker” di Kurmanciya serî da gelek in. Em ê li vira behsa hinekan bikin.

Sadiq Behaeddîn Amêdî, “*Hevalkar dibêjine wê pişka axiftinê ya ku haviliyeka êkser bi kirinê ve hebit ji layê çawaniya dem û cihê û curê runedanê yan jî her barekê dî be. “Hevalkar ew beşe li axaftinê ku peywendî rastewxwe bekarewe - f’li- hebêt bi layê çawanî an jî kat û an jî şûn û curî rûdana û rûnedana, an jî her barekê tir ye we bêt.*”¹⁴⁶

Di vê pênasayê de hevalkar pişka vê axivtinê ye ku bi zêdehî bi layê çawaniyê ve cure cure têtê nîşandayîn. Hevalkar, bi vî şiklî ve rast xwe bûne bi hev re girêdan heye. Hevalkar bi layê hebêt û çawaniyê ve wedî erk e.

¹⁴⁴ Dîmen ‘Ebdulla ‘Umer (2009), *Hevalkarê Çewayî Di Dîyalêkta Serî ya Zimanê Kurdî Da*, Nameya Mastirê, Kolêja Edebê, Zankoya Duhokê, 3- 4.

¹⁴⁵ Bavê Nazê (2012), *Rêzimana Kurdî (Teorî û Praktîk)*, Çapxana Hewar, Duhok, 93.

¹⁴⁶ Sadiq Behaeddîn Amêdî (2012), *Rêzimana Kurdî Kurmancî Jorî û Jêrî Ye Hevberkirî*, Weşanxana Dîwan, Stenbol, 254.

Mubarek Mubarek, “*Ew peyve ewa ji layê sîntaksî ve bi peywendî bi karî ve hebêt.*”¹⁴⁷ Di vê pênaseyê de bi layê sîntaksî ve pêwendî bi hev re hatiye girêdan. Di vê girêdanê bi kar û xebatê ve hey.

Z. Ayusupova “*Edvêrbil le goranda, wek hemû dîyalekte Kurdîyekanî tir, dû girupin: Yekêkiyan le bincda edvêrbile û ewî tiryar dirustkirîye.*”¹⁴⁸ Di vê pênaseyê de Edwêrbil bi dû beşa hatiye dabeş kirin. Di girêdanê de pêwendî bi dîyalektê ve heye.

Bahoz Baran, “*Hoker, ji aliyê rewş û dem û mêjer û cihî ve bandorê li lêker, lêker nav, rengdêr, hokeran dikin, herwiha ji aliyê pirsê ve jî van taybetîyan destnîşan dikin.*”¹⁴⁹ Di vê pênaseyê de hoker bi aliye deme ve jî hatiye pesend kirin. Nivîskar di pênaseya xwe de hem qala deme hem qala rewşê hem jî qala cihê dike.

G. Fincih, “*Ew kerestê rêzimanîye ewê karî pîtir diyar dikin û karî ji sê layenan ve didine diyarkirin.*”¹⁵⁰ Di vê pênaseyê de mijar bi aliye rêzimanî ve li gor sê layenan hatiye dîyar kirin ku ev jî ciyawazîyeke cûda ye ji bo pênasekirina vê mijarê.

Parot Martin, “*Hevalkar peyveke, ku bi rastvekirina karî yan hevalnavî yan hevalkarekî dî ra dibe.*”¹⁵¹ Nivîskar di vê şîroveyê hevalkar wekî rastvekirina hevalnav nişan dide.

Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw “*Beşekî serbexweyê girîngê axaftinêye peywendîyeka êkser û mukim bi karî ve heye.*”¹⁵² Di vê pênaseyê de nivîskarê me hevalkarî wekî beşekî serbixwe yê girîng dibine û pêwendîya wê bi axivînê ve heye.

Li gor Lîjneyek Wezaretî Perwerdehiyê, “*Ew peyve ku demê yan cihê yan çawaniya rûdana karî di ristê da diyar dikin û peywendî bi karî ve heye.*”¹⁵³ Di vê pênaseyê de jî pey an bi demê an bi cihê an jî çawaniyê ve hatiye girêdanê.

¹⁴⁷ Mubarek Mubarek (1995), *Mu'cem el-Mustelehat el-Lisniye, Fransî, Îngilîzî, 'Erebî*, Çapa Yekem, Dar el-Fikr el-Lubnanî lil-Tiba'e vel-Neşir, Beyrut, Lubnan, 15.

¹⁴⁸ Z. Ayusupova (1998), *Diyalêktî Goranî Kurdî*, San Peterburg, 83.

¹⁴⁹ Bahoz Baran (2018), *Rêzimana Kurmancî*, Çapa Duyemîn, Çapxaneyê Wardoz, Diyarbekir, Turkiya, 99.

¹⁵⁰ G. Fincih. (2000), *Linguistic Terms And Concepts*, Macmillan Press, 84.

¹⁵¹ Parot, Martin (2001), *Grammar For English Language Teachers*, Cambridge University Press, 28.

¹⁵² Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw (2007), *Çend Babetêkî Zimanewanî*, Çapxaneyê Şehîd Azad Hewramî, Kerkuk, 64.

Îbrahîm Remezan Zaxoyî, di vî warî de mijarê bi vî şiklî rawe dike, “*Hoker peyveke pesna pişkekê, peşnekê, an hokerek dî didin.*”¹⁵⁴ Di vê şîroveyê de hoker wekî peyweke ku yê ku tişteki dibêje pê pesin bide hatiye dest nişan kirin.

Nezîr Ocek, wekî nivîskareke Kurdîya Jêrîn, “*Ew cure peyvin ku ji aliyê rewş, sedem, dem, cî, bergeh û mêjerê ve bandorê li ser lêker, lêker nav, rengdêr û hokerên mîna xwe dikin û wan ji aliyê wateyê ve sergihayê û tamam dikin.*”¹⁵⁵ dibêje. Li gor vê şîroveyê jî peyv hem cihî hem bi rewşê hem jî bi deme ve hatiye girêdanê. Sedem vê jî peyv di nav hevokê de wekî tişteke nediyar û serbixwe nehatiye dest nişan kirin.

Dîmen ‘Ebdulla ‘Umer, “*Peyveke yan çend peyvekin, ku şewê rûdan û rûnedana karê ristê, çi ji layê demî yan cihê yan çawaniyê ve diyar dikin.*”¹⁵⁶

‘Ebdulselam Necmeddîn ‘Ebdulla û Selwa Ferîq Salih “*Peyveke ku çawaniya rûdana karî ji layê dem, cih û şeweyê ve nişan didin.*”¹⁵⁷

Bavê Nazê “*Yek ji beşên axaftinê yê sereke ye û ji nişanê kirinê re dibe destnişan û weha jî, dibe nişan ji nişanên pê kirinê re.*”¹⁵⁸

Di wan her sê beyan û pênaseyan de hoker bi layê hokera çawanîyê ve hatiye pênase kirin. Di wan şîroveyan de yek peyv an jî çend peyv bi hev re bi kar û ristê ve bi hev re hatiye girêdan wekî din i wan şîroveyan de qala nişan kirina cî û deme jî hatiye kirin.

Dîs ali gor Lîjneyek Ji Wezaretê Perwerde “*Peyveke rûyekê rûdana karê risteyê derbarê “demê wê rûdanê, yan cihê rûdanê, yan çawaniya rûdanê yan*

¹⁵³ Lîjneyek Le Wezaretî Perwerde (1998), *Rêzîman û Edebê Kurdî*, Peymangeha Melbendîya Mamostayan, Duhok, 85.

¹⁵⁴ Îbrahîm Remezan Zaxoyî (2008), *Rêzîmana Kurdî, Qewa'd el-Luxe el-Kurdiye*, Çapa Yekemîn, Çapxana Xanî, Duhok, 68.

¹⁵⁵ Nezîr Ocek (2019), *Waneyên Rêzîmana Kurmancî*, Çapa Duyemîn, Çapxana Sîtav, Enqere, 176.

¹⁵⁶ Dîmen ‘Ebdulla ‘Umer (2009), *Hevalkarê Çewayî Di Diyalêkta Serî ya Zimanê Kurdî Da*, Nameya Mastirê, Kolêja Edebê, Zankoya Duhokê, 4.

¹⁵⁷ ‘Ebdulselam Necmeddîn ‘Ebdulla û Selwa Ferîq Salih (2010), *Rêzîmana Kurdî (Bo Zarokan)*. Çapa Yekemîn, Çapxana Hacî Haşim, Hewlêr, 99.

¹⁵⁸ Bavê Nazê (2012), *Rêzîmana Kurdî (Teorî û Praktîk)*, Çapxana Hewar, Duhok, 93.

çendîyê derdixin.”¹⁵⁹ re tê gotin. Di vê pênaseyê de jî dîsa peyv bi dem, cî û rewşê ve bi hev re hatiye pênase kirin.

Îbrahîm Bîngol “*Hoker ne tenê li lêker, lêkernav, rengdêrê ser, li ser xwe jî tesîr dikin, lê herî zêde ji bo lêkeran tên bikaranîn.*”¹⁶⁰ Di vê şîroveyê de hatîye nêşan dayîn ku hoker di eynî wextî tesîrê li ser xwe jî heye.

Deham ‘Ebdulfettah “*Ew bêjene evin ku bi karan ve girêdayî ne, cih û demên bûyîna wan destnîşan dikin.*”¹⁶¹ Di pênaseya di destê me de jî beje, bi layê cî, dem, deme bûyîne û rewşê ve hatiye girêdan.

Lîjneyek Wezaretî Perwerdehiyê di vî warî de, “*Ew peyve ku demê yan cihê yan çawaniya rûdana karî di ristê da diyar dikin û peywendî bi karî ve heye*”¹⁶² dibêje. Li gor vê nêzîkbûnê hem layê çavanîyê, hem layê cî hem jî bi layê deme ve hatîye girêdan û bi vî şiklî jî hatîye pênase kirin.

Mehmed Tayfun (Malmîsanij) “*Hoker, ev bêjene ku wateya lêker, rengdêr yan jî hokereka din ji aliyê cî, dem, rewş yan jî mêjerê ve diyar dikin.*”¹⁶³ Di vê şîroveyê de hoker ev bêjeyene ku bi wateya lêkerê tên. Di vê rewşê de jî hoker bi aliye cî, dem û rewşê ve mijarê ve girêdayî ye.

Weke di van pênaseyan da ya ku derdikeve holê ew e. Hoker weke beşeka axivîne, peyveke wesfa lêkerî dike û bi wê sedemê ve dibe temamkerê karî.

2.2. Ji Alîye Wateyê ve Cureyên Hoker

Bi alîyê wateyê ve hoker wek cureyên xware pêk tên.

2.2.1. Hokerên Demê (Katî)

Di zimanê Kurdî da hejmara pênaseyên bo hokerên katî gelek in. Em ê li vira behsa hinekan bikin.

¹⁵⁹ Lîjneyek Ji Wezaretî Perwerde (2013), *Ziman û Edebê Kurdî*, Pola Heştê Binerretî, Çapa Pêncê, Çapxana Almistiqbil, Lubnan, 91.

¹⁶⁰ Îbrahîm Bîngol (2017), *Rêzimana Kurmancikî (Zazakî) Ya Devoka Gimgimê*, Teza Doktorayê, Zankoya Zaxoyê, Duhok, 104.

¹⁶¹ Deham ‘Ebdulfettah (2012), *Karlêker Di Zimanê Kurdî De (Kurmancîya Jorîn)*, Çapa Yekemîn, Çapxaneyê Hecî Haşim, Hewlêr, 309.

¹⁶² Lîjneyek Le Wezaretî Perwerde (1998), *Rêziman û Edebê Kurdî*, Peymangeha Melbendîya Mamostayan, Duhok, 85.

¹⁶³ Mehmed Tayfun (Malmîsanij) (2018), *Rêzimana Kirmancikî (Zazakî) Berawirdkirdin Ligel Kirmanciyê*, Çapa Yekemîn, Senterê Zaxo Bo Vekolînê Kurdî, Duhok, 212.

Sadiq Behaeddîn Amêdî “*Ew hevalkare yê ku dem û çaxa rûdana kirinê destnîşan dikin.*”¹⁶⁴

‘Ebdulselam Necmeddîn ‘Ebdulla û Selwa Ferîq Salih “*Ew hevalkare yê ku demê rûdana karî diyar dikin.*”¹⁶⁵

Lîjneyek le wezaretî perwerde “*Ew hevalkare yê ku demê rûdana karî di nav ristê da aşkera dikin.*”¹⁶⁶

Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw “*Bi van hevalkarane dewtirê, ku katî rûdanî kar destnîşan dikin.*”¹⁶⁷

Nezîr Ocek “*Ev cure hoker wateya lêkerê ji aliyê demê ve nîşan didin.*”¹⁶⁸

Lîjneyek Ji Wezaretî Perwerde “*Ew hevalkare ku demê rûdana karê risteyê derdixe û nîşan dide û dibe tamamkerê karê risteyê.*”¹⁶⁹

Ji bo pênasê hevalkarê demî Mehmed Tayfun (Malmîsanij) jî wiha rawe dike, “*Hokerên demî, wateya lêkeran ji aliyê demê ve diyar dikin.*”¹⁷⁰

Wate hokerê demkî, peyveke dema rûdana wî karî destnîşan dike. Ev cureyê hokerî rêjeya bikaranîna wê di axivîn û nivîsînê da pir e. Di wan hemî pênasêyan de hoker wekî beşeke girîng ya rêzimanî hatîye dest nîşan kirin. Sedem vê jî bi çend cureyan ve û bi her aliyên têkildar ve hatiye pênasê kirin. Ev pênasêkirin hem di Kurdîya jorîn hem jî li gor Kurdîya naverast hatiye pênasê kirin.

Di Kurmanciya serî ya zimanê Kurdî da hokerên katî yekser ji wan nimûneyan pêk tê. “Îro, evro / evru, niha / niho, duhî / duhê, pêr, şevê, sipêdê, siba, berê, êvarê, êvara, kingî, subehî, henûke, îsal, betirpêr, dûsube, sêsube, pişitî

¹⁶⁴ Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancî Ya Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Çapa Yekemîn, Çapxana Dar Şûun el-Seqafiye el-'Ame, Bexda, 419.

¹⁶⁵ ‘Ebdulselam Necmeddîn ‘Ebdulla û Selwa Ferîq Salih (2010), *Rêzimana Kurdî (Bozarokan)*. Çapa Yekemîn, Çapxana Hacı Haşim, Hewlêr, 99- 100.

¹⁶⁶ Lîjneyek Le Wezaretî Perwerde (1998), *Rêziman û Edebê Kurdî*, Peymangeha Melbendîya Mamostayan, Duhok, 85.

¹⁶⁷ Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî (Kirmancî Serû)*, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 116.

¹⁶⁸ Nezîr Ocek (2019), *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, Çapa Duyemîn, Çapxana Sîtav, Enqere, 180.

¹⁶⁹ Lîjneyek ji Wezaretî Perwerde (2015), *Ziman û Edebê Kurdî, Pola Yazdê Amadeyî*, Çapa Sêyemîn, Çapxana Wezaretî Perwerde, 76.

¹⁷⁰ Mehmed Tayfun (Malmîsanij) (2018), *Rêzimana Kirmancîkî (Zazakyê) Berawirdkirdin Ligel Kirmanciyê*, Çapa Yekemîn, Senterê Zaxo Bo Vekolînîna Kurdî, Duhok, 221.

heftîyekî, pişitî salekê, pişitî heyvekê, vê havînê, vê zivistanê, havîna par, zivistana par, peyîza par, bihara par, havîna bê, vê sipêdê, sube, sipêdê, şevê dî, şeva dî, şevza dî, berê, berî nuke, nuke, bêhnekê, car car, dîsa, heta neha, hinek caran, heta sipêdê, pişitî nîvro, jimêje, nîv şev, rojê, pişitî hîngê, berî hîngê, rojekê, carekê, cîkî, demekî, wextekî, lezekî, şevêkê, se'etekê, hemî gava, ji niha pêve, heyva gulanê, nîvro, îşev, payîza bê, zivistana bê, bihara bê, duhî spêdê, şevêk dî, çar mehan, bi caran, bi sibat, bi şevan.”

Mînak

* *Em dê **havînê** biçîne gundî.*

* *Ez **sipêdehiyan** werzîşê dikim.*

* ***Hinek caran** ez diçime sinema yê.*

Di risteya yekem da, bersiva pirsiyara “kengê?” dibe “**havînê**” û lewma “**havîn**” dibe hokerê demî. Di risteya duyem da, bersiva pirsiyara “kengê?” dibe spêdehiyan û lewma “**spêdehiyan**” dibe hokerê demî. Di risteya sêyem da, bersiva pirsiyara “kengê?” dibe “**hinek caran**” lewma “**hinek caran**” wek hokerê demê tê zanîn.¹⁷¹

Mînak

Ez **duhê sa'et deh hatim.*

Serwer **subehî dê vegerine mal.*

****Betirpêr** ez nesaxbum.*

****Taze** baran barî.*

Eve **ji mêjve li ser pîyekî rawestayî ma.*

****Parnapêrar** befrekî estûr barî.*

¹⁷¹ ‘Ebdulsalam Necmeddîn ‘Ebdulla û Selwa Ferîq Salîh (2010), *Rêzimana Kurdî (Bo Zarokan)*, Çapa Yekemîn, Çapxana Hacî Haşim, Hewlêr, 100.

*Ew çend rojên di diçîte cihê xwe.

*Kengê dê serî me dê?

Di van nimûnên jorê da “ew nimûneyên serî” da diyar dibe ku “duhê, subehî, betirpêr, taze, jî mêjve, parnapêrar, cihê, kengê”, ku me'na demê diyar dikin û demê rûdana kirinê diyardikin ji ber vê yeke jî katê rûdanî kareke diyar dikin. Ji ber vê jî dibine hoker (hevkar) û ji ber karê ku pê radibin û “bi pêyva ku rol dibînin” jêra dibêjinê hokerê demî.¹⁷²

Mînak

*Îsal baran kêma barî.

*Ez par çûm serdana Laleşê.

*Demeke nêzîk em ê hevbibînin.

*Ew ê îsev biçin Şamê.

*Pêrar vî çaxî em li Hewlêrê bûn.

*Havînê koçer diçin zozanan.

Hinek têrkerên dîtir jî di pêvajoya hevokan de tên bikaranîn û wateyên wan firehtir û zengîntir dikin. Wek raweya palvedanê “biresera nerasterast / nedurust.”

Mînak

*Dara sévan bi kulîlkan xemilîye.

*Em çûn havîngeha Başûtê.¹⁷³

Ev nimûnên risteya demê.

*Helebce li sazde Adarê hatîye kîmya barankirin.

¹⁷² Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancî Ya Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Çapa Yekemîn, Çapxana Dar Şûun el-Seqafiye el-'Ame, Bexda, 419.

¹⁷³ Deham 'Ebdulfetah (2012), *Karlêker Di Zimanê Kurdî De (Kurmançiya Jorîn)*, Çapa Yekemîn, Çapxaneyê Hecî Haşim, Hewlêr, 310- 311.

*Şivan **ji mêjve** nivistîye.

*Heval **subehî** dê vegere Duhokê.

Van risteyên serî da kar bi hokerî hatiye temamkirin, di risteya yekem da bêjeya “**li şazdê adarê**” demê kîmya barankirina bajarê Helebce nîşan dide û derdixe meydane. Lewma jêra dibêjinê hokerê demî “**kafî**” û dibe temamkerê karê risteyê. Di risteya dûyem da peyva “**ji mêjve**” demê nivistina “**şivan**” î nîşan didin û derdixin. Lewma hokerê demê yê temamkerê karê risteyê ye. Di risteya sêyem da peyva “**subehî**” demê wergerîya ye “**heval**” î bo bajêrê Duhokê nîşan dide, jiber hindê hokerê demî ye, temamkerê karê risteyê ye.¹⁷⁴

Mînak

***Duhî** ezmûnên me bi dumahî hatin.

***Saleka dî** Nîwar dêçîte zanîngehê.

***Evro** gelên cîhanê bo aştiyê xebat dikin.

***Berî niha** ez li gundî bûm.

***Roja evnî** dêçîne seyranê.

*Nîwar **dereng** gehişt.

Di risteyên serî da hokerên “**duhî, saleka dî, evro, berî niha, roja ‘eynî, dereng**” her yek ji wan sînorekî bo dema rûdana karî bixwe digire û ji vî layî ve dibine temamkerê wan karan. Vêca bi wê peyva ku demê rûdana karê risteyê derdixin û wateya wê jî temam dikin jê re dibêjinê “hokerê demî.”¹⁷⁵

Mînak

***Duhê** cotyar genim cencer kir.

***Evro** Peyman deçête zanîngehê.

¹⁷⁴ Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde (2015), *Ziman û Edebê Kurdî, Pola Yazdê Amadeyî*, Çapa Sêyemîn, Çapxana Wezaretî Perwerde, 75- 76.

¹⁷⁵ Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde (2013), *Ziman û Edebê Kurdî*, 92 -93.

Di wan risteyan da hokerên “*duhî, evro*” her yek sînorek ji bo rûdana karekî dadinên û ev rûdana jî dibine tewawkerê karan. Ku ew wûşeya katê rûdana karekî di risteke da derdixe û wateya wê jî tewaw dike, ji wan peyvane re jî dibêjinê “hokerê demî.”¹⁷⁶

Mînak

*Ez subehî dêçime zankoyê.

*Li havînê piranîya xelkê li serbanî dinivin.

Dîsa ev riste bo hokerên demî hatine bikaranîn, peyvên “*subehî, li havînê*” her yek jî sinorekê bo rûdana karan datîne û ev rûdanan jî dibine tewawkerê karan. Îcar ew wişeyan, ku katê rûdana karê ristê derdixe û wateyê jî tewaw dikin bi van peyvane jî dibêjinê “hokerê demî.”¹⁷⁷

Kewate hokerê demî ew hokerin ku dema rûdana karî di nav ristê da aşkera dikin.”

Mînak

*Îsev berf dibarî.

*Par çûm bo Akrê.

*Duhê li peymangeya mamostayan bûm.

*Evro Serbest berî hevalên xwe hat.

2.2.2. Hokerên Cih û Berekê (Şiwênî)

Di zimanê Kurdî da hejmara pênaseyên bo hokerên cih û berekê (şiwên) gelek in. Em ê li vira behsa hinekan bikin.

¹⁷⁶ Lîjneyek ji Wezarea Perwerde (2017), *Ziman û Edebê Kurdî*, Pola Heştê Binerretî, Çapa Deyem, Çapxana Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 89- 90.

¹⁷⁷ Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî (Kirmancî Serû)*, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 116.

Sadiq Behaeddîn Amêdî, “*Ew hevalkareyê cihê rûdan yan cihê lê buyîna karî ya kirinê destnîşan bike.*”¹⁷⁸

‘Ebdulsalam Necmeddîn ‘Ebdulla û Selwa Ferîq Salih “*Ew hevalkare ye, ku cihê rûdana karî nîşan didin.*”¹⁷⁹

Lîjneyek le wezaretî perwerde “*Ew hevalkare ye, ku cihê rûdana karî di nav ristê da nîşan didin.*”¹⁸⁰

Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw “*bi van hevalkarane dewitrêt ku şiwênî rûdanî kareke destnîşan bikin.*”¹⁸¹

Lîjneyek Ji Wezaretê Perwerde “*Ew hevalkare ku cihê rûdana karê risteyê nîşan didin û derdixin.*”¹⁸²

Nezîr Ocek “*Ev cure hokere, cih û bergeha karê ku tê kirin, nîşan didin.*”¹⁸³

Di warê wan mijaran zimanzanên Kurdîyê di derbareyê hokerê cihî, peyveke cihê rwîdan û encamdana wî karî destnîşan dike. Ev cureyê hokerê rêjeya bikaranîna wê di axivîn û nivîsînê da pir e. Wekî din di wan hemî pênaseyan de nêzîkbûnên cûda yên Kurdiyanaverast û Kurdîya Jôrîn heye.

Di Kurmanciya serî ya zimanê Kurdî da hokerên şwênî (cih û berekê) ji wan pêk hatine.

“Ji xarê, li xarê, nav / di nav, jêrê, jorê, binra, vira, dûrva, nik / kin, bi rex, li xwarê, bin, li bin, vir, wir, ber derî, pişt xanî, rex aşî, li mal, derve, ser pirê, li hindav, rojava, paşve, pêşve, dûrî, çepê, rast, dereve, jûrve, li jora, diser, li nav, serxan, li nik, li jêr, li berî, li serve, li wêrê, li verê, vê derê, ku da, kîrê, ji kî derê, ji kîrê, li kîrê, li vêre, li wêrê, li derve, vir, wir, nav rezî, li jora kuçkî, bin mêzê, nêzî... hwd.”

¹⁷⁸ Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancî Ya Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Çapa Yekemîn, Çapxana Dar Şûun el-Seqafiye el-’Ame, Bexda, 418.

¹⁷⁹ ‘Ebdulsalam Necmeddîn ‘Ebdulla û Selwa Ferîq Salih (2010), *Rêzimana Kurdî Bo Zarokan*, Çapa Yekemîn, Çapxana Hacı Haşim, Hewlêr, 101.

¹⁸⁰ Lîjneyek Le Wezaretî Perwerde (1998), *Rêziman û Edebê Kurdî*, Peymangeha Melbendîya Mamostayam, Duhok, 85.

¹⁸¹ Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî (Kirmancî Serû)*, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 117.

¹⁸² Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde (2015), *Ziman û Edebê Kurdî*, Polla Yazdê Amadeyî, Çapa Sêyemîn, Çapxana Wezaretî Perwerde, 80.

¹⁸³ Nezîr Ocek (2019), *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, Çapa Duyemîn, Çapxana Sîtav, Enqere, 180.

Mînak

*Kawe li bin darê dixunît.

*Azad li tensîta min rawesta bû.

*Melevan di nav avê da bû.

*Em ji dûr hatibûn.

Ev risteyên serî da hokerên “**li bin darê, li tensît, di nav avê da, ji dûr**” her yek ji wan sinorekî bo cihê rûdana wateya karî dadinîn û ji vî layî ve dibine temamkerê wan karan. Vêca ev peyva cihê rûdana karê risteyê da derdixin û wateya wê jî temam dikin û jêre dibêjinê “hokerê cih.”¹⁸⁴

Mînak

“Tehqîq melek û ya perî bûn

Lewra ku li nav û gil perî bûn”¹⁸⁵

“Wekî gurgî li nav berxa wekî teyrî li ser ferxa

Daîm didin dewru çerxe şev û roj û meh û sale”¹⁸⁶

“Duhî spêdî li ser banî

Min canek dît ji xew rabû”¹⁸⁷

Di van nimûneyên serî da hemû kar bi hoker va hatîye temamkirin, di nimûneya yekem da peyva “**li nav**” cihê rûdana karê di risteyê da derdixin. Lewma hokerê cihê ne. Dibine temamkerê karê risteyê. Di nimûneya duyem da peyvên “**li nav, li ser**” cihê rûdana karê risteyê derdixin. Lewma hokerê cihê ne, dibine temamkerê karê risteyê. Di nimûneya sêyem da peyva “**li ser**” hokerê cihê ye û dibe temamkerê karê risteyê.¹⁸⁸

¹⁸⁴ Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde, (2015), *Ziman û Edebê Kurdî, Pola Yazdê Amadeyî*, Çapa Sêyemîn, Çapxana Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 92- 93.

¹⁸⁵ Goran, (1980), *Dîwana Goran*, Çapxana Korri Zanyarî Îraq, Bexda, 28.

¹⁸⁶ Nureddîn Birîfkanî (2002), *Dîwana Şêx Nureddînê Birîfkanî*, Çapa Yekemîn, Çapxana Aras, Hewlêr, 127.

¹⁸⁷ Ehmed Nalbend, (1997), *Baxî Kurda*, Çapa Yekemîn, Çapxana Duhok, 13.

¹⁸⁸ Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde, (2015), *Ziman û Edebê Kurdî*, 79- 80.

Mînak

**Qelemê min li nik Azadî bû.*

**Bo layê rastê here.*

Bersiva pirsiyara “li kîve?” di risteya yekem da, “**li nik**”e. Lewma dibe hokerê cihê û bersiva pirsiyara “li kîve?” didin. Di risteya duyem da bersiva pirsiyara “bo kîve?” dibe “**layê rastê**” û lewma dibe hokerê cihê û berekê.¹⁸⁹

Mînak

**Heval li pişt xanî ronîştiye.*

**Dariştineke li ser defterê nivîsîn.*

Eger berê xwe bidine risteyên serî da hokerên “**li pişt, li ser**” her yek ji wan sînorekî bo cihê rûdana wateya karê datîne û ji vî layî ve dibine temamkerê wan karan. Vêca ew peyva cihê rûdana karê risteyê derdixin û wateya wê temam dikin jê re dibêjinê “hokerê cihê.”¹⁹⁰

Mînak

**Ez duhê hatme vêre.*

**Serdar di hindurî malê rûniştî ye.*

**Hevniid li rex min razaye.*

**Zaro di ser da rûnişti bû.*

**Hevalê Réberî li nik min bû.*

¹⁸⁹ ‘Ebdulselam Necmeddîn ‘Ebdulla û Selwa Ferîq Salîh (2010), *Rêzimana Kurdî Bo Zarokan*, Çapa Yekemîn, Çapxana Hacî Haşim, Hewlêr, 101.

¹⁹⁰ Lîjneyek ji Wezareta Perwerde (2016), *Ziman û Edebê Kurdî, Pola Yazdhemê Amadeyî*, Çapa Deyem, Çapxana Wezareti Perwerde, Hewlêr, 82- 83.

Ev bêjeyên li vie wek mînak hatiye dayîn jî rûdana kirinê destnîşan dikin.
“*Vêre, hindurî, rex, ser da, li nik*” hokerê cihê ye.¹⁹¹

Mînak

**Min pirtûk danî ser mase yê.*

**Hûn çûn ber avê, nêzî gola Wanê.*

**Qamişlo dûrî Mûşê ye.*

**Ez ê çepê xwe bizvirim, tu rast here.*

Ev bêjeyên bênê jî rûdana kirinê destnîşan dikin,

Mînak

Ser, nêzî, dûrî, çepê, rast. Her yek ji wan sînorekî bo cihê rûdana wateya karî dadinin û dibine temamkerê wan karan ku jê re dibêjinê “hokerê cihê.”¹⁹²

Mînak

**Qutabîyeke li bin darê dixunît.*

*Peyva “li bin” hokerê cihê ye.*¹⁹³

Mînak

* *Karwan li ber derga runîşti ye.*

* *Mamosta li tinîsta min derbas bû.*

* *Şivan li jêr kepire (sîdank) nivistî ye.*

* *Şermînê qazan dana ser agirê.*

¹⁹¹ Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancî Ya Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Çapa Yekemîn, Çapxana Dar Şûun el-Seqafiye el-’Ame, Bexda, 418.

¹⁹² Deham Bedulfetah (2012), *Karlêker Di Zimanê Kurdî De (Kurmancîya Jorîn)*, Çapa Yekemîn, Çapxaneya Hecî Haşim, Hewlêr, 310.

¹⁹³ Lîjneyek Ji Wezaretê Perwerde (2017), *Ziman û Edebê Kurdî*, Pola Heştê Binerretî, Çapa Deyem, Çapxana Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 89.

* *Rojan roj li pey tén.*

* *Gulan bixine nay guldankê.*

* *Rojnameya min xiste ser mêzeke.*

2.2.3. Hokerên Çawanîyê (Çawayî)

Di zimanê Kurdî da hejmara pênasayên bo hokerê çawanîyê gelek in. Em ê li vira behsa hinekan bikin.

Sadiq Behaeddîn Amêdî “*Ev hevalkarê çawayî ya kirinê anku awayê rûdanê diyar dikin.*”¹⁹⁴

‘Ebdulselam Necmeddîn ‘Ebdulla û Selwa Ferîq Salih “*Ew hevalkare yê ku çawatiya rûdana karî nîşan didin.*”¹⁹⁵

Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde “*Ew hevalkar ku çawaniya rûdana karê risteyê nîşan didin û wesfa karê risteyê dikin.*”¹⁹⁶

Nezîr Ocek “*Çendî kû piraniya wan rengdêr in jî lê gava kû rengdêr tén berîya lêkeran dibin hokerên çawanîyê û çawaniya lêkeran nîşan didin.*”¹⁹⁷

Şîlêr Resûl Berzincî “*Ew hevalkareyê ku çawayîya rûdana karî yan ronodana karî di ristê da diyar diket.*”¹⁹⁸

Ev cureyê hokerê di nivîsandin û axivîne gelek zêde ye. Di wan pênasayan de bi piranî gava rengdêr tén berîya lêkeran çawa dibe lêkerên çawanîyê dayîne nîşandayîn. Sedem vê jî nêzîkbûna her zîmanzanekî bi awayeke zanistî pêvîstî li ser hurbûna mijarê dike.

¹⁹⁴ Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmançî Ya Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Çapa Yekemîn, Çapxana Dar Şûun el-Seqafiye el-’Ame, Bexda, 418.

¹⁹⁵ ‘Ebdulselam Necmeddîn ‘Ebdulla û Selwa Ferîq Salih (2010), *Rêzimana Kurdî Bo Zarokan*, Çapa Yekemîn, Çapxana Hacî Haşim, Hewlêr, 102.

¹⁹⁶ Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde (2015), *Ziman û Edebê Kurdî, Pola Yazdê Amadeyî*, Çapa Sêyemîn, Çapxana Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 83.

¹⁹⁷ Nezîr Ocek (2019), *Waneyên Rêzimana Kurmançî*, Çapa Duyemîn, Çapxana Sîtav, Enqere, 178-179.

¹⁹⁸ Şîlêr Resul Berzincî (1989), *Awelguzare Le Zimanî Kurdî Da*, Nameya Mastirê, Kolêja Edebê, Zankoya Selaheddîn, Hewlêr, 74.

Di Kurmanciya serî ya zimanê Kurdî da hokerên çawanîye ji wan pêk tên, “Bilez / belez, bi ciwanî, bi xweşî, bi jîrî, baş, li nişkava, li hevra, bi hevra, pêkve, hêdî, biqencî, bi dînî, bi paqijî, bi dilgeşî, ji birsa, bi azadî, bi dilsozî, kêr, bi siyarî, li serxwe, bi erzanî, bi dostî, bi hevaltî, bi hostatî, bi dujminatî, bi nexweşî, bi toreyî, jîrane, mêrane, bi erzanî, bi dilreqî, bi tevayî, bi rû.”

Mînak

*Ez dergeh **baş** daxistiye.

*Me wane **bilez** nivîsî.

*Miletê kurd **Sêrane** li bihara sala 1991 serhilda.

*Nêçîrvan **bi siyarî** çû bo nêçîrê.

*Em **bi serberzî** dijîn.

Heke pirsiyar bikin ez çawa dergeh daxistiye? Yan me waneya xwe çawa nivîsî? Yan milletê kurd çawa serhilda? Yan Nêçîrvan çawa çûbo nêçîrê? Yan em çawa dijîn?

Em di van risteyan da dibînin ku di bersiva pirsiyara risteya yekem da “**baş**”, dîsan em dibînin ku ya duyem “**bilez**”, ya sêyem “**şêrane**”, ya çarem “**bi siyarî**” ya pêncem “**bi serberzî**” ye.

Her yek li cihê xwe da wek hokerekî wesfa çawayî ya rûdana risteyên xwe dikin û dibine temamkerê ramana karên xwe. Ji ber vê çendê jî dibêjin her yek ji wan “hokerên çawanîye ye.”¹⁹⁹

Mînak

*Nazdar **bi lez** çû qutabxanê.

*Firavînê **bi germî** bixwe.

Eger berê xwe bidine wan du ristaneyan. Evan risteyan hokerên “**bi lez, bi germî**” her yek ji wan sînorek bo cihê rûdana wateya karî da dadine û dibine temamkerê risteyê û jê re dibêjinê “hokerê çawayî.”²⁰⁰

¹⁹⁹ Lîjneyek ji Wezareta Perwerde (2011), *Ziman û Edebê Kurdî, Pola Dehê Amadeyî, Çapa Yekemîn, Çapxana Almusteqlbel, Lubnan, 84.*

Mînak

Dilanê hozan **ciwan xwand.*

Cotyari fêqîyên xwe **bi erzani firot.*

Heval **bi dilgeşî çûye mal.*

Ev dariştina **baş hatiye nivîsîn.*

Di van nimûneyên serî da karên wan bi hokerekî hatiye temamkirin, di nimûneya yekem da peyva “**ciwan**” çawayîya rûdana karê xwandinê nîşan dide. Lewma hokerî çawaniye û temamkerê karê risteyê ye. Di nimûneya duyem da “**bi erzani**” çawaniya firotina fêqî diyar dikin, lewma hokerê çawayî ye û temamkerê karê risteyê ye. Di nimûneya sêyem da peyva “**bi dilgeşî**” çawaniya çûna Hevalî nîşan didin bo malê. Lewma hokerê çawayê û temamkerê karê risteyê ye. Di nimûneya çarem da peyva “**baş**” çawaniya nivîsîna dariştinê derdixe. Lewma hokerê çawaniye û temamkerê karê risteyê ye.²⁰¹

Mînak

Ez **bilez çûme nav baxçe.*

Taqîkirinên (ezmûn) evê salê **bi xweşî bi rê ve çûn.*

Bersiva pirsiyara “çawa?”, di rista yekem da, “**bi lez**” e. Lewma dibe hokerê çawaniyê û bersîva pirsiyara “çawa?”, di rista duyem da, “**bi xweşî**” ye û lewma dibe hokerê çawaniyê.²⁰²

Mînak

Wê çîrok **xweş got.*

Nazdar **bilez çû mal.*

²⁰⁰ Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde (2017), *Ziman û Edebê Kurdî, Pola Heştê Binerretî*, Çapa Deyem, Çapxana Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 90.

²⁰¹ Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde (2015), *Ziman û Edebê Kurdî, Pola Yazdê Amadeyî*, Çapa Sêyemîn, Çapxana Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 82- 83.

²⁰² ‘Ebdulsalam Necmeddîn ‘Ebdulla û Selwa Ferîq Salîh (2010), *Rêzimana Kurdî (Bo Zarokan)*, Çapa Yekemîn, Çapxana Hacî Haşim, Hewlêr, 102- 103.

Befir li Kurdistanê **gelek dibare.*

Di van nimûneyên serî da hokerên “**xweş, bilez, gelek**” her yek ji wan sînorekî bo çawayiya rûdana wateya karî dadine û ji vî layî ve dibine temamkerê wan karan. Vêca ew peyva çawayiya rûdana karê di risteyê de derdixin û wateya wê jî temam dikin, jê re dibêjinê “hokerê çawanî yê.”²⁰³

Hokerê çawanîyê, ew hokereyê ku çawanîya rûdana karî yan rûnedana karî di ristê da diyar dikin û bara pitir sere tê da navê hevalnavî ye, angu di beşên axiftinê da hevalnav çalaktirîn beş “kereste”ye bo gêrana rolê hokerê çawanîyê²⁰⁴ û amûrek jî dikeve berî wê.²⁰⁵ Lêbelê hemû deman merc nîne. Çimkî hinek peyv hene bê amûr beşdarîyê dagêrana rolê hokerê çawanîyê da dikin.

Mînak

**Hêdî, piçek, gelek, ciwan, ... hwd.*

Mînak

Lana **ciwan runşit.*

Mîna **hêdî ji serbanî hate xwarê.*

Kewate di evan nimûnan da peyvên “ciwan, hêdî” bi hokerê çawayî dihêne hijmartin û hîç amrazek jî neketiye berahiya wan, anku bi tenê wek wişeka sade bi rolê hokerê çawayî rabune.

Hokerê çawayî hemî deman di nav ristê da dibe bersiva pirsîyara “çawa?”²⁰⁶

Mînak

Hevalî **çawa wane nivisî?*

Ev kure **çawa nivistiye?*

²⁰³ Ljineyek ji Wezaretê Perwerde (2013), *Ziman û Edebê Kurdî, Pola Heştê Amadeyî*, Çapa Pêncê, Çapxana Elmusteqlê, Lubnan, 92-93.

²⁰⁴ Şilêr Resul Berzincî (1989), *Awelguzare Le Zimanê Kurdî Da*, Nameya Mastirê, Kolêja Edebê, Zankoya Selaheddîn, Hewlêr, 74.

²⁰⁵ Awaz Heme Sidiq (1996), *Rêzbûnî Kereste Di Zimanê Kurdî Da*, Nameya Mastirê, Koleja Edibe, Zankoya Selaheddîn, Hewlêr. 63.

²⁰⁶ D. Crystal (2000), *The Cambridge Encyclopedia Of The English Language*, Italia, 8.

*Evro dê çawa çîne Parîs?

Eger berisiva evan ristan bidin, wisa hatiye gotin.

*Hevalî bilez wane nivisî.

*Ev kure ciwan nenivistiye.

*Evro bi firokê diçîne Parîs.

Eger temaşeya evan ristan bikin, dibînîn ku peyvên “**bi lez, ciwan, bi firokê**” Hokerên çawaniyê ne. Çimkî bûne bersiva pirsiyara “çawa?” û çawayiya rûdana karî di ristê da diyarkirine. Bo nimûne di rista yekem da çawaya “**nivêsinê**” diyar kirîye, ku ew jî peyvya “**bi lez**” bikarhatiye û bûye bersiva pirsiyara “çawa?”

Herwiha di rista duyem û sêyem da çawanîya rûdana “**çûna Parîs**” û çawaniya rûdana “**nenivistinê**” diyar kirîye. Peyvên “**bi firokê, ciwan**” bikaranîne, ku dibine bersiva pirsiyara “çawa?” û ew jî hokerê çawaniyê ne.

Hokerên çawanîyê hemû deman di ristê da dikeve di girêya karî da,²⁰⁷ ango dişên bêjîn hokerê çawanîyê di ristê da girêya navî ye di girêya karî da. Ango ew risteyên ku maneya xwe bi temamî nadin yan ron nakin bi gotineka din havokên temam nîn in.

Mînak

*Ez bilez ji mal hatim.

Herwisa dişên hokerê çawayî di nav ristê da jê bibin, bê hîç kartêkirineka rêzimanî li ser wateyê bihête kirin.²⁰⁸

Mînak

*Heval sipêdê bilez çû qutabxanê.

Eger hoker jê bibin dê bibe.

²⁰⁷ ‘R.I.Trask (1993), *A Dictionary Of Grammatical Terms In Linguistics*, Firsit Published, London, 10.

²⁰⁸ Hamza Othman Moho Goran (1997), *A Contrastive Study Of Manner Adverbials in English and Standard Kurdish Master Of Artis*, College Of Artis, University Of Salahaddin, Hewler, 47.

**Heval sipêdê çû qutabxanê.*

Kewate bi çî rengî kar nake ristê, ne ji layê rêzimanî ve û ne ji layê wateyê ve. Çimkî hokerê çawayî kerestekê ne serekîye di nav ristê da. Evca jê birina wî nabe egerê têkdana wata risteyê.

2.2.4. Hokerên Çendaniyê

Di zimanê Kurdî da pênase bo hokerên çendaniyê gelek in. Emê li vira hinekan bînin ber biçav.

‘Ebdulsalam Necmeddîn ‘Ebdulla û Selwa Ferîq Salih, “*Ew hevalkare yê ku radê rûdana karî nîşan didin.*”²⁰⁹

Lîjneyek Ji Wezaretê Perwerde “*Ew hevalkare di risteyê da çendayetiya rûdana karê tamam nîşan didin û dibin tamamkerê karî.*”²¹⁰

Îbrahîm Bîngol “*Hoker wateya lêkerî ji aliyê kêma û zêdeyiyê ve diyar dikin.*”²¹¹

Nezîr Ocek “*Lêker, lêker nav, rengdêr, hokeran ji aliyê mêjer û asta karê ku hatiye kirin, tê kirin û bê kirin ve nîşan didin.*”²¹²

Ev hoker peyvek e, hejmarî û rêjeya encamdana wî karî destnîşan dike. Sedem vê jî gava em li wan pênaseyan dinihêrîn dibinin ku bi layê öendiniyê ev hoker bi destê zimanzanan de qaseke din hatiye pênase kirin. Di vê pênasekirinê de hoker bi layê mêjer û asta kare ku hatiye kirin tê şîrove kirin.

Di Kurmanciya serî ya zimanê Kurdî da hokerên çendaniyên ji van pêk hatine. “Pirî, behra pitir, gelek, birastî, hinek, êkcar, fireh, gelek, pirtekî, pîçek, kêma, hinekî, heyvekî, çendekî, hinekî, pir, tijî wêrê, bi tekozî, zehif, zêde, hinde, pir.”

Mînak

²⁰⁹ ‘Ebdulsalam Necmeddîn ‘Ebdulla û Selwa Ferîq Salih (2010), *Rêzimana Kurdî Bo Zarokan*, Çapa Yekemîn, Çapxana Hacî Haşim, Hewlêr, 103.

²¹⁰ Lîjneyek ji Wezaretê Perwerde (2015), *Ziman û Edebê Kurdî, Pola Yazdê Amadeyî*, Çapa Sêyemîn, Çapxana Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 94.

²¹¹ Îbrahîm Bîngol (2017), *Rêzimana Kurmancî (Zazakî) Ya Devoka Gimgimê*, Teza Doktorayê, Zankoya Zaxoyê, Duhok, 109.

²¹² Nezîr Ocek (2019), *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, Çapa Duyemîn, Çapxana Sîtav, Enqere, 181.

*Duhî tijî wêrê mirov hatbûne ser cadê.

*Ez gelek hez ji mozan dikim.

Bersiva pirsiyara “çend?” di rista yekem da, “tijî wêrê” ye lewma dibe hokerê çendanîyê di rista duyem da, bersiva pirsiyara “çend?” û “gelek”e. Lewma dibe hokerê çendî.²¹³ Wek van nimûneyên xwarê gelek in.

Mînak

* Rûken kêm dixuyine, lê Lilav pir dixuyine.

* Wan ev pirtûk gelek baş nenivîsine.

* Te zêde zêde xwe êşand.

* Reşo bi qasî hûtekî qelewe.

* Min herî zêde ji Ehmedê Xanî hez kiriye.

* Hin mirov ji me pitir dixwunin.

* Pir bijî, hinek bijî, tu dê bimirî.

* Hêstir çiqas nêrgêş be, çiqas qelew be, tu pirsra eslê wî bikî dîsa kere.

* Ku serî sax be, dê gelek tiştan dibîne.

Mînak

“Min dilberek wek dur heye

Mehbub û şîrîn sur heye

Husn û cemalek pur heye

Belqîs sîfet mesken seba”²¹⁴

“Utu bend dibî ziman lalome

Belê fe'mi dikem ez ji ruhê te

²¹³ ‘Ebdulsalam Necmeddîn ‘Ebdulla û Selwa Ferîq Salîh (2010), *Rêzimana Kurdî*, 103.

²¹⁴ Melayê Cizîrî (1982), *Dîwana Melayê Cizîrî*, Çapa Yekemîn, Çapxana Siruş, Tehran, 29.

*Belê **kêm** dibhêm xeberê te dûr*

Hezna fikrate, behrabê bu hûr”²¹⁵

Di van nimûneyên serî da karên wan bi hokerekî hatiye tamamkirin. Di nimûneya yekemê da peyva “**pur**” anku “**pir**” hokerê çendanîyê ye, dibe tamamkirina karê “**heye**” ye, çimkî çendayetiya rûdana karê “**heye**” derdixê holê.

Di nimûneya duyem da peyva “**kêm**” hokerê çendanîye, dibe tamamkirina karê “**dibhêm**” ji risteyê ye, çimkî çendayetiya rûdana karê “**dibhêm**” derdixin.²¹⁶

Mînak

Azadî **piçek av vexwar.*

Befr li zozanan **gelek dibarin.*

Eger berê xwe bidine van nimûneyan dibinin.

Ku bersiva pirsiyara risteya yekem da “**piçek**” ya duyem “**gelek**” her yek li cihê xwe da wek hokerê çendanîyê ye rûdana risteyên xwe dikin û dibine tamamkerê ramana karên xwe, jiber vê çendê dibêjine her yekî ji wan “hokerê çendanîyê ye.”²¹⁷

Mînak

Ev xanî **pirî kevne.*

Ez **gelek baştirim.*

Babê min **bitêkozi sax bû.*

Dîlan **bi rastî qeşenge.*

Eger berê xwe bidine risteyên serî dibînin ku peyvên “**pirî, gelek, bi tekozi, bi rastî**” her yek li wanan sînorekî bo cihê rûdana wateya karî datînin û ji vî layî ve

²¹⁵ Casmî Celîlî, (1960), *Rojî Min (Şî'ir)*, Yerîvan, 48.

²¹⁶ Lîjneyek Ji Wezaretê Perwerde (2016), *Ziman û Edebê Kurdî, Pola Yazdehemî Amadeyî*, Çapa Dehemîn, Çapxaneyê Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 92- 93.

²¹⁷ Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî (Kîrmancî Serû)*, Çapxaneyê Rojhilat, Hewlêr, 118.

dibin temamkerê wan karan. Vêca ev peyva cihê rûdana karî di risteyê da derdixin û wateya wê jî temam dikin jê re dibêjin “hokerê çendanîyê.”²¹⁸

Mînak

* *Ev pir dipeyve, hindik guhdarî dike.*

*Wan **gelekî** xwar.

*Xanîyeke **pir** xweşe.

Berê xwe bidin ev risteyên serî dibînîn ku peyvên “**gelek, pir**” her yek sînorekî bo cihê rûdana wateya karî datîne û ji vê layî ve dibin temamkerê wan karan. Vêca ew peyva cihê rûdana karî di risteyê da derdixe û wateya wê jî temam dikin, dibêjinê “hokerê çendanîyê.”²¹⁹

2.2.5. Hokerên Rêxistinê

Di zimanî Kurdî da pênase bo hokerên rêxistinê jî gelek in. Em ê li vira da hinekan bînin berçav.

Sadiq Behaeddîn Amêdî “*Ew hevalkare yê bi rêz û ser û barbarê kirinê destnîşan bike.*”²²⁰

Lîjneyek Ji Wezaretê Perwerde “*Ew hevalkare ku di risteyê da şeweyê rêxistina rûdana karê risteyê derdixin û ramana wî jî temam dikin û hemî gava dibe temamkerê karî di risteyê da.*”²²¹

Ev cureyê hokerê peyveke, şewê û cur û rêxistina wî karî destnîşan dike. Di wan pênaseyan de peyvên kut ê bikar anîn, di nav risteyê amajeyê wisa tîne cî ku maneya risteyê pê temam dibe.

Di Kurmanciya serî ya zimanê Kurdî da hevalkarên rêxistinê ji van pêk tên. “Tav tav, fir fir, sê sê, gav gav, pêkve, bi giştî, hêdî hêdî, kêk kêk, êk êk, du du, baş

²¹⁸ Îbrahîm Remezan Zaxoyî (2008), *Rêzimana Kurdî*, Çapa Yekemîn, Çapxana Xanî, Duhok, 71.

²¹⁹ Îbrahîm Bîngol (2017), *Rêzimana Kurmancîkî (Zazakî) Ya Devoka Gîmgimê*, Teza Doktorayê, Zankoya Zaxoyê, Duhok, 109-110.

²²⁰ Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancî Ya Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Çapa Yekemîn, Çapxana Dar Şûn el-Seqafiye el-'Ame, Bexda, 420.

²²¹ Lîjneyek Ji Wezaretê Perwerde (2015), *Ziman û Edebê Kurdî, Pola Yazdê Amadeyî*, Çapa Sêyemîn, Çapxana Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 90.

baş, ciwan ciwan, law law, parçe parçe, kom kom, kit kit, cot cot, sirê sirê, dem dem, welat welat, sibe sibe, êvar êvar, deqe deqe û hwd.”

Mînak

*Siyar **deste deste** dihatin.

*Baran **tav tav** dibare.

*Genc **kom kom** rawestiyabûn.

*Em wî **car car** dibînîn.

*Hevalan sêv **kit kit** xwarin.

*Ew avê **fir fir** vedixwe.

*Yarîzan **du du** diçine meşqê.

*Kotran **cot cot** dadan.

*Zarok **car car** çûn.

Eger berê xwe bidine risteyên jorê dibînin ku peyvên wek “***deste deste, tav tav, kom kom, car car, kit kit, fir fir, du du, cut cut, çar çar***” rêxistin û rêzbend têdaye ku ji wan ra dibêjine hokerên rêxistin. Çimkî di risteya yekem da peyva “**deste deste**” hokerê rêsixtinê ye, çimkî karê “**dihat**” temamkirîye û şeweyê rûdana karî derxistîye. Eger peyva “**deste deste**” nebûya, me nedizanû ka karê risteyê bi çi şeweyekî rûdaye.

Di risteya duyem da peyva “**tav tav**” hokerê rêxistinê ye, çimkî ramana karê “**dibare**” temam dikan û şeweyê rûdana karê risteyê derdixin, eger peyva “**tav tav**” nebe di risteyê da em nizanîn kar bi çi şeweyekî rû didin.

Di risteya sêyem da peyva “**kom kom**” hokerê rêxistinêye, çimkî şeweyê rûdana karê “**rawestiya bû**” derxistîye û ramana karî jî temamkirîye, eger peyva “**kom kom**” nebûya, me nedizanî karê risteyê bi çi şewe rûdaye.

Di risteya çarem da peyva “**car car**” hokerê rêkxistinê ye. Çimkî şeweyê rûdana karê “**dibînîn**” derdixin û ramana karî jî tamam dikin, eger peyva “**car car**” di risteyê da nebe, em nizanîn karê risteyê bi çi şeweyekî rûdide.

Di risteya pêncem da peyva “**kit kit**” hokerê rêkxistinê ye. Çimkî şeweyê rûdana karê “**xwarin**” derxistîye û ramana wê jî tamamkirîye. Eger peyva “**kit kit**” nebûya, me nedizanî ku karê risteyê bi çi şeweyekî rûdaye.

Di risteya şeşem da peyva “**fir fir**” hokerê rêkxistinê ye, çimkî şeweyê rûdana karê “**vedixwe**” derdixin û ramana karî jî tamam dikin, eger peyva “**fir fir**” di risteyê da nebe, em nizanîn karê risteyê bi çi şeweyekî rûdidin.

Di risteya heftem da peyva “**du du**” hokerê rêkxistinê ye, çimkî şeweyê rûdana karê “**diçine**” derdixin û ramana karî jî tamamkirîye. Eger peyva “**du du**” nebûya, me nedizanî karê risteyê bi çi şeweyekî rûdaye.

Di risteya heştem da peyva “**cot cot**” hokerê rêkxistinê ye, çimkî şeweyê rûdana karê “**didin**” derêxsitîye û ramana karê risteyê tamamkirîye, eger peyva “**cut cut**” nebûya, me nedizanî karê risteyê bi çi şeweyekî rûdaye.

Di risteya nehem da peyva “**çar çar**” hokerê rêkxistinê ye. Çimkî şeweyê rûdana karê “**çûn**” derêxsitîye û ramana karê risteyê tamamkirîye, eger peyva “**çar çar**” nebûya, me nedizanî ka karê risteyê bi çi şeweyekî rûdaye.²²²

Mînak

***Gav bo gavê** pêtir bêhiş dibu.

***Pîç pîçe** befr situr dibe.

Eger berê xwe bidine risteyên serê dibînin peyvên “**gav bo gav, pîç pîç**” rêkxistin û rêzbend têdaye, dibêjine wan hokerên rêkxistin. Ev peyv çimkî karê

²²² Lîjneyek Ji Wezaretê Perwerde (2015), *Ziman û Edebê Kurdî, Pola Yazdê Amadeyî*, Çapa Sêyemîn, Çapxana Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 87- 88.

“**dibu, dibe**” temamkirîye û şêweyê rûdana karî derxistiye. Eger peyva “**gav bo gav, pîç pîç**” nebûya me nedizanî ka karê risteyê bi çi şêweyekî rûdana.²²³

Ev nimûneyên xware da jî zêdetir ron dikin.

*Zarok **du du** çûn, mindal **du du** hatin.

* Kew **bir bir** firîn, kew **pol pol** firîn.

* Ez Serwerî **car car** dibînim, **car car** seran lê didim.

* **Gav bo gavê** pêtir bêhiş dibû, **dem bi dem** zêdetir dibû.

* Baran **tav tav** dibarî, baran **tav tav** dibarê.

* **Sal bi sal** ez palê we me, **sal be salê** zewîyeke dikolim.

* Ez avê **fir fir** vedixwum, Evan avê **qurt qurt** vedixwun.

* **Pîç pîç** befir stûr dibe, **kêm kêm** befir stûr dibe.

Di nimûnaneşên serî da wişeyên wek “**car car, gav gav, gav bo gavê, du du, bir bir, pol pol, dem bi dem, tav tav, taw taw, sal bi sal, fir fir, qurt qurt, kêm kêm**” hokerên rêkxistinê ne.

2.2.6. Hokerên Ho û Mebest (Sebeb û Mebest)

Di zimanî Kurdî da pêname bo hokerê ho û mebest gelek in. Em ê li vira hinekan bînin ziman.

Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw, *Bi wan hevalkarane dewtirêt ku hoy rûdanî karêk ligel mebest le cêbecêkirdinî karêk dixinerû.*”²²⁴

²²³ Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancî Ya Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Çapa Yekemîn, Çapxana Dar Şûun el-Seqafiye el-’Ame, Bexda, 420.

²²⁴ Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî, Çapî Hewtem*. Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 120.

Di Kurmanciya serî ya zimanê Kurdî da hokerên ho û mebest ji wan nimûneyan pêk tên. “Jiber ew, çimkî, ji birsa, ji tirs, bi xwerayî, bi enqest, ji xem û kuvanan, li daxa û hwd...”

Weke derdikeve ev cureyê hokerê gelek bi kêmî ji aliyê zimanvanan ve awir lê hatiyevedan û bas kirî ye. Wate gelek bi kêmî zimanvanan qala vê mijarê yê kirî.

Mînak

****Jiber ewê neçûm Hewlêrê.***

* *Azad nehatîye **çimkî** nexweş e.*

2.2.7. Hokerên Nerênî

Di zimanî Kurdî da pênase bo hokerên nerênî gelek in. Em ê li vira hinekan bînin ziman.

Sadiq Behaeddîn Amêdî “Ewan yên ku bi nerênî ya (nefî) kirinê di hevokekê da bikarênin.”²²⁵ Di vê pênaseyê de mijara hokerên neyînîyê wekî maneya xwe eslî hatiye pênase kirin. Ev jî bi wateya neyînîyê ye.

Di Kurmanciya serî ya zimanê Kurdî da hokerên nerênî ji van nimûneyan pêk tên. “Herçi, çi, bi hîç rengî, hergîz, bi hîç şeweyek, bi hîç kilocêk, çi tişt.”

Mînak

****Herçi*** nebe xwe di me bigehîne.

****Ci pêve*** nehatin ji kêm zaxîye.

****Bi çi rêka*** ez ji dest te qurtal nabim.

Ji van nimûnên jorî, ev bêjeyên, “***herçi, çi.***”²²⁶

*Me ***bi hîç*** kilocêk kar nakin.

²²⁵ Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancî Ya Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Çapa Yekemîn, Çapxana Dar Şûun el-Seqafiye el-’Ame, Bexda, 421.

²²⁶ Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancî Ya Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Çapa Yekemîn, Çapxana Dar Şûun el-Seqafiye el-’Ame, Bexda, 421-422.

Peyva “**bi hîç**” jê re dibêjinê hokerê nerênî.²²⁷ Ev nimûnane yên li xware da zêdetir ronî dikin.

Mînak

* **Her** çî nebit xwe dime bigehne.

* **Hergîz** dest li welatê xwe helnagirim.

* **Çi** pê ve nehatin ji kêm zaxiye.

* **Hergîz û hergîz** feramûş (bîrnakim) nakin.

* **Bi çî rêka** ez ji dest te qurtal nabim.

* **Bi hîç kilocêk** ji min venabe.

* **Bi çî rengî** desta ji min bernade.

* **Bi hîç rengê** min çare nekir.

Ji van nimûnane yên jorî, ev têne amajekirinê.

“Herçî, hergîz, çî, hergîzaw hergîz, bi çurekê, bi hîç, bi hîç reng, bi çî rengan, bi hîç rengê.”

Ev cureyê hokerê jî bi mixabinê ve astê bikaranîna wê di axivîn û nivîsînê da hindik e.

2.2.8. Hokerên Dûbarekirinê

Di zimanê Kurdî da pênase bo hokerên dûbarekirinê gelesin. Em ê li vira hinekan bînin ziman.

Sadiq Behaeddîn Amêdî “*Ew hevalkare yê ku bi ducar kirna kirinê di hevokekê da dibe.*”²²⁸ Mijara dubarekirinê di hemî zimanan de heye. Di Kurdî de jî

²²⁷ Nerîman ‘Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî (Kurmancî Seru, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr, 119.*

²²⁸ Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancî Ya Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî, Çapa Yekemîn, Çapxana Dar Şûun el-Seqafiye el-’Ame, Bexda, 421.*

bi layê zimanzanan ve hatiye pesend kirin k udi vî warî zimanzanan ve tişte wekî gotina ducarî gotin rawe kirin e.

Di Kurmanciya serî ya zimanê Kurdî da hokerên dûbarekirinê wek ji wanan pêk tên. “Dûbare, dîsan, ser ji nû, carekî din, carêkî tir, carek din, hemîşe, hemî dema...”

Herwekî wan nimûnaneyan da tên ronkirinê.

Mînak

* ***Dîsa** ji kiryarên çeteyan dînan, ku dîsan berdewam bûyî.*

* *Serdar **careke dî** jî di sîngê helnivit.*

* *Her **carekê** bê mînanê diyarî nahê.*

* *Her **carê** bê mînanê diyarîyeke bo te dehênim.*

* *Min **hind** gote te, te guh bi xwe dadan.*

Ev nimûnaneyên mînanan da wişeyên. “**Dîsa, careke dî, carekê, carê, hind**” hokerên dûbarekirinê ne.

2.2.9. Hokerên Cextkirinê (Te’kîdkirinê)

Di zimanê Kurdî da pênase bo hokerên cextkirinê (te’kîdkirin) gelek in. Em ê li vira hinekan bînin ziman.

Sadiq Behaeddîn Amêdî, “*Ew hevalkare yên ku di hevokê da ji bo takîdkirinê bikar bihêt.*”²²⁹ Di vê pênaseyê amajeya te’kîda hokarê hatiye pênase kirin. Di vê rewşê de hoker wek xalek rêzikê tiştê kut ê gotin pesend û tekîd dike.

Ev cureyê hokerê ji aliyê astê bikaranîna wê di axivîn û nivîsînê da kêmtirîn astê bikaranînê yê heye ku bi mixabinî ve zimanvanan pirr pirr bi kêmtirîn awir li vê cureyê hokerê vedaye, dibe sedema kêmtirîn hewceyîya take kesên bi vê cureyê hokerê ve hebe.

²²⁹ Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmançî*, 420.

Di Kurmanciya serî ya zimanê Kurdî da hokerên cextkirinê ji van peyvan pêk tîn. “*Can can, ciwan ciwan, helbet, bêguman, her, agir jî bibare, bi xweşî û naxweşî, bê çend û çon*” herwekî ku ev nimûnaneyan ronî dikin.

Mînak

* *Can can destê xwe bi serê min daîna, ez xapandim.*

* *Ciwan ciwan zewîyekê bo xwe dagirdike.*

* *Helbet kes çû sehma ji te nake.*

* *Helbet bê te sefer nakim.*

* *Bêguman dê te her bînim berî biçim.*

* *Ber bibarin ez dê her çim.*

* *Agir jî bibare her dê çim.*

* *Bi xweşî û naxweşî tu ji li min qurtal nabî.*

* *Bê çend û çan parê te distînim.*

Ji van nimûneyên jorî beyan dibe. “*Can can, ciwan ciwan, helbet, bêguman, her, agir jî bibare, bi xweşî û naxweşî, bi çend û çan*” mînakên hokerên cextî ne.

2.3. Taybetmendiya Hokeran

Taybetmendiya hokeran (hevalkar) yê rêzmanî, bi giştî eva nîşan kirinê yan jî ameje pê kirinê û yan jî amaje pê dike, heger hoker bi lêkerê “**karî**” re bê girêdan, evca ew dibe nîşana kirinê.

Mînak

*Ew *bi qerîn dikene.*

Dîsan lê ku hoker bi rengdêrê (hevalnav) re bibe heval, êdî ew ji xesletan re dibe xeslet. Anko ew ji nîşanekê dide nîşan.

Mînak

***Bi seyr** rohnî ye.

**Durî 'aqlîye.*

Herwiha hoker jî kerestê rejê dibe nîşan.

Mînak

**Hêk kelandî ye.*

**Goşt pijandî ye.*

Li vir, berfireh bête gotin ku, erê, hoker beşek ji beşên axaftinê yên serekî ye. Lê ji pê giradana wê bi beşek sereke nebe, ewê şêweyê xwe nestîne û bi alîkarîya amrazan tête ava kirin.²³⁰

Li gorî wateyê, hoker ji van koman pêk tên û li vê xişta (cedwela) xwarê temaşekin.

J	Cur (Sinif)	Pirsiyar	Nimûne
1	Şêwe û rêyên kirinê	Çawa? Bi çi şêweyî?	Bi lez, bi dostanî bi rêzdarî û bi guhlêkirin.
2	Pêver û rade (pile, derece)	Çend? Çend car? Çi pilê?	Hinekê, nepir, gelekî.
3	Cêgeh	Li ku? Bi ku de? Ji ku?	Dur, nêzîk, li vir, li her.
4	Dem	Kengî? Heta kengî? Ji kengî ve?	Nuka, ji mêjve, destpêkê, êvarî.
5	Eger (serdem)	Ji bo çi? Ji çi? Bi çi	Bê viyan, bi sergermî

²³⁰ Bavê Nazê (2012), *Rêzimana Kurdî (Teorî û Praktîk)*, Çapxana Hewar, Duhok, 93.

		egerê?	û bi korayî.
6	Armanc	Ji bo çi? Bi çi armancê?	Bi mebest, bi qehir û bi xwestek.

Di zimanê Kurdî de, hoker destnîşanên morfolojî nastînin. Ango ne mêjer û ne jî zayend pê ve nabin. Lê di dariştina avakirina xwe de, ligel amûrê, şeweyê tewangê distîne.

Mînak

**Dost: Bi dostanî,*

**Hesan: Bi hesanî û... hwd.*

Di zimanê Kurdî de, şeweyek ji hokeran heye ku ji rengdêrê, hokerek, bi pila berawirdiyê “çi çêtir û çi xerapitir çê dibit.” Ew jî bi dû curan şeweya xwe distîne.

1- Bi alîkarîya paşgira “**tir**” wek “**çêtir, baştir, kambaxtir**” û hwd.

2- Bi alîkarîya bêjeyên hokerî wek “**pir, gelekî, kêm**” û hwd.

Bikaranîna van hokeran, em dişên pila xirabiyê yan jî başiyê di xisleta kerestê de bizanibin.

Bizanibe dariştina hokerê, di zimanê Kurdî de, bi sê waran tete avakirin.

1- Bêguhertin, dema ji kirinê re dibe nîşan.

Mînak

**Baş dîçe.*

2- Bi alîkarîya amûrê, dema ew derbasî ser nav û rengdêrê dibin.

Mînak

**Bi baş ew dîçe.*

**Bi viyana xwe, şerkir.*

3- Bi alîkarîya paşgirê. “**tîr**”, “**mîn**” û “**în**”

Mînak

**Evro ew baştîre.*

**Ew yekemmîn hat.*

**Ew derewîne.*

2.4. Ji Aliyê Erkê Ve Hoker

Em dizanin ku hoker ew peyve ku sînorekî bo rûdana ramana karê di nav risteyê da datîne û rûyekê rûdana wî karî aşkera dikin dibe temamkerê ramana risteyê.

Mînak

****Par** çûyin bo Duhokê.*

Av gelek **zû kelî.*

Pêlawên xwe **bi lez pêkir.*

Me masî **di nav golê da girtin.*

Di vira da em dişên ku erkê hokerî di nav risteyê da berçav bikin.

Di risteya yekem da hokerê “**par**” sînorek bo demê rûdana karê risteyê daniye û bûye temamkerê raman û mebesta karî.

Di risteya düyem da hokerê “**zû**” temamkerê karê “**kelî**” ye, belê bo derxistina endazeya wê “**zû**” ê û diyarkirina ramana wê me hokerekê dî li pêşiyê bikaranîye ku “**gelek**” e di vê risteyê da jî hokerê “**gelek**” diyarkerê hokerê “**zû**” ye û herdû pêkve ramana karî temam diken.

Eger careka din jî bi hurgilî ser bisekinîn risteyên “1- 2”, dibin hoker bo amûrên peywendî rola xwe wek temamkerê karî dibin.

Belê di risteya sêyem da, peyva “bilez” ji eger pêşgirê “bi” rola xwe weke hoker dîtîye û dibe temamkerê karî.

Di risteya çarem da hokerê “di nav golê da” temamkerê karê “girt”e û hatiye bikarînan bo diyarkirina sînorekî ji bo karî û bûye temamkerê karê risteyê.

Hoker di nav risteyê da van erkên xwarê digirin.

1- Dibe temamker bo karî.

2- Dibe diyarkerê (diyarxerê) hokerekê din û herdu pêkve dibine temamker bo karî.

3- Hoker herdem dibe temamkerê karê risteyê.

4- Dibe temamkerê karî.

Mînak

A- *Karê borî.*

B- *Karê niha.*

C- *Karê daxwazî (bê).*

5-Dibe nîhad /demkî.

Mînak

Duhê îşê me bû.

6- Dibe temamkerê karê natemam:

Mînak

Îro roja **‘eynî bû.**

BEŞA SÊYEM

3. DI HERDÛ DIYALEKTÊN KURDÎ DA HOKER

Di vê beşê da aliyên berawirdkirina hokeran ji layê wekhevî û cudahiyan ve hatîne berçavkirin, ango ewên di beşên yekem û duyem hatîne behskirin. Di her du diyalektên zimanê Kurdî da li gorî wan xalan û wan nimûneyên di her du beşan da hatîne bikar anîn.

3.1. Ji Alîyê Lêkçûnê (Wekhevî) ve Hoker

Di zimanê Kurdî da komeka xalên wekhev û lêkçûyî di navbera Kurmanciya jor û Kurmanciya navîn da heye, li vir da em ê hinekan nîşan bidîn.

1. Ji aliyê form û fonetîkê ve beşêka zor a hokeran di herdû diyalektan da bi temamî wekhev diçin û hîç ciyawazî di nav wan da nîn e.

Mînak

Kurmancîya Naverast

Kurmancîya Serî

Baş

Baş

Bêguman

Bêguman

Car Car

Car car

Carêkî dî

Carêkî din

Ciwan Ciwan

Ciwan Ciwan

Cût Cût

Cot Cot

Çak

Çak

Kat kat

Dem Dem

Direng

Direng

Dûbare

Dûbare

Fire

Fire

Gelêk

Gelek

Hêdî

Hêdî

Helbet

Helbet

Hergîz

Hergîz

Jîrane

Jîrane

Le bin

Li bin

Le ser

Li ser

Le serxo

Li serxo

Le tenîşt

Li tenîşt

Mal

Mal

Par

Par

Rast

Rast

Sê Sê

Sê Sê

Taw Taw

Tav Tav

Zor

Zur

Mînak

Kurmancîya Naverast

Kurmancîya Serî

Sîrwan **par** be yekem derçû.

Rizgar **par** bi yekem derçû.

kureke **dereng** xewt.

Keça Azadî **dereng** nivist.

bulbuleke **le ser** dareke nîştewe.

Min pertûk danî **li ser** maseyê.

cantakem **le bin** mêzeke bû.

xwendkar **li bin** darê dixwînîd.

hermêy **baş** bikire.

Ev roman **baş** hatiye nivîsîn.

2. Di herdû diyalektan da gelek wişe û têgeh bo têgeha hoker tên bikaranîn. Belam her hemûyan heman wate û mebest heye.

Di diyalekta Kurmancîya naverast da ev zaravane bikartên.

Mînak

* **Awelkar, awelkirdar, hawelkar, awelfirman, zerf, qeyd, ... hwd.**

Di dîyalekta Kurmancîya serî da ev têgehan bikartên,

Mînak

***Hoker, pêçek, hoker, nêrî, filênîş, ... hwd.**

3. Hoker di herdû diyalektan da tenê pêwîste bi kar û wesfa kareke bike.

Di dîyalekta Kurmancîya naverast da.

Mînak

*Nesrîn **lejêr** dareke xewtuwe.

Di dîyalekta Kurmancîya serî da:

Mînak

*Benaz **li bin** darekê nivistiye.

4. Di herdû diyalektan da hoker hertim dikevîne pêş kar.

Di dîyalekta Kurmancîya naverast da.

Mînak

***Êsta** bo bazar deçim.

Di dîyalekta Kurmancîya serî da.

Mînak

*Ehmedî **bilez** wane nivîsî.

5. Hoker ji aliyê wateyê ve di herdû diyalektan da li ser “**neh**” cureyan dabeş dibin. Ewan cureyan jî, Hokerên demê, hokerên cih û berekê, hokerên çawaniyê, hokerên çendaniyê, hokerên dûbarekirinê, hokerên cextkirinê, hokerên ho û mebest, hokerên nerênî, hokerên rêkxistinê ne.

A- Hokerên katî di Kurmancîya naverast da.

Mînak

*** Êsta, diwênê, nîwero, ... hwd.**

A- Hokerên katî di Kurmancîya serî da.

Mînak

***Niha, duhê, nîvro, ... hwd.**

B- Bi hokerên şiwênî (cih û berekê) di Kurmancîya naverast da:

Mînak

***Le nav, le pêş, le ser, ... hwd.**

C- Hokerên şiwênî di Kurmancîya serî da

Mînak

*** Di nav, li berî, nêzî, ... hwd.**

P- Hokerên çawanîyê di Kurmancîya naverast da.

Mînak

***Civan, be pakî, be pele, ...**

Hokerên çawanîyê di Kurmancîya serî da.

Mînak

***Bi qencî, bi paqijî, bilez, ... hwd.**

T- Hokerên çawanîyê di Kurmancîya naverast da.

Mînak

***Pitir, nextê, fire, ... hwd.**

Hokerên çawanîyê di Kurmancîya serî da.

Mînak

***Zêde, pîçek, zehnî, ... hwd.**

C- Hokerên rêkxistin di Kurmancîya naverast da.

Mînak

***Nave nave, parçe parçe, cût cût, ...**

Hokerên rêkxistin di Kurmancîya serî da.

Mînak

***Gav gav, kit kit, cot cot, ... hwd.**

H- Hokerên ho û mebest di Kurmancîya naverast da.

Mînak

***Le ber ew, le daxa, le hawar, ... hwd.**

Hokerên ho û mebest di Kurmancîya serî da.

Mînak

***Ji ber ew, li daxa, ji birsa, ... hwd.**

X- Hokerên nerênî di Kurmancîya naverast da.

Mînak

***Hergîz, be hîç rengî, be hîç core, ... hwd.**

Hokerên nerênî di Kurmancîya serî da.

Mînak

***Çi tişt, herçi, çi, ... hwd.**

S- Hokerên dûbarekirinê di Kurmancîya naverast da.

Mînak

***Her carê, dîsan, ser le niwê, ... hwd.**

Hokerên dûbarekirinê di Kurmancîya serî da.

Mînak

***Hemî dema, dîsan û ser ji nûye, careke din, ... hwd.**

Ş- Hokerên cextkirinê di Kurmancîya naverast da.

Mînak

***Helbet, bêguman, bê çend û çon, ... hwd.**

Hokerên cextkirinê di Kurmancîya serî da.

Mînak

***Can can, ber bibarin, bê çendu çan, ... hwd.**

6. Hoker bi layê pêkhatinê ve jî di herdû diyalektan da bi ser sê curan dabeş dibin. Ewan curana jî: “Hokerên sade, hokerên darijav, hokerên lêkdiraw.”

Hokerên sade (xwerû) di diyalekta Kurmancîya naverast da.

Mînak

*Şêrwan **xêra** royîşt.

Hokerên sade (xwerû) di diyalekta Kurmancîya serî da.

Mînak

*Nazdar **ciwan** rûnişt.

Hokerên darjirav di diyalekta Kurmancîya naverast da.

Mînak

*Karzan **bexêravî** hat.

Hokerên darijav di diyalekta Kurmancîya serî da.

Mînak

*Kardo **li bin** darê dixwune.

Hokerên lêkdiraw di dîyalekta Kurmancîya naverast da.

Mînak

*Pareke **kurawkur** beşyan dekat.

Hokerên lêkdiraw di dîyalekta Kurmancîya serî da.

Mînak

*Ew avê **fir fir** veduxwe.

7. Beşa pitir a hokerên çawanîyê di herdû diyalektan da li binçîne da hevalnavên çawaniyê ne. Lêbelê li ristê da katê wesfî kar dikin, ev kat dibin bi hokerên çawaniyê.

Bo nimûne wişeyên “**baş, ciwan, hêmin, xirap, ... hwd.**” li binçîne da li nav ferhengan da hevalnavên çawaniyê ne. Belam dema li ristê da wesfê kar dikin, ev kat jî dibin bi hokerên çawaniyê.

Mînak

Nesrîn ciwan e.	(Ciwan) hevalnavên çawaniyê.
Nêrgiz ciwan hat.	(Ciwan) hokerên çawaniyê.
Saman hêmine .	(Hêmin) hevalnavên çawaniyê.
Rojgar hêmin de diwê.	(Hêmin) hokerên çawaniyê.
Xidir xirape .	(Xirap) hevalnavên çawaniyê.
Min xirapim le Ehmed da.	(Xirap) hokerên çawaniyê.
Ciwane zîrek hat.	(Zîrek) havelnavê çawanîyê.
Karwanî bi zîrekî karê xwe kir	(Zîrek) hokerên çawanîyê.
Kitêba baş bikin.	(Baş) havelnavê çawanîyê.
Pertukê baş bixwune.	(Baş) hokerên çawanîyê.

Zarok <u>birsî</u> ye.	(Birsî) helnavî ho û mebest.
Zarok <u>li birsiya</u> mir.	(Li birsiya) hevallkarî ho û mebest.
Ev xaniye <u>kevîne</u> .	(Kevin) havelnavê çawanîyê.
Xaniyê <u>kevin</u> suta.	(Kevin) havelnavê çawanîyê.
Benaz <u>zîreke</u> .	(Zîrek) havelnavê çawanîyê.
Awaz qutabiyeka <u>zîrek</u> bû.	(Zîrek) hokerên çawanîyê.

8. Hokerên çawanîyê di Kurmancîya naverast da bersiva pirsiyara “çon?, çilon? û kû?”

Mînak

Kiçî **ciwan** hat.

Belam di Kurmancîya serî da bersiva pirsiyara “çewa? û çawa?” didin.

Mînak

*Keça **ciwan** hat.

9. Hokerên çendaniye di Kurmancîya naverast bersiva pirsiyarên “çend?, kême? yan gelek? û ta çi radeyekî?” didin.

Mînak

*Emro baran **kem** barî.

Belam di Kurmancîya serî bersiva pirsiyarî “çiqas?”, “çiqas?” didin.

Mînak

*Evro baran **kem** barî.

10. Hokerên rêxistinê di Kurmancîya naverast bersiva pirsiyarî “çon?”, “bi çi curêk?”.

Mînak

*Mindaleke aweke **qum qum** xwarduwe.

Belam di Kurmancîya serî bersiva pirsiyarî “çi cure?” didin.

Mînak

*Ew avê **fir fir** vedixe.

11. Hokerên demê bersiva pirsiyara “key?”, “le keye we?”, “ta key?”, “çi katê” didin.

Mînak

Newzad **êsta** gerayewe.

Belam di Kurmancîya jorîn da bersiva pirsiyara “kê?” û “çi çaxê?” didin.

Mînak

***Havînê** koçer diçin zozanan.

12. Hokerên şiwênî (cih û berekê) di Kurmancîya naverast bersiva pirsiyarîa “le kiwê?”, “bo kûyê?” û “le kiwêwe?” didin.

Mînak

*Kewekan **leser** çiyakan dexwênin.

Belam di Kurmancîya serî da bersiva pirsiyarên “li kû?”, “kû da?” û “ji kû?” didin.

Mînak

*Kawe **li bin** darê dixune.

13. Hokerên ho û mebest di Kurmancîya naverast bersiva pirsiyara “bo çî?”, “leber çî” û “bo çî mebestek?” didin.

Mînak

*Pîremêrdeke **ledaxa** mird.

Belam di Kurmancîya serî da bersiva pirsiyara “ji ber çi?” didin.

Mînak

*Zarok **ji birsîya** mir.

14. Di herdû diyalektan da hokerên “çawanîyê, katî, şiwênî” rêjeya bikarhêneyan yekcar gelesin, li heman katî da jî di herdû diyalektan da ev sê curene li layên zimanzanan ve gelek bi firawanî behs lê hatine kirinê.

A- Hokerên çawanîyê di dîyalekta Kurmancîya naverast da.

Mînak

*Keweke **ciwan** dexwênê.

B-Hokerên çawanîyê di dîyalekta Kurmancîya serî da.

Mînak

*Dîlanê hozan **ciwan** xwand.

B- Hokerê katî di dîyalekta Kurmancîya naverast da.

Mînak

***Dawîyê** deçim bo ahengeke.

P-Hokerê katî di dîyalekta Kurmancîya serî da.

Mînak

***Îsev** berf dibarî.

C- Hokerên şiwênî di dîyalekta Kurmancîya naverast da.

Mînak

*Şêrzad **le serewe** danîştuwe.

D- Hokerên şiwênî di dîyalekta Kurmancîya serî da.

Mînak

*Ev **ji dûr** hatibûn.

15. Di herdû diyalektan da pênaseya cureyên hokeran heta radeyekî gelek wek hev in.

16. Di herdû diyalektan da şeweya formê wişeyên hoker ta radeyekî gelek wek hevin, ev wateya li şêwe da wek yek dihêne nivîsandin û dihêne ser ziman. Eger cudahî jî hebe, zêdetir peyweste bi alîyê fonetîkî.

17. Hoker di herdû diyalektan da jî di risteyan da gelekî erkân (peywiran) digirin li ser xwe.

Mînak

Hoker dibe tewawkerê karî rabirdû (Ehmed **xêra** hat).

Hoker dibe tewawkerê karî ranebirdû (Alan **xêra** dêt).

Hoker dibe tewawkerê karî fermanndan (**Xêra** naneket boxo).

Hoker dibe tewawkerê hokerekî tir (Befrîn **zor xêra** hat).

Hoker dibe tewawkerê karî natewaw (Emro **dereng** bû).

Hoker dibe tewawkerê karî natewaw (Karwan zor **derenge**).

Weke derdikeve xalên wekhev di navbera Kurmanciya navîn û Kurmanciya jor gelek in. Eve jî belgeye li ser hindê ev du zaraveye ser bi yek zimanê ne ew jî zimanê Kurdî ye. Çimkî di hemû zimanan da ev rewş tê dîtin, ku bi wê sedemê divê zaraveyên nava wî zimanî di gelek haletan da wekhev bin. Xalên wekhev di navbera wan da gelek bin, bi taybetî alîyê rêzimanê bi herdu astên peyvsazî û hevoksazîyê ve.

3.2. Ji Alîyê Ciyawazî (Cudahîyê) ve Hoker

Di zimanê Kurdî da komeka xalên cuda û dijber di navbera Kurmanciya jor û Kurmanciya navîn da heye. Li vir da hinek ji wan em ê nîşan bidîn.

1. Di layê form û fonetîkê ve beşek ji hokerên di herdû diyalektan da cuda nînin. Belam yek reg û rêbazin.

Mînak

Kurmancîya Naverast

Kurmancîya Serî

Emro

Evro

Le ser

Li ser

Le nav

Li nav

Deste deste

Deste deste

Kem

Kêm

Hendek

Hinek

Emsal

Îsal

Şewê

Şevê

Zistanê

Zivistanê

Le xwar

Li xwarê

Le Mal

Li Mal

Xêra

Bilez

Pêkewe

Pêkve

Birêk

Pîçek

Letirsa

Ji tîrsa

Çunke

Çimkî

Hemû katêk

Hemî dema

Bê çend û çon

Bê çend û çawa

Ledaxa

Li daxa

2. Beşek ji hokerên di herdû diyalektan da bi layê form û fonetîkê ve cudane. Li heman demî da jî bi layê reg û reçekê (kok û bingehê) ve cudan e.

Mînak

Kurmancîya Naverast

Xêra

Êsta

Gelêk

Zor

Kurmancîya Serî

Bilez

Niha, Nuke

Fire

Zêde

Kurmancîya Naverast

*Fetah êsta hat.

*Nêgiz zor ciwan danîşt.

*Kosret xêra royişt.

*Rizgar le Mîhemed gelêk baştir e.

Kurmancîya Serî

*Duhî baran fire barî.

*Wan wane bilez nivîsî.

*Te zêde zêde xwe êşand.

1. Di hinek hokeran da, hinek caran guhertina paş û pêşkirinê pît (herf) dike.

Ango peyvê berevajî dike.

Mînak

Kurmancîya Naverast

Kin

Zîx

Befr

Kurmancîya Jorîn

Nik

Xîz

Berf

Tezre

Terze

4. Di Kurmancîya naverast da bi firawanî behsa cureyên hokeran hatiye kirin, ku çî di Kurmancîya serî hinek cur bi firawanî û bi dûrudirêjî lêkolîn li ser hatiye kirinê. Belam hinek cur gelek bi kemî li ser xebitîne, yanî kêma vegeryane serî. Ewan jî wisa ne: “Hokerên ho û mebest, hokerên dûbare, hokerên cextkirinê” di Kurmancîya serî da gelek bi kêma li layên şarezayan û zimanzanan ve behs li van hatiye kirine.

5. Di Kurmancîya naverast da li cem hemû ew wişe û zarawayên bo hoker bikarhatine, zêdetir zaraveya “hoker” diguncê û zêdetir bikartê, ku wateya “heval” yan “dost” ê kar derdixe pêş, ku çî di Kurmancîya serî da digel vê hemû zaraveyan tî bikaranîn, zêdetir zaraveya “hoker” cihê xwe girtîye û zêdetir bikar tê.

Li vir da weke derdikeve xalên ji hev cuda di navbera van du zaraveyan hindik e. Ewe jî belgeya nîzîkatiya van du zaraveyan digel hev dide zanîn, çimkî du zaraveyên ser bi zimanê Kurdî ne, her ji ber hindê xalên ji hev cuda di navbera wan da hindik in.

Di zimanê Kurdî dîyalektên wek Hewramî, Dimilkî, Lorî, Kurmancî, Soranî û hwd. gelek dîyalektên cihê hene. Di vê lêkolînê me dît ku di mijara hokerê de di navbera Kurdiya naverast û jorîn de ferqeke berz tune. Wekî dîn gelek meseleyan de dişibe hev. Ji ber vê jî em dikarin bibêjin ev dîyalektên ku me jorî pênase kirî hemî wekî ewladê Kurdî ne ku di dîrokê de xwediyê asteke bilind in.

Em bawer dikin ku lêkolînên li ser zarawayên din yê Kurdî, dê vê encamê bide ku evna hemî li ser yek bingehe geş bûne.

ENCAM

Ji dawîya lekolîna xwe em ghiştin bi van enjaman jêrî, ku li vir de hindik ji wan re emê nîşan didin.

Li gor wê çendê jî ku her du diyalektên zimanê Kurdî jî wek hevdû û nêzîkî hevdû ne. Di dawîya vê xebatê da hinek xalên giring ji hemberkirina van her dû beşan bi dest ketin û bi vî awayî hatin honandin.

Hoker beşeke ji beşên axavtinê, ku hoker wesfa kar dike û dibe tewawkerê kar. Di herdû diyalektan da gelek têgeh û pênase bo hokeran tên bikaranîn. Ji aliyê wateyê ve hoker di herdû diyalektan da neh curene wek “hokerên demê, hokerên cih û berekê, hokerên çawanîyê, hokerên çendanîye, hokerên dûbarekirinê, hokerên cextkirinê, hokerên ho û mebest, hokerên nerênî, hokerên rêkxistin.”

Hoker bi layê pêkhatinê ve di herdû diyalektan da sê curene wek “hokerên sade, hokerên darijav, hokerên lêkdirav.”

Di zimanê Kurdî bi giştî herdû diyalektan da bi taybetî hertim û her dem hoker li pêş kar tê.

Di herdû diyalektan da jî beşa pitir a hokerên çawanîyê li binyatê da hevalnav in. Lê di nav ristê da dibin hoker, ev jî wê demê da, ku wesfa kar di ristê da dikin.

Di alîyê form û fonetîkê ve gelek hoker di herdû diyalektên zimanê Kurdî da dişibine hev.

Bi alîyê form û fonetîkê ve beşêka kêr ji hokeran di herdû diyalektan da cudane. Lê ji xwe yek reg û yek rêbazin.

Bi alîyê form û fonetîk û rê û rêbazê ve beşek ji hokeran di herdû diyalektan da cudane.

Hinek peyiv û destewaje (term) hene, bo nimûne wek “zû, yekser, destbecê, dereng...” çûn pence bo çawanîya rûdanê radekêşin, bi heman çeşn dikarin bi cihanîna katî karekê nîşan dibin. Wate dibê “hokerên çawaniyê” û “hokerên demê” bin, ku ew jî wateya evê derdixe pêş, ku ev wişane li yek kat da dibin bi hokerên demê û hokerên çawaniyê.

Herwiha hinek hokerên din hene wek “bexwerayî, bidem xewewe, beenqest, letirsa, lebirsa ...” dibê ho û mebest nîşan bidin. Herwiha menaya çawanîyê têdaye û rûdana çawanîyê jî radigehînin. Ev jî wateya evê digehînin, ku ev wişane êdî li herdû cureyên hokerên ho û mebest û hokerên çawaniyê hejmar bibe, wate xelet nabe eger her yekê ji wan curane binivîsin.

Hokerên “dûr, li dûr, li dûr ve... nêzîk, li nêzîk, li nêzîk ve,... hwd” ligel evê jî da ku wateya endaze û pêwaneyan têdaye. Belam bi şeweyekî serekî wesfa kar dikin, ji bo rast bê, ber li her şit bi hokerên çawaniyê dabinrên. Wira ev du erke, herwiha pence bo şiwên jî radikêşin, ji boye xelet nîne eger li tek hokerên cih û berekê da bahs bikin, ev wateya wan wişane dibe bi hokerên rêxistin û hokerên çawaniyê û hokerên cih û berekê hejmar bibin, ku ev jî ta radeyekê sînorê nava hokeran kêr dikin û wana lêdikin ku têkelî bi yeke din bikin.

Hoker bi layê cihê şiwênî di astên ziman da, eva jî bin cihe da diçe xaneyê rêziman û di nav rêziman da jî diçe xaneyê wişesazîyê. Belam li heman katî da jî li ristêsazî da jî rol û pêge heye, çimkî erk di nav ristê da heye.

ÇAVKANÎ

1. Pirtûkên Bi Zimanê Kurdî

'Ebdulwahîd Muşîr Dizeyî (2013), *Ristesazî Ronankarî û Guwêzanewe*, çapa yekemîn, Hewlêr.

'Ebdulwahîd Muşîr Dizeyî (2012), *Wûşesazî*, çapxaneyê hêvî, Hewlêr.

'Ebdulwahîd Muşîr Dizeyî (2014), *Rêzimanî Kurdî Wûşesazî û Ristesazî*, çapxaneyê hêvî, Hewlêr.

A.k. Rudnif (1958), *Sîntakis Ristey Sade*, Mosko.

Aso Germiyani (2001), *Rêzimanî Kurdî Bo Qonaxekanî Seretayî û Navendî le Derewey Welat*, Swed.

Bahoz Baran (2018), *Rêzimana Kurmancî*, çapa duyemîn, çapxaneyê wardozî, Diyarbekir, Turkiya.

Bavê Nazê (2012), *Rêzimana Kurdî (Teorî û Praktîk)*, çapxana Hawar, Duhok.

Cegerxwîn (1960), *Ewaw Distura Zimanî Kurdî*, çapxaneyê Selaheddîn, Bexdad.

Cesîmê Celîlî (1960), *Rojî Min (şî'r)*, Yerîvan.

Deham 'Ebdulfetah (2012), *Karlêker Di Zimanê Kurdî De (Kurmancîya jorîn)*, çapa yekemîn, çapxaneyê Hecî Haşim, Hewlêr.

'Ebdulselam Necmedîn 'Ebdulla û Selwa Ferîq Salih (2010), *Rêzimana Kurdî bo zarokan*, çapa yekemîn, çapxana Hacî Haşim, Hewlêr.

Ehmed Kake Mem (2003), *Gulbihare, Kitêbî (3)*, berga duyemîn, çapa duyemîn, çapxaneyê mukîryanî, Hewlêr.

Ehmed Nalbend (1997), *Baxî Kurda*, çapa yekemîn, çapxana Duhok.

Ewrehman Hacî Marif (1979), *Rêzimanî Kurdî, Berga Yekem (wûşesazî), beşî yekem (nav)*, çapxaneya korri zanyarî kurd, Bexda.

Ewrehman Hacî marif (1998), *Rêzimanî Kurdî, berga yekem (wûşesazî), beşa çarem (jimare û awelkirdar)*, dezgay rewşenbîrî û belawkirdinewey Kurdî, Bexda.

Ewrehman Hacî Marif (2004), *Ferhengî Zarawey Zimannasî, Kurdî-'erebî-îngilîzî, ligel dû paşgo*, Silêmanî.

Ewrehman Hacî Marif (2014), *Rêzimanî Kurdî, berga yekem (wûşesazî), beşa duyemîn (cînav)*, çapxaneya rojhilat, Hewlêr.

Faîq Bêkes (2011), *Dîwana Faîq Nêkes*, çapa duyemîn, çapxaneya şivan, Silêmanî.

Gîwî Mukîryanî (1972), *Elfûbêy Kurdî û Wênedar bi Pîtî Lafînî*, çapxaneya kurdistan, Hewlêr.

Goran (1980), *Dîwana Goran*, çapxana korri zanyarî Iraq, Bexda.

Îbrahîm Remezani Zaxoyî (2008), *Rêzimana Kurdî, qewî'dî el-luxe el-Kurdîye*, çapa yekemîn, çapxana xanî, Duhok.

K.K. Kurdoyêv (1984), *Rêzimanî Kurdî, be Kerestey Diyalêktî Murmancî û Soranî*, (wer. Kurdistan Mukîryanî), çapxana emîndarêtî giştî rewşenbîrî û lawan, Hewlêr.

.....(2018), *Rêzimanî Axawtinî Kurdî*, Bergî yekem, Belawkirnewey Kurdista, Îran, Sine.

Kemal Mîrawdêlî (2007), *Ferhengî Rêzimanî Kurdî*, çapa yekemîn, le belawkirawekanî melbendî kordolojî, Silêmanî.

Kerîm Eyyubî û Semîr Nova (1968), *Diyalêktî Kurdî Mukrî*, çapxanê nîne, Lênîngrad.

Kurdistan Mukîryanî (1986), *Sîntakis Ristey Sade di Zimanê Kurdî da*, çapxaneya dar el-hurrîye lil-îttîba'e, Bexda.

Lîjney Ziman û Zanistekan (1976), *Rêzimanî Axawtinî Kurdî*, çapxaneya korri zanyarî kurd, Bexda.

Lîjney Ziman û Zanistekan, (2018), *Rêzimanî Axawtinî Kurdî*, çapa duyemîn, Iran, Sine.

Lîjneyek ji Wezareta Perwerde (1982), *Rêzimanî Xwêndinga Navendî û amadeyyekan, qonaxekanî, (2, 3, 4, 5, 6), perwerdehiye*, çapxaneya jimare 2, Hewlêr.

Lîjneyek ji Wezareta Perwerde (2007), *Ziman û Edebî Kurdî, Polî Duwemî Navendî*, çapxaneya Aram, Bexda.

Lîjneyek ji Wezareta Perwerde (2011), *Ziman û Edibe Kurdî, Pola Dehê Amadeyî*, çapa yekemîn, çapxana El- musteqbel, Lubnan.

Lîjneyek ji Wezareta Perwerde (2012), *Ziman û Edebî Kurdî polî Heştêmî inerretî*, çapxaneya dar el-lubnan, Hewlêr.

Lîjneyek ji Wezareta Perwerde (2013), *Ziman û Edibe Kurdî, pola Heştê Binerretî*, çapa pêncê, çapxana el- musteqbel, Lubnan.

Lîjneyek ji Wezareta Perwerde (2015), *Ziman û Edibe Kurdî, pola Yazdê amadeyî*, çapa sêyemîn, çapxana wezaretî perwerde, Hewlêr.

Lîjneyek ji Wezareta Perwerde (2016), *Ziman û Edebî Kurdî, polî Yazdehemî Amadeyî*, berrêweberayetî giştî program û çapemenînekan, Hewlêr.

Lîjneyek le Wezareta Lerwerde (2017), *Ziman û Edebe Kurdî, pola Heştê Binerretî*, çapa deym, çapxana wezaretî perwerde, Hewlêr.

Mehmed Tayfun (malmîsanij) (2018), *Rêzimana Kurmancîkî (zazakyê) Berawirdkirdin ligel Kurmanciyê*, çapa yekemîn, senterê zaxo bo vekolînîn Kurdî, Duhok.

Melayê Cizîrî (1982), *Dîwana Melayê Cizîrî*, çapa yekemîn, çapxaneyaya siruş, Tehran.

Mihemed Emîn Hewramî (1973), *Seretaryêk le Fîlolojîya Zimanî Kurdî*, çapxaneyaya Me'arîf, Bexda.

Mehemed Merdoxî, (2018) *Rêzaimanî Axawtinî Kurdî*, Bergî Yekem, elwkirdnewey, Kurdistan, Îran, Sîne.

Mubarek Mubarek (1995), *Mu'cem El-mustelehat El-lisniye, Fransî, îngilîzî, 'erebî*, çapa yekem, dar el-fîkr el-lubnanî lil-tiba'e vel-neşir, beyrut, Lubnan.

Nalî (1963), *Dîwana Nalî*, çapa duyemîn, çapxaneyaya sîhir, Tehran.

Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw (2007), *Çend Babeteka Zimanewanî*, çapxaneyaya şehîd azad hewramî, Kirkuk.

Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw (2010), *Rêzimanî Kurdî*, çapxaneyaya minare, Hewlêr.

Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw (2015), *Rêzimanî Kurdî (Kurmancîya serî)*, çapxaneyaya rojhilat, Hewlêr.

Nesrîn Fexrî û Kurdistan Mukîryanî (1982), *Rêzimanî Kurdî polî yekemî beşî zimanî Kurdî*, zankoya selaheddîn, koleja edibe, çapxaneyaya selaheddîn, Hewlêr.

Nezîr Ocek (2019), *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, çapa duwem, çapxanaya sîtav, Enqere.

Nî'met 'Elî Saye (2004), *Rêzimanî Kurdî Zaraveyî Kelhorî*, çapxaneyaya şivan, Silêmanî.

Nureddîn Birîfkanî (2002), *Dîwana şêx Nureddînê Birîfkanî*, çapa yekemîn, çapxanaya aras, Hewlêr.

Nurî 'Elî Emîn (1956), *Qewa'dî Zimanî Kurdî le (êrf û nihu) da*, berga yekem, çapxaneyê 'arf, Bexda.

Nurî 'Elî Emîn (1960), *Rêzimanî Kurdî*, çapxaneyê kameran, Silêmanî.

Nurî 'Elî Emîn (2012), *Rêzimanî Kurdî*, çapa duyemîn, çapxaneyê rojhilat, Hewlêr.

Lijneyek Ji Ziman û Zanîstekan, Korî Zanyarî Kurd, (2018) *Rêzimanî Axavtinî Kurdî*, Çapa Duyemîn, Îran Sine.

Lijneyek Le Wezareti Perwerde (1998), *Rêziman û Edibe Kurdî, Peymangeha Melbendîya Mamostayam*, Duhok.

R. H. Rubniz (1997), *Mucez Tarîx 'Îmîl luxe fil- garb sîlsîle'tul Kutub Seqafîye El-şehrîye*, yêzdur el-meclis el-vatanî'il- seqafe vel-funun vel-edeb, Al-Kuwet.

Refîq Şiwan (2011), *Wûşesazî Zimanî Kurdî Lêkolînewa Yekî Praktikîye*, çapa yekemîn, çapxaneyê rojhilat, Hewlêr.

Reşîdê Kurd (2008), *Rêzimana Zimanê Kurmancî*, dezgay spirêz, çapxaneyê xanî, Duhok.

Sadiq Behaeddîn Amêdî (1987), *Rêzimana Kurdî Kurmancî ya jorî û jêrî ya hevberkirî*, çapa yekemîn, çapxana dar şown alpçafye al'ame, Bexda.

Sadiq Behaeddîn Amêdî (2012), *Rêzimana Kurdî Kurmancî Jorî û Jêrî ye Hevberkirî*, çapa duyemîn, weşanxana dîwan, Stenbol.

Se'îd Sidqî Kaban (1928), *Muhtasar Sarf û Nahv el- Kurdî*, beşa yekem, çapa yekem, el- necah, Bexda,

Selam Navxweş (2014), *Ferhengî Zimanewanî Navxweş*, çapa yekemîn, çapxaneyê hêvî, Hewlêr.

Tefîq Wehbî (1929), *Destûrî Zimanî Kurdî*, çapa yekemîn, çapxaneyê neçah, Bexda.

Wirya 'Umer Emîn (2004), *Asoyekî Tirî Zimanewanî*, çapxaneyê dezgay aras, Hewlêr.

Xazî 'Elî Xurşîd (2013), *Rêzimana Fermî*, çapa yekemîn, çapxaneyê serdem, Silêmanî.

Yusif Şerîf Se'îd (2013), *Wûşesazî Zimanî Kurdî*, çapxaneyê Hacî Haşim, Hewlêr.

Z.Ayusupova (1998), *Diyalêktî Goranî Kurdî*, San Peterburg.

2. Nameyên Master û Doktorayê

Awaz Heme Sidîq (1996), *Rêzbûnî Kereste Di Zimanê Kurdî Da*, Nameya Mastirê, Koleja Edibe, Zankoya Selaheddîn, Hewlêr.

Azad Ehmed Husên (2001), *Erkî Edvêrbil Le Firawankirdinî Frêzî Karî Da, Lêkolînewa yekî Berawirdkarîye Be Keresteyê Diyalêktî Xwarû û Hewramî*, Nameya Mastirê, Koleja Ziman, Zankoya Silêmanî, Silêmanî.

Dîmen 'Ebdulla 'Umer (2009), *Hevalkarê Çewayî Di Dyalêkta Serî ya Zimanê Kurdî Da*, Nameya Mastirê, Koleja Edibe, Zankoya Duhok.

Hîdayet 'Ebdulla Mihemed (2002), *Rêkewtinî Wataya Nav û Hevalnav Di Zimanê Kurdî Da*, Nameyê Diktora, Koleja Ziman, Zankoya Silêmanî.

Îbrahîm Bîngol (2017), *Rêzimana Kurmancikî (Zazekî) Ya Devoka Gimgimê*, Teza Doktorayê, Zankoya Zaxoyê, Duhok.

Mehmud Fethulla Ehmed (1988), *Kar Tewawkirdin Le Kurdî Da*, Nameya Mastirê, Koleja Edibe Zankoya Selaheddîn, Hewlêr.

Mihemed Mehuy (2010), *Wûşesazî û Beyekdaçûnî Pêkhatekan*, Nameya Mastirê, Koleja Ziman, Zankoya Silêmanî.

Şîlêr Resul Berzincî (1989), *Awelguzare Le Zimanê Kurd Da*, Nameya Mastirê, Koleja Edibe, Zankoya Selaheddîn, Hewlêr.

Kovar û Rojname

Asher, R, E And Simp Son, J.M.Y. (1994), *The Encyclopedias Of Language And Linguistics*. Vol. Oxford: New York Pergman Press.

D. Criystal (2000), *The Cambridge Encyclopedia Of The English Language*, Italia.

D. N. Mackenzie, (1966), *The Dialect Of Awroman (Hawraman – 1 Luhon)*.

E. Miccarus. (1958). *A Kurdish Grammar*. Washington: Washington Polarography Company.

Ewrehman Hacî Marif (1990), *Awelkirdar Ji Aliyê Wateyae Va, Kovara Rewşenbîrî Nûwê*, Jimare (125), Dezgay Rewşenbîrî û Belawkirdinewey Kurdî, Bexda.

'Ebdulcebar Mistefa Me'rûf û Karwan 'Umer Qadir (2011), *Karîgerîy Ferheng Le Binyatî Duruste Sîntaksîyekan Da*, Kovara Ustaz, Jimare 186, Silêmanî.

G. Fincih. (2000), *Linguistic Terms And Concepts*, Macmilan Press.

Hamza Othman Moho Goran (1997), *A Contrastive Study Of Manner Adverbials In English And Standard Kurdish Master Of Arts*, Colege Of Arts, University Of Salahaddine, Hewlêr.

Mihemed Emîn Husên (2010), *Kovara Kurdolojî*, Jimare (3), Kanî Askan, Silêmanî.

Ne'îman 'Ebdulla Xoşnaw (2004), *Ramanêkî Nuwê Bo Hevalkar*, Kovara Karwan, Jimare (184), Hewlêr.

Parot Martin (2001), *Grammar For English Language Teachers*,
Cambridge University Press.

R. Huddleston, (1984), *Introduction To The Grammar Of English*.
Cambridge University Press.

R. I. Trask (1993), *A Dictionary Of Grammatical Terms In Linguistics*,
Firsit Published, London.



JÎYANA ME

Di sala 1973'yan de li taxa topxaneya qelaya Hewlêrê ji dayîk bûye. Perwerdeya xwe yî seretayî li navenda heman bajarê birîye serî û amadeyî li Hewlêrê tamam kirîye. Herwiha di sala 1989 yan buye xwendavanê beşa zimanê Kurdî li peymangeya pêgihandina mamosteyan xwendina xwe bi serkevtîî tamamkirîye, piştê di xwendinê berdiwam buye û di sala 2014yê dibe xwendevanê beşa Ziman û Edeba Kurdî di Zanîngeha Selaheddin. Piştî 4 salan şhadetnama yê xwe distîne. Pişt ra ji wek mamostê Ziman û Edeba Kurdî di Wezerata Perwerdehîyê da dixebite.

Di asteka bilind da zimanê Turkî û Erebi heta radekî jî Îngilîzî dizane.



VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü



18/02/2021

Tez Başlığı / Konusu

**BERAWİRDKİRİNA RENG DÖRAN Dİ ALİYÊ WATEYÊ DA-MÎNAK KURMANCÎYA NAVÎN Û
KURMANCÎYA JORÎN-**

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 104 sayfalık kısmına ilişkin, 18/02/2021 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından %1 intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezin benzerlik oranı % 3 (Yüzde üç) dur.

Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

18/02/2021

Abdullah Asaad ISMAEL
Adı, Soyadı, İmza

Adı Soyadı : Abdullah Asaad ISMAEL
Öğrenci No : 18950001007
Anabilim Dalı : Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
Programı : Örgün Eğitim
Statüsü : Y. Lisans X Doktora

DANIŞMAN

DOÇ.DR. NESİM SÖNMEZ

**ENSTİTÜ ONAYINA
UYGUNDUR**

DOÇ.DR.ABDULHADİ TİMURTAŞ